


## “Ji bo Kurdistaneke Serbixwe”

**LÎ** bajarê Kolnê 28ê Tebaxê bi armanca piştevaniya referandûma serxwebûna Kurdistanê festîval dê were lidarxistin. Kalo dibêje “Em bi partiyên Amedê re di têkiliyê de ne, eger rewş guncaw be dibe ku li Amedê jî festîvalek bê lidarxistin.”

RÛPEL 04



## Tama du hezar salî: Hingivê Kurdistanê

**FÎZÎKNASÊ** navdar Albert Einstein ji bo mozê dibêje: “Eger moz ji ser rûyê erdê winda bibin însan tenê 4 salan dikarin bijîn. Eger moz nebin ber nayê girtin, ajal, nebat û mirov nabin.” Moz ji debara mirovan re weke amûreke tîcarî ye jî.

RÛPEL 09




## Ez, Vejîn û Beşê Mi

**VEJÎN**, çekuyêka kurmanckî ya û kirmanckî de muqabilê na çekûye “newe ra ciwîyayîş, newe ra zîyayîş” o. Şima zî zanê ke tarîx de, bitaybetî zî seserra peyêne de, dişmenanê kurdan zaf reyan waşt ke kurdî biqedîyê û kurdkî zî bimiro.

RÛPEL 11

bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 23
12 - 18 HEZÎRAN 2017
www.basnews.com



JI KURDISTANÊ BIRYAREKE DÎROKÎ: S2

# DEMJIMÊR BO SERXWEBÛNÊ DIJMÊRE

**> HÊVÎ Û XEYALA KURDAN PÊK TÊ**

Li Herêma Kurdistanê heftiya derbasbûyî geşedaneke gelekî girîng û dîrokî rû da. Aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê bi serpereştiya Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî civiyan û biryar hat girtin ku referandûm 25ê Îlona îsal pêk were.

**> DIVÊ HERKES PIŞTGIRIYÊ BIDE**

Nûner û siyasetmedarên partiyên Bakûrê Kurdistanê biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê, ‘dîrokî’ pênase dikin û diyar dikin ku divê hemû Kurd li gel Herêma Kurdistanê bin û piştgirî û piştevaniya vê biryarê bikin.



**EKREM ÖNEN** >03

Geoekonomîka wê tesîra xwe li Geopolîtîka bike?



**HOŞENG OSÊ** >05

Öcalan û pesndayîna xwîn rijandinê



**MURAD CÎWAN** >12

Qurincok li Qeterê ketin, Tirkiye veciniqî

S3 ABDURRAHMAN MUSTAFA



## Encamdana referandûmê li Kerkûkê girîng e

Parêzgerê Kerkûkê Abdurrahman Mustafa, di derbarê encamdana referandûmê ku dê li Kerkûk û deverên derveyî îdareya Kurdistanê jî bê lidarxistin de, got ku xelkê Kerkûkê wê referandûmê bi coş û kelecaneke mezin pêşwazî bike.

S5 AZAD CUNDIYANÎ



## Referandûm ber bi destkeftên mezin ve diçe

Xaleke girîng a civînê jî beşdarbûna aliyên siyasî û netewî, nûnerên îslamî û kirîstiyanan e. Tiştê ji bo min herî girîng, xebat û îradeya Kurdistanê ya li hember vê rewşa ne xweş e. Gava yekem ber bi serxwebûnê ye.

S8 REWŞA MÛSILÊ



## Kurdistan û YE dahatûya Mûsilê gotûbêj dikin

Wezîrê Kar û Barên Hundir ê Kurdistanê Kerîm Şingalî û heyeteke ligel wî 6ê Hezîranê li ser vexwandinê, beşdarî konferansa ‘Piştî DAIŞê dahatûya Mûsilê’ ya Parlementoya Ewropa bûn.

Ji Kurdistanê biryareke dîrokî:

# Demjimêr bo serxwebûnê dijmêre





CESİM İLHAN

Referandûma serxwebûna Kurdistanê ku ev heyameke dirêj e di rojeva Kurdistanê de ye, hat ragihandin ku wê 25 Îlona îsal bê encamdan. Nûner û siyasetmedarên partiyên Bakûrê Kurdistanê jî biryara pêkanîna referandûmê ku di civîna bi serpereştiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî hatibû girtin, 'dîrokî' pênase kirin û diyar kirin ku divê hemû Kurd li gel Herêma Kurdistanê bin û piştgirî û piştevaniya vê biryarê bikin.

**NÛNER** û siyasetmedarên partiyên Bakûrê Kurdistanê biryara referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê re nirxandin. Siyasetmedarên Kurd ragihandin ku biryara referandûmê dîrokî ye û bang li miletê Kurd kirin ku piştgiriyê bidin referandûma serxwebûna Kurdistanê.

Serokê Platforma Demokratên Kurdistanê Sertaç Bucak dibêje biryara referandûma serxwebûnê wê li kartegeriyê li ser parçeyên din jî bike û divê hemû Kurd piştgiriyê bidinê. Berdevkê Tevgera Azadî û Mirovan Ahmet Kaya jî dibêje ev biryar ji bo hemû Kurdan qonaxeke girîng dide destpêkirin. Serokê PAKê Mustafa Özçelik ragidihîne ku piştevaniya bo referandûma serxwebûnê, peywîreke dîrokî û netewî ye bo hemû Kurd û Kurdistaniyan. Ji Tevgera Azadiyê Parêzer Sıdkı Zilan, diyar dike ku bi referandûmê destê rêveberiya Herêma Kurdistanê wê bihêz bibe. Divê her Kurdek ji Herêma Kurdistanê re bibe alîkar û piştgiriyê bidê. Serokê PAKURDê İbrahim Xelil Baran dibêje her çiqas tenê welatiyên li Kurdistanê beşdarî referandûmê bibin jî ya ku dengdan li ser tê kirin qedera hemû miletê Kurd e. Parlementerê HDP yê Amedê İmam Taşçıer ku piştî biryara referandûmê peyameke pîrozbahiyê belav kiribû radigihîne ku ev referandûm a hemû Kurdan e û divê piştgirî bê dayîn. Cîgirê PDK Bakur, Hisyar Özalp jî eşkere dike ku naskirina mafê diyarkirina çarenivîsa Kurdan, tê wateya qebûlkirina vî mafî li parçeyên din jî."

Daxuyaniyên nûner û siyasetmedarên partiyên Bakurê Kurdistanê yên li ser biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê wiha ne:

**"Bila dewleteke Kurdî jî hebe"**

Serokê OSPê Sinan Çiftyürek: Biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê ji bo hemû gelên li Kurdistanê biryareke dîrokî ye. Ev biryar dê bandoreke mezin li ser zêdetirî 20 milyon Kurdên me yên li metropolên Tirkiye-Îran-Iraq-Suriye û dîasporayê bike. Beşdarkirina Kerkûk jî di nav referandûmê de biryareke girîng e û kelecaneke mezin bi xwe re aniye. Divê siyaseta Kurdî bi hemû hêza xwe û bêyî teredût û dudilî piştevaniya referandûma serxwebûna Kurdistanê bike. OSP bi vî awayî li referandûmê dinêre. Em ji bo piştgiriyê bang li herkesî dikin. Ev jî girîng e ku ev biryar wê îddîaya, 'Kurd nikarin dewletekê ava bikin' ji binî ve têk bibe, wê Kurdên li parçeyên din jî ber bi dewleteke serbixwe ve dehf bide û riya Kurdistaneke mezin û hevgirtî vebe. Divê li ser rûyê erdê deweteke Kurdî jî hebe û divê herkesê mil bidê."

**"Referandûm ji bo Kurdan fersendeke mezin e"**

Serokê Partiya Demokrasiya Beşdar (KADEP) Lütfü Kıvanç: Ev biryar ji bo Kurdan hêviyeke mezin e. Piştevanîkirina vê biryarê peywîra hemû Kurdan e. Biryara referandûmê wê bandorê li ser parçeyên din jî bike. Bi vê biryarê Kurd bi hişmendiyeke netewî û vejînekê ber bi dewletbûnê ve diçin. Referandûm wê armancên wan hizbên ku li pey îdeolojiyên ne netewî ne jî jinav bibe û dê wan jî bîne ser xeta netewî. Wê bizanibin ku divê bo dozeke netewî tê bikoşin. Ev biryar ji bo Kurdan fersendeke ku bibin xwedî dewleteke serbixwe û divê ev fersend jî ji dest neyê dayîn. Divê herkes piştgiriyê bide referandûma serxwebûnê."

**"Dewleta Kurdistana Serbixwe wê bibe destgirê hemû Kurdan"**

Serokê Giştî yê PAKê Mustafa Özçelik: "Serxwebûna Kurdistana Başûr ji daxwazeke siyasî derketiye û êdî bûye meseleya hebûn û tunebûna miletê me yê Başur. Serxwebûna Kurdistana Başûr wê bo çareseriya pirsgirêkên sîyasî, civakî, aborî yên Kurdistana Başûr jî atmosfereke erenî çê bike. Rêveberiya Federe ya Kurdistana Başûr, ji gelek dewletên cîhanê zêdetir xwediyê wan taybetmendiyan e ku bibe dewleteke serbixwe. Her wiha xwediyê wan derfetên weke leşkerî, îdarî, aborî û civakî ye jî. Serxwebûna Kurdistana Başûr, wê bo azadiya perçeyên din yên Kurdistanê jî deriyekî veke.

Serxwebûn wê hişmendiya Kurdan a netew û dewletê geş bike û webaweriya Kurdan a xwe-rêvebirinê xurt bike. Dewleta Kurdistana Başûr wê bibe destgir, mala hevpar , sî û stareya hemû Kurdên cîhanê. Divê ji her perçeyan Kurd, Kurdên hemû cîhanê, bi partiyên xwe yên sîyasî, bi saziyên xwe yên civakî yên sîvîl û bi şexsên bi bandor kampanyayên baş amade bikin û "Platformên Piştgiriyê yê bo Serxwebûna Referandûmê" ava bikin. Divê em hewl bidin û kampanyayan amade bikin ku em piştgiriya raya giştî a cîhanê bigirin da ku nûnerên dewletan bibin destgirê serxwebûnê. Hewce ye piştgiriya Referandûma Serxwebûnê û Serxwebûna Kurdistana Başûr bo hemû Kurd û Kurdistaniyan ji bo ku ev dewlet li ser piyan bisekine wek peywireke dîrokî û netewî bê qebûl kirin.


**"Serxwebûna Kurdistanê pêngaveke girîng û biqîmet e"**

Berdevkê Tevgera Azadî û Mirovan Ahmet Kaya: "Referandûma Serxwebûna Kurdistana Başûr encama vîna wan e. Serîlêdana vîna gel rewşeke meşrû ye. Li gor prensîbê her gel bi vîna xwe mafê xwe yê serdestiyê dikare bikar bîne. Serxwebûna Başûr a Kurdistanê bo hemû Kurdan qonaxeke girîng e. Motîvasyon û xwebaweriya ku Kurd bi saya dewletbûnê bi dest bixin wê bo dîroka Kurdan jî girîng be.

Li hember vê bûyera dîrokî sekinîn û jê re astengî derxistin, him ji hemû rêber û têkoşerên Kurdan ên sedsalane re neheqiyeke mezin e him jî ew şaşitiya mezin wê bike ku Kurd tim bibin pariyekî xweş î li ser sifreya neyar û xêrnexwazan. Kurdistaneke serbixwe deskeftiyek e bo Kurdan û hew... binavkirinên din î dîtir bes berovajîkirin e. Pêngava serxwebûna Kurdistanê girîng û biqîmet e. Hêviya min ew e ku bi xêr be."

**"Ev yek tê wateya mafê 'self-determînasyon'ê ji bo beşên din jî"**

Sekreterê Giştî yê PDK BAKURê Dr. Yusuf Ziya jî dibêje: "Di Kurdistana perçebûyî de heke mafê self-determînasyonê ji bo parçeyekî bê dayîn, tê wateya mafê self-determînasyona beşên din jî. Em dikarin di 3 beşan de qala tesîra li parçeyên din ên Kurdistanê -eger referandûma serxwebûnê ji aliyê cemiyeta navnetewî ve bê nasîn- bikin. 1. Beşdariya navnetewî di têkiliyên Kurdistan û dagirkeran de dê rêya adîlane veke. Dagirkerên Kurdistanê li her perçeyên Kurdistanê baweriya gelê me şkandine û baweriya 'Hûn nikarin bibin xwedî dewlet' xistine serê gelê me. Mafê bikaranîna self-determînasyonê bo Başûrê Kurdistanê dê derxe holê ku Kurd jî weke neteweyên din in. Bi vê yekê jî dê Kurdên parçeyên din bi eşq doza serxwebûnê bimeşînin. Ev referandûm dê derxe holê ku doza serxwebûna Kurdistanê gihîştiye asteke din. Em nêzîkî dewletbûnê bûne. Ji ber vê yekê jî divê hemû Kurdên beşên din bê cudahî bi rihekî fedaî piştgirî bidin vê proseyê. Ev yek berpirsyariya netewî ye.




Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

## Serxwebûn doza neteweyekî ye

Serokê Platforma Demokratên Kurdistanê Sertaç Bucak: "Di dîrokê de dewleteke Kurdan a fermî hê çênebûye. Referandûma serxwebûna Başûrê Kurdistanê dê tesîrê li parçeyên din jî bike. Ev biryar ji bo lêgerîn û bidestxistina mafên Kurdan, dê destê Kurdên li perçeyên din jî xurt bike. Îlankirina dewleteke Kurdî dê bibe bingeha hebûna Kurdan. Ji ber vê yekê jî divê li seranserê Kurdistanê, Kurd ji bo xeyalên xwe yên hezar salî piştgirî bidin vê referandûmê. Bi taybetî jî divê Kurdên li dijî serxwebûnê ne rûnin û bifikirin. Ji ber ku biryara referandûm û serxwebûnê ne ya partî an jî şexsan e. Serxwebûn doza netewekî ye. Divê her kesê ku dahatû û başiya neteweya xwe difikire bi awayekî çalak piştgirî bide vê referandûmê.

## "Kurdistana serbixwe xeyala hemû Kurdan e"

"Parlementerê HDP yê Diyarbekirê, Îmam Taşçier: Ji ber vê biryarê ez Herêma Kurdistanê pîroz dikim. Kurdistana serbixwe xeyala hemû Kurdan e. Eger Kurdên Başûr biryara serxwebûnê dabin divê Kurdên perçeyên din û yên hemû cîhanê piştgirî bidin vê biryarê. Divê Kurd teqez piştgirî bidin referandûmê. Ji ber ku destkeftiya parçeyekî, destkeftiya hemû Kurdan e. Ev biryar bêgûman dê tesîreke erênî li parçeyên din jî bike."

## "Partiyên Kurdan dê piştgiriyê bidin referandûmê"

Serokê Giştî yê HAK-PAR Refik Karakoç: "Piştî biryara referandûmê, bo Başûrê Kurdistanê serxwebûn teqez bû. Polîtîkayên Hikûmeta Navendî ya Îraqê biryara referandûmê neçar hişt. Em weke HAK-PAR ji serî de piştgiriya vê proseyê dikin. Cîhanê dît û qebûl kir ku Kurdistan warê pêkvejiyanê ye. Serxwebûna Kurdistanê dê ji bo Kurdên perçeyên din jî bibe bingeh. Tew nebû dê Kurdên perçeyên din jî bizanibin ji dewletên serdest daxwaza çi bikin. Diyar e dê encama referandûmê ji sedî 99 erê derkeve. Lê ya girîng ew e ku piştî referandûmê Kurd bi tenê nemînin. Ez wisa bawer dikim ku partiyên Bakur dê piştgiriyê bidin referandûm û serxwebûna Başûrê Kurdistanê."

## "Dengdan dê li ser çarenûsa hemû perçeyên Kurdistanê bê kirin"

Serokê PAKURDê Îbrahîm Xelîl Baran: "Her çiqas di referandûmê de tenê hemwelatiyên Başûrê Kurdistanê dê deng bidin jî ev dengdayîn li ser çarenûsa hemû parçeyên Kurdistanê dê bê kirin. Baran di berdewamiya axaftina xwe de wiha dibêje: "Bi vê gavê çarenûsa Kurdistanê ku piştî Şerê Yekem yê Cîhanê hatibû pranga kirin, dê bê şkandin. Ev sedsal e em li benda vê rojê ne. Encama referandûmê dê di serî de Kurdan ji derûniya koletiyê bifilitîne û bike xwedî îrade. Îro li Bakurê Welêt siyaseta Kurdî ya serdest bêdewletbûna Kurdan pîroz dike, dixwaze vê rewşa xirab li ser Kurdan ferz bike. Dîsa li Rojavayê Welêt, siyaseteke ku li hember dabeşbûna Suriyeyê disekine heye. Ev yek dê van paradîgmayan têk bibe û ji bo pêşerojê, hemû Kurdan ji fikra dewletbûnê re amade bike. Teqez hemû Kurd divê bi rih û can xebatê bikin û nîşanî cîhanê bidin da çi dixwazin. Encam dê bi dengekî giştî 'Erê' derkeve. Kurdên li derveyî Başûrê Kurdistanê dimînin jî divê xwedî li proseya 'Erê' derkevin û bo ev prose bê qeza û bela derbas bibe bixebitin. Her wiha divê em bînin ziman ku çi hêzên navxweyî û çi yên derveyî dê bixwazin vê proseyê provake bikin. Piştî vekirina parlementoyê, di 4ê Hezîrana 1992an de gelek alozî û pevçûn derketibûn. Divê destûr neyê dayîn ku ev yek dubare bibe."

Parêzgerê Kerkûkê yê berê Abdurrahman Mustafa:

# Encamdana referandûmê li Kerkûkê girîng e



Biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê ji bo Kerkûk û deverên din ên derveyî îdareya Kurdistanê gelekî girîng e. Girîngiyeke wê heye ku sindoqên referandûmê wê li Kerkûk û deverên din jî bên danîn. Piştî referandûmê wê ji bo ragihandina dewleta Kurdî pêngavên girîng bên avêtin. Encamdana referandûmê bi tu awayî nayê wateya îhlalkirina destûra Iraqê. Piştî lidarxistina referandûmê divê hemû aliyên siyasî her tiştî deynin aliyekî û tenê li ser serxwebûnê rawestin.

AZAD MAHMUT

**PARÊZGERÊ** Kerkûkê Abdurrahman Mustafa, di derbarê lidarxistina referandûma serxwebûna Kurdistanê, li Kerkûk û deverên din ên derveyî îdareya Kurdistanê de ji Heftenameya Basê re axivî û daxuyaniyên gelekî girîng dan. Mustafa ragihand ku ji bo hînbûna nêrîn û helwesta gel, lidarxistina referandûmê ya li her herêma Başûrê Kurdistanê xwediyê girîgiyeke mezin e û eşkere kir ku xelkê Kerkûkê wê referandûmê bi coş û kelecaneke mezin pêşwazî bike.

Proseya referandûmê wê li Kerkûk û deverên din ên derveyî Rêveberiya Herêma Kurdistanê wê çawa birêve biçe? Ji ber ku biqasî ku em dizanin, di derbarê hilbijêrên van deveran de daneyên rasteqîn di destê Komîsyona Bilind ya Hilbijartin û Referandûmê ya Kurdistanê de nîn in!

Bêgûman divê Komîsyona Bilind ya Hilbijartin û Referandûmê ya Kurdistanê bi hemahengiyekê ligel Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Iraqê re vê proseyê bibe serî. Li hêla din ji bo şopandina proseya referandûmê komîteyeke ku ji nûnerên partiyên siyasî yên Kurdistanê pêk tê, dê were avakirin. Peywîreke girîng a vê komîteyê ew e ku meseleyên di derbarê referandûmê de bi berpirsên li Bexdayê re gûftûgo bike û wan qanî bike. Li gorî min biryareke girîng jî lidarxistina referandûmê li Kerkûk û deverên din ên derveyî îdareya Kurdistanê ye. Ji ber ku divê niştecihên van deveran dijîn di derbarê paşeroj û dahatûya xwe de biryar û îradeya xwe nîşan bidin.

**Eger Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Iraqê, daxwaza alîkariya Komîsyona Bilind ya Hilbijartinan a Kurdistanê li ser referandûmê red bike, wê çaxê wê çi bê kirin?**

Wê çaxê divê em çareseriyeke herî guncaw bo vê meselê bibînin û divê Komîsyona Hilbijartinan a Kurdistanê vî barî bi tena serê xwe bigire ser milên xwe û birêve bibe û bo vê yekê jî amade be. Niha wexteke baş ku têra amadekariyan bike li pêşiya me heye divê ji bo her rewşê amadekarî û alternatîfên komîsyonê hebin.



**Rewşa Kurdên ku li parêzgeha Wastê dijîn wê çawa be? Ew wê çawa beşdarî referandûmê bibin?**

Divê ew dever jî mîna Kerkûk û herêmên din ên Kurdistanê beşdarî referandûmê bibin û di derbarê dahatûya xwe de xwedî biryar bin. Divê sindoqên referandûmê teqez ji bo wan deveran bên şandin û li wan deveran bên danîn. Ji ber wê yekê ez dibêjm ji bo ku nêrîn û helwesta miletê li Kurdistanê ya di derbarê serxwebûna Kurdistanê de bê zanîn, danîna sindoqan li her devera Kurdistanê û herêmên Kurdistanê yên li derveyî îdareyê zaf girîng e.

**Kêmneteweyên ji bilî Kurdan ên Kerkûkê çawa li referandûmê dinêrin?**

Li Iraqê kî hatiye ser îktîdarê zilm li gelê Kerkûkê kiriye. Saddamê ku ji îktîdarê ketî di serî de, her îktîdara ku hatiye Erebkirina Kerkûkê daye dest pê kirin. Rûyekî vê Erebkirinê jî koçkirina bi zorê li ser Kurdan û anîna Ereban bi heremê ye. Di 2003an de dema îktîdara Saddam hat rûxandin mixabin pirsgirêkên ku bi Erebkirinê re derketibûn holê nehatin çareserkirin. Mixabin maddeya 140î ku ji bo vê yekê hatibû sazkirin ev deh sal e bicih nehat. Ji ber vê jî referandûm bo Kerkûkiyan gelek girîng û gelê Kerkûkê jî bi coş dê hembêz bike. Lê belê komeke hindik ê Ereb û Tirkmen li hember referandûmê xwedî nêrînên cuda ne. A girîng nêrîn û îradeya gel e. Bêgûman referandûm jî bo derxistina nêrîn û îradeya gel rêya herî baş e.

**Hin aliyên siyasî yên Iraqî dibêjin ku pêkanîna referandûmê îhlalkirina Destûra Iraqê ye. Gelo di vê mijarê de mafdar in?**

Pêkanîna referandûmê bi tu awayî ne îhlalkirina destûra Iraqê ye. Ji ber ku referandûm tenê yek ji rêyên ku gel dahatûya xwe diyar dike ye. Referandûm bijarteyeke demokratîk û kanûnî ye. Gel di referandûmê de bi azade biryara çawaniya dahatûya xwe dide. Her wiha ji aliyê kanûnî ve jî tu astengî li ber vê proseyê tune ye. Di peymanên navnetewî de jî pêkanîna referandûmê tê dayîn. Ligel vê, referandûm bingeha prensîba demokrasiyê ye.

**Ji 2005an ve qala referandûmê tê kirin. Gelo referandûma 2005an û ya 25ê Îlona pêşiya me dişibin hev?**

Di 2005an de referandûma serxwebûnê tenê ji aliyê saziyên sivîl ve û tenê li herêmên girêdayî Herêma Kurdistanê pêk hat. Kerkûk û herêmên din ne di nav de bûn. Lêbelê referandûma ku dê 25ê Îlonê de pêk were him fermî ye, him jî hemû axa Kurdistanê di nav de ye. Referandûma pêşiya me biryara hemû hêzên siyasî ye. Ev referandûm li hember Bexdayê dê destê Kurdan xurt bike.


> "Divê yekîtiya nîştimanî pêk were. Hemû aliyên siyasî divê her tiştî deynin aliyekî û ji bo serxwebûnê tevbigerin. Serxwebûn xeyala herkesî ye. Bo ev xeyal pêk were divê em bi giştî tevbigerin. Hemû alî di vê proseyê de ji bo ku ev armanca pîroz biserkeftî encam bide xebata azadiyê bike."

## Gelo piştî referandûmê ji bo îlankirina serxwebûnê çi gav dê bên avêtin?

Bêgûman piştî referandûmê ji bo îlankirina serxwebûnê divê di çarçoveya planekê de gav bên avêtin. Komîte û heyetên ji bo referandûmê hatine hilbijartin, piştî referandûmê ji bo îlankirina serxwebûnê jî dê dest bi xebatê bikin. Gava herî girîng jî ew e ku bidestxistina piştgiriyê bo serxwebûnê ye. Ev heyet dê ligel Bexda, dewletên cîran, Amerîka û dewletên bi hêz ên cîhanê re gotubêjan bikin. Dê ji van dewletan re nîşan bidin ku Kurd miletekî aştiyane, bi demokrasiyê bawer û bi parastina hidûdan re girêdayî ne. Niha bo serxwebûnê dema herî baş e. Ji ber tekoşîna li hember DAIŞê Kurdan di raya navnetewî de xiste nav cihekî pir girîng û pêşmerge xwedî roleke mezin e.

## Piştî referandûmê proseya îlankirina serxwebûnê dest pê dike. Ji bo aliyên siyasî vê proseyê biserkeftî derbas bikin divê çi bê kirin?

Divê yekîtiya nîştimanî were pê. Hemû aliyên siyasî divê her tiştî deynin aliyekî û ji bo serxwebûnê tevbigerin. Serxwebûn xeyala herkesî ye. Bo ev xeyal pêk were divê em bi giştî tevbigerin. Hemû alî di vê proseyê de ji bo ku ev armanca pîroz biserkeftî encam bide xebata azadiyê bike.



## ABDURRAHMAN MUSTAFA

Heftiya derbasbûyî di bin serpereştiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanî de berpirsên hikûmetê û aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê civîneke dîrokî li dar xistin. Ev civîn bi armanca diyarkirina roja encamdana referandûma serxwebûna Kurdistanê û hilbijartinên parlamento û serokatiyê û her wiha jinavbirina kêşeyên li Kurdistanê û nirxandina rojeva herêm û cîhanê pêk hat.

Di encama vê civînê de, ku li Pîrmama Hewlêrê bi serpereştiya Serok Barzanî pêk hat, biryar hat dayîn ku referandûma serxwebûna Kurdistanê ku heyameke dirêj e di rojevê de ye û dîplomasiyeke xurt tê meşandin, dê 25ê Îlona îsal pêk were. Herwiha biryareke girîng jî ew bû ku referandûm dê li deverên Kurdistanê yên ku niha bi awayekî fermî ne di bin îdareya Herêma Kurdistanê de ne jî bê encamdan.

EKREM ÖNEN



## Geoekonomîka wê tesîra xwe li Geopolîtîka bike?

Di heftiya borî de serokwezîrê Herêma Kurdistanê birêz Neçîrvan Barzanî bi delegasyonekê beşdarî forûma ekonomîk a navnetewî ya Sanktpetersbûrgê bû. Di vê serdanê de delegasyona Kurda hevdîtin li gel berpirsên bilind ê Rusya pêk anîn, di serî de bi serokkomar Pûtîn re herweha bi wezîrê derve Lavrov û gelek berpirsên din re civiyan. Divê serdanê de çend armancên esasî ji bo delegasyona Kurdan hebûn:

1-Xurtkirina têkiliyên navbera Rûsya û Kurdistanê ji bo şerê bi terorîzma navnetewî re.

2-Pirsa referandûma serxwebûna Kurdistanê ku piştgiriya Rûsya bigrin.

3- Pirsa aborî (neft) bi şîrketên Rûsya re peyman-an îmze bikin.

4-Pirsa dan û stendina înformasyonê di derbarê şerê bi terorîzmê re di navbera dezgehên îstixbaratê yên Rûsya û Herêma Kurdistanê de.

5-Pirsa krediyê, Rûsya wek kredît wê niha pêşin para firotina nefta Kurdistanê heta 2019 bide Herêma Kurdistanê, wek meblexek jî vê krediyê hatiye wergirtin.

Wek tê zanîn piştî hevdîtina bi serokkomar Pûtîn û wezîrê derve Lavrov re peyman di navbera ROSNEFT û Hikûmeta Herêma Kurdistanê de hate îmze kirin. Ev peymaneke gelek girîng bû ji bo Herêma Kurdistanê ku di vê rewşa navnetewî û herêmî de ku ne diyarbûnek ji bo Kurda heye. Wek Neçirvan Barzanî jî da diyar kirin; "Di tarîxa Herêma Kurdistanê de tiştekî dîrokiyî". ROSNEFT şîrketa dewletê ye, yek ji mezintirîn şîrketa navnetewî ya neftê ye her weha ji %50 xwediyê nefta Rûsya ye, li Awrûpa, Afrîka, Asya û Arktîka (Antartîka) li gelek herêman neftê derdixe û transportî bazara navnetewî dike. Peymana wan bi Herêma Kurdistanê re wê nefta Herêma Kurdistanê ku niha kapasîta wê rojê dor 700 hezar bermîle wê heta dawiya salê derxin milyonek bermîl û transportî bazara navnetewî û navenda ROSNEFT ê a li Almanya bikin. Her weha wê li 4 herêmên Herêma Kurdistanê ku Kerkûk jî di nav de ye, dest bi lêgerîn û derxistina neftê bikin. Di heman demê de xweşbûna têkiliyên Rûsya bi Herêma Kurdistanê re û bi 4 dewletên ku Kurdistan parçekirine, ji bo ev proja Kurda biçe serî pozîtîve an negatîve? Bi ya min pozîtîve, ji ber ev pirsek pragmatîke. Welatekî din di şûna Rûsya de têkiliyên wê bi 4 dewletên Kurdistan perçekirine re ne baş be dikare projêyek weha neçe serî. Heger mirov pragmatîk lê binêre ev peyman di berjewendiyên Rûsya û Kurdistanê de ye. Rûsya geostratejîk - pragmatîk nêzîkî pirsê dibe hesabê paşeroja rojhilata nêzîk dikin û Kurda wek aktor dibînin, wek welatekî zirhêza cîhanê ku monopola enerjîyê (gaz, neft, elektrîk, enerjiya atomê û komur) di dest de ye, heremeke wek Herêma Kurdistanê ji alî neft û gazê dewlemend ku bikaribe di bazara wê de xwedî giranî be girînge. Her weha bi Kurdan re hîn nêzîktir dibe. Ji alî Kurdistanê de ku ev demeke dirêje şîrketên neftê yên navnetewî ku pişt dabûn Kurdistanê bi vê peymanê ewê jî berê xwe bidin Kurdistanê, rewşa xerab a aborî ku çend sale hikumeta navendî ambargo danî ser Kurdistanê wê baştir bibe. Gelek cihên kar wê bên vekirin. Û ya herî girîng Herêma Kurdistanê wek serokwezîr Neçîrvan Barzanî got; "Ev tiştekî cara yekemîn û dîrokiye di dîroka Herêma Kurdistanê de ku dewletek zirhêz raste rast bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re peymana neftê îmze dike." Ji bo legîtîmnost gelek girînge.

Her çiqas ev peyman peymanek aboriye lê girîngiya wê a geostratejîk ji bo Herêma Kurdistanê heye. Girîngiya wê ew e ku ev peyman piştî hevdîtina serokwezîr Neçîrvan Barzanî bi serokkomar Pûtîn û wezîrê derve Lavrov hate îmze kirin. Ev di dîplomasiyê dê tê wê wateyê ku desthilata siyasî a welêt piştgiriyê dide vê peymanê. Di vê serdana ku Rûsya qedrekî bilind dayê şandeya Kurdan, işareta ku Rûsya bi cîhanê da fam kirin emê li gel Kurdan aktîv kar bikin. Di vê peymana ROSNEFT û Herêma Kurdistanê de derxistina petrolê li Kerkûkê jî tê wê wateyê Rûsya Kurdistanbûna Kerkûkê nas dike. Ji ber pirsa referandûmê di hevdîtina de hatiye gotûbêj kirin, ev protses tev dide rêdan ku Rûsya bi erênî li pirsa referandûmê jî dinêre. Di pirsa serxwebûnê de jî Pûtîn demê berê jî gotibû li gor hiqûqa navnetewî mafê miletê Kurd divê bê parastin.Wek tê zanîn sembola Rûsa hirçe. Hirç heywanekî bê deng û bêhn firehe, bes bi armance. Siyaseta Rûsya jî weha ye siyasetek bê deng, bêhn fireh û bi armance. Kurd divê pragmatîk bin. Ne Rûs ne DYA û ne kes Kurda niha mecbûr nake hevalê min be li dijî yê din. Çima Kurd lazime teref bigrin? Lê yekîtiya nav mala Kurda pêwîste û Kurd divê bi DYA, ÇÎN û YA heman têkiliyan bike.




## Li Ewropa Festîvalên Serxwebûnê dê lidar bin:

# “Ji bo Kurdistaneke serbixwe”



NÛJÎN ONEN

Kurdên li Ewropayê li bajarê Almanyayê Kölnê dijîn ji bo ku piştgiriya serxwebûna Kurdistanê bikin û ji bo ku ji welatên Ewropa jî piştgiriyê bistînin pêkhateyek bi navê “Komîteya Festîvala Serxwebûna Kurdistanê” damezirandine. Ev komîte dê di dîroka 26.08.2017an wek navend li Kölnê festîvalekê li dar bixe. Ji xeynî Kölnê tê çaverêkirin ku li Awusturya Viyenna, heger xebatên wan encam bidin dê li welatên din yê Ewropa jî di heman rojê de festîvalê li dar bixin. Kesên ku di vê komîteyê de cîh digirin xwe wek ‘’Civaka Sîvîl ya Serbixwe” binav dikin. Kesên di vê komîteyê cî digirin kesên sîvîl in ne di bin navê partî an dezgehekê de ne. Berdevkê komîteyê Mehmûd Kalo dibêje “Em bi partiyên Amedê re jî di têkiliyê de ne, heger rewş guncaw be dê heman rojê li Amedê jî ev festîval bê lidarxistin.’’ Berdevkê Komîteye Festîvala Serxwebûna Kurdistanê Mehmûd Kalo ji Heftenameya Basê re behsa xebat û amadekariyên xwe kir.

**“Ji bo Kurdistana Serbixwe”**

Berdevkê komîteyê Mehmûd Kalo behsa damezirandina komîteyê û xebatên xwe yên berê û yê niha kir û got: Komîteya Festîvala Serxwebûna Kurdistanê derdora sal û nîvekê ye hatiye damezirandin. 11 kes di komîteya bilind de cî digirin û hemu ji kesên serbixwe pêk tên, em beşek ji civaka sîvîl in û li Ewropa li Almanya dijîn. Niha xebata li pêşiya me Festîvala Serxwebûna Kurdistanê ye. Berî 30-35 salan me behsa serxwebûna Kurdistanê li cîhanê û di civaka Kurdî de bikira ev wekî xewnekê bû, kesî nikarîbû gotina Kurdî bianiya ser zimanê xwe heta behsa serxwebûnê bike. Dema em li îro dinêrin ew xewn gav bi gav ber bi rastiyê ve diçe.

26ê meha 8an li bajarê Kölnê li qada Heumarktê emê Festîvala Kurdistana Serbixwe li dar bixin.

Mehmûd Kalo dide xuyakirin ku dê bangî bi hezaran Kurd û Ewropayiyan bikin da ku beşdarî festîvalê bibin, di derbarê vê de wiha diaxive: Danûstandinên me bi Ewropayiyan re hene. Têkiliyên me bi parlementerên Fransî, Îngîlîzî re jî hene. Li Almanya Komeleya Civaka Kurdên Schweinfurt (Kurdish Gemeinde Schweinfurt) 10 hezar dawetname ji rêxistinên civaka sîvîl û ji çapemeniya Almanya re şandiye bo ew jî beşdar bibin. Hinek serokên partiyan gotin dibe ku em nikaribin tevlî we bibin lê dê cîgirê xwe bişînin. Her wiha têkiliyên me dê bi Wezîrê Rewşenbîriyê yê Urdinê yê berê Salih El-Qelab re hene ku ew dostê Kurdan e. Ji bo beşdarî festîvalê bibe emê ji wî re jî dawetnameyê bişînin. Ji aliyê din têkiliyê me bi senatorekî Amerîkî re jî hene. Emê İsmail Beşikçi jî vexwînin festîvalê.

Wek berdevkê vê komîteyê banga min ji kesên her çar parçeyên Kurdistanê yê ku li Ewropa dijîn ew e ku bi rengekî xweşik beşdarî festîvala serxwebûna Kurdistanê bibin. Banga min a mezin û taybet jî ji Kurdên Bakûrê Kurdistanê yê ku li Ewropa dijîn re ye, ji ber ku li vir hejmara wan zêdetir e. Li gor texmîna me tenê li vîlayeteke Almanya (Nordrhein Westfalen) 100 hezar Kurdên Bakûrê Kurdistanê lê dijîn, banga min ji wan ku bi rengekî malbatî, ne tenê nûnerên partiyan, her kesê ku piştgiriya serxwebûna Kurdistanê dike bila werin di festîvalê de cî bigirin.

Kalo di derbarê birêvebirina festîvalê û çalakiyên din de jî wiha amaje dike: Dora 30 komîteyên me li Almanya heye. Yên ku li bajaran jî dixebitin hemu partiyên herçar parçeyên Kurdistanê bi me re ne, piştgiriya me dikin lê ji aliyê aborî ve ti kesî alîkariya me nekiriye. Festîvala me dê rojekê berdewam bike ji seat 11ê sibehê dest pê bike heta 6ê êvarê. Ji xeynî festîvalê çalakiyeke me ya din jî heye lê hîn roja wê ne diyar e. Li hemû paytextên dinyayê yê ku Kurd lê dijîn şevekê emê mûman vêxin bo piştgiriya serxwebûna Kurdistanê bikin.



Berdevkê komîteyê di dawiya axaftina xwe de fikrên xwe wiha tîne ziman ‘’Ez di vê baweriyê de me ku yek Kurdek tune ku li hember serxwebûna Kurdistanê bisekine. Ji bo serxwebûna Kurdistanê bi hezaran hêsrên dayikan hatiye barandin, bi hezaran kes şehîd bûne, jin bî mane. Ez bawer nakim yek kes di nav Kurdan de hebe li hember serxwebûna Kurdistanê bisekine.

**‘’Belkî li Amedê jî Festîvala Serxwebûna Kurdistanê pêk bê”**

Mehmûd Kalo ji me re behsa naveroka festîvalê û behsa bajarên ku wê festîval lê çê bibe dike:

Ji bo festîvalê têkiliyên me bi Amedê re jî hene. Belkî di heman rojê de bi heman slogan û bernameyê li wir jî 26ê meha 8an Festîvala Serxwebûnê bê li dar xistin. Sazkirina festîvala ku wê li Amedê jî li dar bikeve li ser partiyên Kurdistana Bakûr in. Partiyên ku dê piştgiriyê bidin ev in; PAK, PDK-Bakur, PDK-T, Hak-Par, PSK niha têkiliyên me bi wan re hene. Ji bo kesên li Ewropa me 5 hezar alên Kurdistanê şewqe amade kiriye tîşörtên li ser wê bi zimanê Kurdî, Îngîlîzî “Serxwebûna Kurdistanê”nivîsandiye me amade kiriye. Têkiliyên me bi Awusturya re jî hene. Em dixwazin festîval li paytextên Ewropa jî bê li dar xistin. Niha di rêzê de Viyana, Awusturya, Amed heye em bi hêvî ne bêhtir li paytextan vê festîvalê lidar bixin. Weke mînak di demên pêş de emê bi Kurdên li London û Liverpolê dijîn re biaxivin. Ji ber ku Kurd bêhtir li van deran hene. Me xwest em dewletên cîranê Almanya yê ku Kurd lê dijîn jî têxin komîteyê.

---

## DÎTAM pêşengiyê dike;

# Rêxistinên civakî yên sîvîl li aşitiya Tirkiyê digerin

CELÎL CEWHER

Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcleyê (DİTAM), di çarçoveya Projeya Tora Aşitî ya Civakî, beriya niha li Êlih, Riha, Mûş, Colemêrg, Wan, Meletî, Amed û Enqereyê civîn pêk anîbûn, kombûna xwe ya dawîn li Stenbolê pêkanîn. Piraniya wan ji nûnerên saziyên civakî, gelek akademîsyen, nivîskar, rojnameger, siyasetmedar û aktîvîstên ku li ser pirsgirêka Kurd pispor in, beşdarî civînê bûn. Di civînê de li ser çawaniya aşitiyê ku bi danîna çekan an jî bi destpêkirina proseyeke nû dê pêk were, niqaş hatin kirin. Aktîvîstê Mafê Mirovan Ömer Faruk Gergerlioğlu ku beşdarî civîna DITAMê ya bi navê ‘Di proseyên Aşitî ya Civakî de Rola Rêxistinên Civakî yên Sivîl’ bû, diyar dike ku ji bilî çareserkirina pirsgirêka Kurd, rêyeke din li ber Tirkiyê nîn e û dibêje Kurd aşitiyê dixwazin. Gergerlioğlu wiha pê de diçe: “Her çiqas aşitî niha ne îhtîmaleke nêzîk be jî gelek tiştên ku saziyên civakî yên sivîl bikin hene li hemberî polîtîka û kiryarên ku civatê ji aşitiyê dûr dixin.”

**“Armanc ji bo çareseriyê, vekirina rêyên diyalogê ye”**

Serokê Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcleyê Mehmet Kaya, bibir dixe ku Tirkiye heyam û bûyerên herî dijwar bi alîkarî û piştevaniya saziyên civakî derbas kirine û axaftina xwe wiha didomîne: “Dema ku me li proseyên aşitiyê yên li cîhanê nêrî, em ê bibînin ku di wan proseyên ku saziyên civakî di nav de ne bi ser ketine û mayînde bûne û herwiha saziyên sivîl roleke gelek girîng lîstine.” Kaya dibêje wan bi lidarxistina van civînên dawîn, xwastiye ku bingehekê ji bo proseyeke nû ava bikin û pê de diçe: “Armanca civînên me pêkanîna aşitiyê li Tirkiyeyê û ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd vekirina rêyên diyalogê ye. Ji bo ku pêvajoyeke nû dest pê bike, saziyên civakî yên sivîl rakin ser lingan û zext û fişarê li ser siyasiyan çêbikin. Helbet tevî destpêkirina qonaxeke nû ji bo çareseriyê, sedemên têkçûna proseya berê, çi şaşî hatine kirin û çawa dikarin li pêşiya heman şaşî û xeletiyan bisekinin, ev jî mijarên civînên me bûn. “Kaya di wê baweriyê de ye ku eger zext û fişarên civakî zêde bibin, pêkan e ku proseyeke nû destpê bike.



“Daxwazên aşitiyê zindî ne...”

Yakup Aslan, Serokê Berê yê Şaxa Mazlum-Der a Wanê ku hat girtin, dibêje, “Aşitî rewşeke wisa ye ku mafê kesan nayê binpêkirin, azadî nayê astengkirin û însan bi rêz û empatî li hev dinêrin. Eger îhtîmala amadenebûna civakê bo aşitiyê nebe, divê saziyên sivîl, mirovên rûspî û kesêb aqilmend ji bo qanîkirina civakê di nava hewldanên zêde de bin.” Aslan axaftina xwe wiha didomîne: “Em dizanin ku bê ka çi hat serê kesên danezana aşitiyê îmze kiribûn. Eger zext û gûvaşên civakî hebûna, tu kesî nediwêrî wan neheqiyan li wan kesan bike. Ji bo destpêkirina qonaxeke nû û amadekirina civakê ji bo proseyeke nû, hewldan û xebateke birêxistinî pêwîst e. Dema ku dîsa vegeriyan proseyê, divê di çarçoveya bernameyê de dabeşa peywîran bê kirin. Eger em li ber çavan bigirin ku niha jî daxwazên aşitiyê zindî ne, ne dijwar ku bi bidestxistina tecrubeyên berê jî çareserî gelek ne dûr e.”

**“Li şûna çekan divê pêşiya siyasetê bê vekirin”**

Rojnameger Mahmut Bozarslan jî ku ew jî beşdarê civînê bû, radigihîne ku divê ji bo aşitiyê her du alî jî gavan bavêjin û dibêje, “Divê hişmendiya dewletê biguhere, PKK jî agirbestê îlan bike. Hêviya hemûyan ew e ku PKK agirbestê ragihîne, herwiha dewlet jî li hemberî vê pêngavên yasayî bavêje. Mînak dibe ku bi berdana siyasetmedarên Kurd dest pê bikin. Li şûna qayûman hilbijartinên nû bên kirin. Bi vî awayî dikarin tansiyona civakê bêxin. Herwiha dibe li ser bûyerên ku di dema proseya xendekan de qewimîbûn, lêpirsîn bê vekirin. Li cihê çekan divê rêya siyasetê bê vekirin. Weke pêngava duyem jî divê polîtîkaya Tirkiyê ya ji bo Rojava bê guherîn. Tevî Tirkiyeyê jî li Sûriyê her tişt li rêya xwe dimeşe. Eger Tirkiye bi Kurdên wî alî re li hev bike, dê pêşiya çareserkirina pirsa Kurd vebe. Rojhilata Navîn tevlihevtir dibe. Agir hêj derbasî Tirkiyê nebûye, lêbelê eger pirsa Kurd çareser nebe, ev nêzîk e.”

### “Proseya aşitiyê bo hin armancên din hat bikaranîn”

Yakup Aslan: Dibe ku di hişê hin kesan de berdewamkirina şerê hetahetayî hebe, bi çalakiyên rojane mijûl bin û her wiha ji ber ku wêneyê mezin nabînin, têkbirina daxwazên aşitiyê bo xwe wek serkeftin bihesibînin. Sedema vê hiş û nejidilbûna li hemberî vê proseyê, ji vir tê. Prose û qonaxa aşitiyê, ji ber nejidilbûn û niyeta ‘bikaranîna proseyê’ bo armancên din hebûn. Me pêşbînî dikir ku piştî vê aramiyê wê bahozeke mezin pêk were û tundî wê di asteke bilind de berdewam bike. Dîsa jî me hemûyan gelek hewl da ku prose têk neçe û me şiyar kirin ku ji bo aşitiyê çi bikeve ser milên me emê bêkêmasî bicî bînin. Kesên têkildar kiryarên ku di meha proseyê ya yekem de bûn, didîtin ka prose ber bi ku ve diçe. Dema ku me lê nêrî em dibînin ku xendek û barîqat bêwate bûn. Ne diyar e ka çi qewimî ji bo biryareke wiha bê standin. Herçiqas tê gotin ku li hemberî wê yekê bû ku Tirkiye bi hemû hêza xwe êrişî Rojava neke, bala raya giştî ya dinyayê bikişîne ser mafdariya mafên Kurdan û bi vî hawî Tirkiyê di qada navnetewî de di tengasiyê de bihêle jî dîsa jî pêdivî bi îzaheke rasteqîn heye bê ka çima destûr dan ku bi sedan ciwan di vî şerî de jiyana dest bidin. Eger ev hemû di çarçoveya têkşikandina vîn û hêza mixatab de be, ma ne diviyabû ku ev tişt di nav projeyeke bi rêkûpêk de, bê berdewamkirin û bicîkirin?”

# Referandûm ber bi deskeftên mezin ve diçe





AZAD CUNDIYANÎ

Biryara pêkanîna refendûmê bi beşdariya gelek aliyan hate dayîn û ev jî meşrûiyeta vê biryarê qewîntir dike.

Bi beşdariya gelek partiyên Kurdistanê di 7ê Hezîrana 2017an de biryardayîna roja pêkanîna referandûmê pir girîng dibînim. Ji ber ku ew qonaxa dê referandûm bê kirin an neyê kirin derbas bû. Êdî em derbasî qonaxa referandûm dê pêk be bûne.

Xaleke girîng a civînê jî beşdarbûna aliyên siyasî û netewî, nûnerên îslamî û kirîstiyanan e. Tiştê ji bo min herî girîng, xebat û îradeya Kurdistanê ya li hember vê rewşa ne xweş e. Gava yekem ber bi serxwebûnê ye. Me rewşeke aloz derbas kir.

Dizanim ku hê jî hin alî ji referandûmê aciz dibin û dê li hember vê bixebitin. Ev xebat zaf an hindik, tund an jî nerm li hember stratejiya referandûm û serxwebûnê dê bisekinin û rexneyan lê bigirin. Ez û bi milyonan mirov ne hevalê van bertekan in. Her çi dibe bila bibe ev kesên ku ji xirabûna yekîtiyê dê kelecan bibin dixwazim ku nerîna xwe biguherin. Dixwazim li gel me xebata referandûmê bimeşînin. Dixwazim ewlewiyeta wan pêkanîna referandûma serxwebûnê be û dev ji rikberiya siyasî berdin.

Divê rewşenbîr û siyasetmedarên her du aliyan ligel hev bicivin û piştî referandûmê ji bo serxwebûnê mekanîzma, deshilatdarî û nêrîna demokrasiyê bername amade bikin.

Di mijara referandûmê de ya girîng ne ew e ku em li derveyî xwe proseyeke demokratîk bimeşînin. Ev bi temelên nav me yê demokratîk ve jî girêdayî ne. Ji ber ku derî ji piştgir û hembergiran re vekirî ye. Ji vê yekê vekirîtir tiştek hebe ew jî girtîbûna dengdayîna ji bo referandûmê ye. Her kesek dê biryara xwe li gor dilê xwe bi awayekî weşartî bide. Ez hêvî nakim ku wê li Kurdistanê di tu sindoqî de dengên na derkevin.

Ev proseya ku girêdayî demokratîzebûnê ye dê tesîrê li bernameya pergala me ya siyasî jî bike. Em ji niha ve dibînin ku hin kes bi guman li bernameya Kurdistana Serbixwe dinêrin.

Naxwazim qala rexne û bertekan bikim. Ji ber ku divê ev alî jî di vê qonaxê de ewlewiyetê bidin referandûm û serxwebûna Kurdistanê.

Gotina min î dawî, di pêşerojê de hemû aliyên siyasî yên Kurdistanê û gelê Kurdistanê di heman sengerî de be. Ev alî, aliyê referandûm û serxwebûnê ye. Ji ber vê yekê jî divê em hemû alî di vê pêngava qezancan de tevbigerin.

## Kurdistan: Tava kurdan hiltê



DEVLIKEN KELOGIRÎ

Rojev, germ dibe sar dibe, germ dibe sar dibe, dikele, dikele dipejiqîne.

Rojev, germ dibe sar dibe, germ dibe sar dibe, dikele, dikele, lê vê carê napejiqîne; ji vê kelê Kurdistanek ê çêbibe.

Bi salan e em bi xeyala Kurdistanekê dijîn.

Carina hêvî şikest, carina xurt bû, lê her bendewar bûn em.

Rojev, tu carî wek îro bi Kurdistanê nekeliyabû.

Û bêhna Kurdistanê pêl bi pêl seranserê dinyayê dîl digire.

Kurdistan nêzîk e...

Kurdistan gav bi gav tê...

Kurdistan ji başûr hiltê, ber bi rojava ve bilind dibe.

Û wê ji rojhilat û bakur re bilîrîne.

Birêz Trump gera xwe ya dinyayê bi Siûdî Erebîstanê dest pê kir.

Xalê Trump (Ji nuha şûn de em û israîlî ap û birazî, em û emerîkî jî xal û xwarzê ne. Loma jî Trump xalê me ye)

Erê, xalê Trump bi serdana qralê Siûdî Erebîstanê re xwest ji Ereban re bibêje, "Doh doh bû îro îro ye. Ji peyva min dernekevin û min go çi bi ya min bikin. Wexta dewleteke Kurdî hatiye û hûn ê dev ji neheqiya xwe ya bi salan berdin."

Xalê Trump û rêhevalên xwe herçend fîstanê Ereban li xwe nekirin jî, teva şwîrê xwe bi wan re govend gerand.

"Hela werin vê govendê
Ev govenda şervana ye
Govenda azadîxwaza ye
Govenda mirovên bi namûs e"

Di vê meşa azadî û serxwebûnê de divê Kurd dev ji hesab mesabên biçûk berdin.

Mesele Kurdistan e û pêwist e her Kurd Kurdistanê di ser her hesabî re bigire; ji ber ku Kurdistan hesabê herî mezin e.

Nêrîna we çi dibe bila bibe,
îdeolojiya we çi dibe bila bibe,
baweriya we çi dibe bila bibe,



heger Kurdistan nebe, hûn ê li ber siya nêrîn û îdeolojî û baweriyên xwe tenê sêwî û stuxwar bin.

Ji bo azadiya fikrî-kesayetî-olî Kurdistaneke azad divê.

Li ser bakurê welatê min ewrekî reşxeniqî kon vegirtiye.

Mêjiyan çolbeyar dike nezaniya zanînfiroşan.

Ax li bêhna xwe digere.

Azadî jê direve.

Û di sîhûpênc salan de tenê sîhûpênc gavan jî ber bi azadiyê ve neçû, bakurê welatê min.

Guliyên çavxezalan li stuyên fêrizên bi heybet geriyan, bi hev re emirqutî bûn, di rêya Kurdistaneke azad û serbixwe de.

Ew keçên çavxezal, ew xortên mîna fêrizan, bi dilekî pak ketin pey rêya Kurdistaneke pak, lê ew paktiya wan di şevreşan de ji nêçîrvanên bêbext re bûn nêçîr, mixabin.

Her qop, her kulek, lê mîna kwîrekî ehmeq her li belengaziya xwe hilkumî.

Ket rabû, ket rabû, lê hîç li ser xwe needilî, bakurê welatê min.

Piştî xalê Trump vegeriya Emerîkaya xopan, qralê Siûdî Erebîstanê şwîrê xwe ji Îranê re kişand û ji rêhevalên xwe re go, yan ez, yan Îran, yan jî mirin.

Û "ez" ne tenê "ez" e.

Rojev, germ dibe sar dibe, germ dibe sar dibe, dikele, dikele dipejiqîne.
Rojev, germ dibe sar dibe, germ dibe sar dibe, dikele, dikele, lê vê carê napejiqîne; ji vê kelê Kurdistanek ê çêbibe.

Di "ez" ê de ez heme, tu heyî, ew heye, em hene, hûn hene, ew hene.

Anku di "ez" ê de Kurdistan heye.

Siûdî Erebîstan, Bahreyn, Misir, Yemen, Lîbya û Mîrîtiyên Ereb li dijî Katara hevalbenda Îranê dîwarek lêkirin û ambargo danîn ser.

De Xwedê bike ev bêbavina xwe bi xwe çavê hev derxin û hejmara mêjiyên kurmî û genî li ser rûyê dinyayê kêm bibe.

Diyar e rojev ê piştî kela başûr û rojava piçekî dakeve wê li hêla Îranê bilind bibe.

Û rojev ê ji Îranê re germ bibe sar bibe, germ bibe sar bibe, bikele, bikele û wê Îranê di nav xwe de biqelîne.

Li pêşiya Kurdistaneke serbixwe û yekbûyî, Îran girêka azadiyê ye û divê ew girêk vebe.

Û ew ê vebe jî.

Û dawî...

Anku fînal,

Bi qasî govenda xalê Trump ya bi siûdiyan re, hevdîtina rêheval Pûtîn û serokwezîrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî jî balkêş û girîng bû.

Herçend rêheval Pûtîn li ber çelengî û karîzmaya Nêçîrvan Barzanî xwê da jî, xwêdana wî ji bo esasê Kurdistaneke serbixwe herikî.

Ew wêneyê wan dilê gelek kesan şewitand.

Hin ji kêfê, hin jî ji kerbê...

Û yek ji kesên bi wê kerbê dike can bide jî, serokwezîrê Iraqê Abadî ye.

Weleh Abadî efendî,

Kurdistan ê bibe gulokeke agir û te bişewitîne û tu yê wek xwe bimînî ABADÎ, lê Kurdistan ê bibe EBEDÎ.



HOŞENG OSÊ

## Öcalan û pesndayîna xwîn rijandinê



Di bîranîna 15 tebaxê de sala 1991ê, li kampa PKKê a Beka'ê ya Lubnanê li pêşberî bi hezaran dost, heval û alîgirên rêxistinê, serokê PKKê birêz Abdullah Öcalan axaftineke dirêj got. Ew axaftin hate wergerandin zimanê erebî û di kovara "Dengê Kurdistan" de hate belav kirin. Manşeta sereke ya axaftina Öcalan ku li ser bergê pêşîn yê kovarê jî bû, ev bû: "Divê em ji rijandina xwînê netirsin. Lê divê em ji rawestandina xwînê bitirsin!" Öcalan, qaşo dixwest çavên kurdan ji şer û şehîd û qurbaniyan neşkê, lewma dixwest mirin û kuştin ji bo doza Kurd "felsefelemşe - PKKeleşme" bike, weke ku biraderên me yên PKKyî dibêjin û ji bo Öcalan gelê reben bi nêrîn û mentiqê xwe qebûl bike û gotina xwe li ser "girîngî û pêwistiya" rijandina xwîne şêrîn bike, digot: "Dema xwîn di damaran de radiweste, dil jî radiweste û mirin çê dibe. Lê dema xwîna di damaran de diherike, jiyan berdewam dike. Lewma divê em ne ji rijandina xwîne bitirsin, lê ji rawestandina wê".

Di sala 1993an de Öcalan şer ji aliyekî ve rawestand. Di daxwiyaniya agirbesê de zindî li pêşberî bi milyonan hate gotin: "Em dixwazin xwîna ku ji Kurd û Tirkan dirje, raweste". Her wisa, Öcalan di 1995an û 1997an de, dîsa yekalî, agirbes ragihand û eşkere kir ku daxwaza çareseriyê û rawestandina xwînê dubare kir. Lê ne di sala 1993an, ne 1995an, ne jî 1997an de, kes ji nava PKKê ranebû û ji Öcalan re ne got: "Serok Apo, Apê me, serdar û rêzanê me... çima di sala 1991ê de te ji me re digot: Divê em ji rijandina xwînê ne tirsin, divê em ji rawestandina xwînê bitirsin. Niha tu dibêjî; divê xwîn raweste. Ma qey xwîna keç û xortên me li ser hesabê kêfa te ye? Kengî tu bixwazî birjînî, kengî tu bixwazî rawestînî."

Dema Zekiye Alkan, xwendekara zankoya Dicleyê bû, li Amedê di adara 1990î de agir berda bedena xwe, Öcalan gelek şîrove û analîz li ser vê çalakiyê gotin û gelek pesin da û Alkan kir mînak û sembol. Di 22.03.1992an de Rehşan Dermîrel li ser birca Kadîfekaleya Îzmîrê, wê jî agir berda bedena xwe, Öcalan pesinê wê jî da û wê kir mînak û sermbol. Di 21.03.1994an de herdû qadroyên PKKê; Ronahî (Bedriye Taş) û Bêrîvan (Nilgün Yildirim) li bajarê Manhaym a Almanya xwe şewitandin, Öcalan rê li ber xwe şewitandinê ne girt û negot: Bes e. Tersî vê yekê, serokê birêz dîsa pesin dan Ronahî û Bêrîvan kirin mînak û sembol. Pîvanê PKKebûn.

Di 30.06.1996an de qadroya jin a PKKê (Zeynep Kinaci) Zîlan xwe bi bombeyan di nava leşkerên tirk de teqand, dîsa Öcalan şîrove û analîzan li ser got û got û got... Zîlan kir efsane û sembol a xwegîhandina qûnaxa herî bilind a "PKKebûne - PKKeleşme" yê. Öcalan wisa xwe şewitandin û xwe kuştin di nava PKKê de şêrîn kir ku têgehên weke "Mazlûm Doğanbûn, Zekiyebûn, Rehşanbûn, Zîlanbûn, Ronahî û Bêrîvanbûn... û hwd" di nava partiyê de bû çand êdî ev çalakî di nava PKKê de bûn weke "urf û adet". Di sibata 1999an de dema Öcalan hate girtin û revandin, bi dehan keç û xort, jin û mêran xwe şewitandin û girtina Öcalan protesto û şermezar kirin. Wisa li PKKê hatibû ku êdî bûbû partiya xwe kuştin û xwe şewitandinê. Öcalan gelek caran banga rawestandina vî şêwe çalakiyan kir, lê mesele ji dest derketibû. Ma çawa mesele ji dest dernekeve? Piştî ewqas Öcalan pesinê xwe şewitandin û xwe kuştinê ji sala 1990î heta 1999an da.

Öcalan ji sala 1978an, ji çîroka Hîlwan û Sîweregê heta 1999an, rijandina xwîne, xwe kuştin û xwe şewitandinê kiribû felsefeya jiyana rêxistinê. Öcalan hez kirin û xweşikbûnê bi şer ve girêdida û digot: "Yê şer dike, azad dibe. Yê azad dibe, xweşik dibe. Yê xweşik dibe, tê hez kirin".

Öcalan rêxistinek wisa ava kiriye ku jiyanê di rijandina xwîne de dibîne. Welatparêzî û qehremaniya herî mezin û efsanewî di xwe şewitandin û xwe kuştinê de dibîne.

Rast e, di dîroka PKKê de gelek berxwedanên dîrokî hene, lê mirov di nava dîroka vê rêxistinê de bigere, dê semboleke aştiyê nebîne, ji ber ku hemû sembolê PKKê, yên xwe kuştin û xwe şewitandinê ne.

Dibe ku hinek bêjin: Ev yek ji hovîtî û şerperestiya dewleta Tirk tê ku tu rê û bergeh û delîv li pêşiya Kurdan ne hiştiye, lewma Öcalan û PKKê wisa derketin. Ev jî rast e. Lê rastiyeke din jî heye; ku dema Öcalan mirin û xwe kuştin û xwe şewitandin dikir pîvan, teorî û felsefeya rêxistinê, vî serokê netewî jiyana xwe li Şamê, dûrî şer, dewam dikir. Ango, tiştê Öcalan li ser şer û mangirtin û xwe şewitandin digot, li ser xwe pêk ne dianî. Bi gotineke din: Çiqas Öcalan pesnê Kemal Pîr, Hayrî Durmuş, Akif Yilmaz û Alî Çîçek dida, lê ev 18 sal in Öcalan di zindanê de ye û weke girtiyekî siyasî jî, ne weke serokekî Kurd û şoreşger, ji bo baş kirina rewşa xwe, 18 roj yan 18 saet jî ne ketiye mangirtinê.

## HDK û PDKÎ dixwazin hev bigirin:

# Hevgirtina her du demokratan Îranê aciz dike



ESKENDER CEIFERÎ



Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê PDKÎ û Hizba Demokrata Kurdistanê HDK, car din tevgerên xwe ji bo hevgirtinê xurt dikin.

HDK sala 2006an ji PDKÎ veqetiya. Ebdulla Hesenzade serkirdatiya wê kir û ragihand ku Mistefa Hicrî serkirdeyê niha yê PDKÎ, wan paşguh dike. Hicrî red dikir ku wan bêbandor bike û ragihandibû ku ewê tenê biryarên piranî bicî bike ku di kongireya wê partiyê de têne standin.

Ji wê demê ve heya niha sê serkirdeyên HDKê yên bi bandor hebûne. Ebdulla Hesenzade, Xalid Ezîzî û niha jî Mistefa Mewlûdî.

HDKê piştî ku veqetiyan ragihandibû ku hewlên Partiya Demokrat a Kurdistanê PDK û Yekîtiya Niştîmaniya Kurdistan YNKê jî nekarîne rê li ber perçebûna wê partiyê bigirin. Ji wê demê ve carinan behsa danûstandinên di derbarê hevgirtinê de dibûn rojev. Lê vê carê behs bi rengekî cidîtir germ dibe. Heta niha PDKÎ razî nebû ku navê HDKê weke partî bikar bîne û tenê ew weke Hevalên Berê binav dikirin. Lê vê carê PDKÎ piştî lidarxistina civîneke bi HDKê bi edebiyateke nermtir ew nûçe belav kir. PDKÎ ragihand ku her du polîtbûro lihev civiyane.

Yek ji mercên sereke yên HDKê ji bo tevlîbûna dubare jî navbirina wan weke partî bû.

Hin çalakvanên Rojhilatê Kurdistanê di wê baweriyê de ne ku hevgirtina her du aliyên demokrat, dikare hêza wan li navxwe zêdetir bike û bandora kesên nêzîkî Hesen Rûhanî di nav HDKê de kêm bike. Tevî ku ew dizanin du serkirdeyên wan ên bi navên Dr. Ebdulrehman Qasimlû û Dr. Sadiq Şerefkendî ji aliyê berpirsên Komara Îslamî ve hatine terorekirin lê ew rijd bûn ku Kurd beşdarî proseya dengdanê bibin. Ev jî di demekê de bû ku partiya wan HDKê bi pênc partiyên din re hilbijartinên serokkomariya Îranê baykot kiribûn. Çalakvanên Rojhilatî dibêjin eger hevgirtin çê bibe, êdî qet bandora wan namîne.

Di du salên derbasbûyî de PDKÎ, HDK û Komele, beşek ji pêşmergeyên xwe birine navçeyên sînor yên di navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê de. Carinan ew hêz derbasî navxwe bûne û hin pevçûn jî çê bûne. Di du salên derbasbûyî de hêzên PDKÎ û Komeleya di bin fermana Ebdulla Muhtedî de bi hevparî pêşmergeyên xwe şandine navxwe. Di navbera PDKÎ û HDKê de jî berî hevgirtinê odeya operasyonên hevpar ava bûye. Ev çend sal in ku di navbera PDKÎ û Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê de hevpeymaniyek hatiye îmzekirin ku neketibû warê bicîkirin û niha tê bicîkirin û weke hevpeymaniya çekdarî tê binavkirin. Îran, wan hêzan ji xwe re metirsî dibîne. Piştî van tevgerên partiyên Kurdî, Ebolfezl Hesen Bêgî endamê komîsyona siyaseta derve ya parlamentoya Îranê ragihand ku dijberên me li her derî bin, emê êrîşî ser wan bikin.

Di rojên derbasbûyî de jî li Tehranê hin êrîş û teqîn li parlamentoya Îslamî û li ser qebrê Rûhulla Xumeynî avakerê Komara Îslamî pêk hatin ku tê de bi dehan kes hatin kuştin yan jî birîndar bûn. Çalakvanên Kurd di vê derbarê de li ser torên civakî ragihandin ku ev kiryar pîlana Îranê bixwe ye. Vê carê pêleke mezin ya girtinan wê dest pê bike ku hemû jî di bin navê şerê li dijî terorê de ne û Komara Îslamî dixwaze bêje em şerê terorê dikin. Tevî ku DAÎŞ'ê berpirsyaretiya êrîşan hilda ser xwe, lê ew dibêjin êrîşeke bi vî rengî nikare bêyî haya dewletê pêk bê ji ber ku hikûmetê dest daniye ser hemû navendên ewlehî, parastin, sivîl, çandî û ... Li gor çalakvanên Kurd, kiryarên bi vî rengî zêdetir berê xwe didin dijberên Komara Îslamî. Çi ji hêzên Kurdî û çi jî dewletên lidij teqezê dikin ku libendê ne pêleke girtina Kurdan çalakvanên Sunne û her wisa êrîşa ser navendên pêşmergeyên Rojhilat di bin navê şerê li dijî terorê de dest pê bike. Tevî ku Komara Îslamî ragihandiye ew pênc êrîşkar Kurd bûn lê ti yek ji partiyên Kurdî girîngiyê nade vê mijarê û dibêjin karê me tenê li Kurdistanê ye.

Ew partî du mînakên herî berbiçav tînin ku Komara Îslamî bi van kiryaran tenê dixwaze navçeyê zêdetir mîlîtarîze bike. Ew jî danîna navendên nû yên serbazî, teqandina şikeftan û şewitandina daristanan li Kurdistanê ye. Hinceta dewletê ji bo teqandina şikeftan û tevlîhevkirina jîngehê ev e ku pêşmerge nekarin xwe li navçeyê veşêrin.

# Rûhanî dest bi wêrankirina malên Kurdan kir

Hesen Rûhanî çar salan li ser kursiyê desthilatê bû. Tevî ku slogana wî reform bû lê nekarî tiştekî biguhere. Ew jî li ser siyaseta dewletên berê dimeşe. Ji ber ku qet nikare yasaya bingehîn ya Komara Îslamî biguhere.

Çar salên wî yên nû jî destpê kirine û pêleke din ya givaşê li ser welatiyên Kurd di rê de hat. Ne tenê girtîgeh ciyê Kurdan e belkî mal û milkên wan jî rastî zeftkirinê tên.

Piştî destpêkirina duyemîn çar salên Rûhanî, mala yekemîn welatiyê Kurd li Urmiyê hate wêrankirin. Islamabada Urmiyê ku zêdetir bûye cihê hejar û kêmdahatan, qet nabe xwediyê bûdceyeke taybet ji bo avedankirinê. Ji ber vê jî welatî bi neçarî, malên xwe bi bêyî wergirtina derfeta avakirinê ji şaredariya Urmiyê çê dikin. Di rojên derbasbûyî de hêzên şaredariya Urmiyê bi skorta hêzên polîs, mala karkerekî Kurd li Islamabada Urmiyê wêran kirin.

Bi vî karê dewleta Rûhanî, ne dengê reformxwazên Kurd derket ku behsa azadiyê dikirin û ne jî kesek derket xwepêşandanê. Ji ber ku her kes dizane eger di meşên girseyî de bên girtin, yan wê bi tometa şerê li dijî Xwedê rastî darvekirinê bên yan jî bi tometa hewldan li dijî ewlehiya netewî wê bi girtineke demdirêj bên cezakirin. Ji dema destbikarbûna Hesen Rûhanî wek serokkomarê Îranê, cezayê darvekirinê li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê zêde bûye. Ji wê demê ve heta niha bi sedan welatiyên Kurd hatine darvekirin.

Ew zarokê ku ji ber sermaya sibehên Urmiyê xewa şirîn nabîne, nizane ku Komara Îslamî jî Danezana Gerdûnî Ya Mafên Mirovan îmze kiriye û li gora wê, Jiyan, azadî û ewlehiya kesanî, mafê her mirovî ye. Li gor benda sêzdehemîn ya wê danazanê, mafê her kesî heye ku di nav axa dewleteke de bi serbestî rêwîtiyê bike û devera ku lê bi cî bibe ji xwe re hilbijêre. Mefê her kesî heye ku ji welatekî, yê wî jî tê de, derkeve û carekî din vegere wî welatî. Lê ew kesê ku dewleta Rûhanî mala wî xira kir, ne çûbû welatekî din û ne jî mêvan bû. Karkerek bû ku li ser axa bav û kalan ji xwe re maleke biçûk ava kiribû û bi kar û xebata rojê, nanê şevê dikirî.



Yasaya xirakirina malên ku bi rengekî neyasayî hatine çêkirin, bêyî ku guh bide rewşa aborî ya xwediyê malê, tê bicîkirin. Li gor xala sedemîn ya yasaya şaredariyan li Îranê, ew xaniyên ku bi zêderûyî li ser erdên giştî hatine çêkirin, têne wêrankirin. Lê wê yasayê qet behsa wan kesan nekiriye ku bi pereyên xwe, erd ji saziya Ewqafê kirîne û niha jî ji ber ku erdên wan di pilana berfirehkirina rêyan de ne, têne xirakirin. Ew welatî qet nayên qerebûkirin. Akinciyên piraniya wan navçeyan jî, hejar in. Tevî ku ti sermayeyeke wan jî tine ye, nizanin derbasiya jiyanê li ku derê bikin.



# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Ji destpêka meha Remezanê ve yekem girtiyê Kurd bi navê Humayûn Tûlabî yê 30 salî li girtîgeha Luristanê li Îranê hate darvekirin.

Berpirsên girtîgeha Dêzilava ya bajarê Kirmaşanê du welatiyên Kurd bi navên Mihemed Xosrewî û Omîd Teymûrî darve kirin ku bi tometa kuştina bizanebûn û dizîkirina bi çekê rastî cezayê îdamê hatibûn.

Taha Îzan berpirsê navenda parastina jîngeha Pîranşarê ragihand ku li zozanên sînorî yên wî bajarî 3 nêçîrvan ji ber nêçîra pezkoviyan hatine girtin û dest bi ser tevahiya tiving û kelûpelên wan de hatiye girtin. Divê her yek ji wan, ji bilî cezayê giritnê, nêzîkî 6000 Dolaran xerame bide dewletê.

Ji çend rojan beriya niha ve daristanên parêzgeha Îlamê û yên bajarê Qesra Şîrîn li parêzgeha Kirmaşanê rastî şewatê hatine û bi dehan hektar daristanên Zagrosê şewitîne lê aliyê hikûmî, ji bo vemirandina agir, alîkariya welatiyan nake.

Girtiyê siyasî yê Kurd yê bi navê Mihemed Emîn Ebdullahî, ku bi tometa têkdana ewlehiya netewî ji aliyê Komara îslamî ya Îranê ve deh salan beriya niha bi 18 salan girtinê hat mehkûmkirin, li girtîgeha Tebesê di rewşeke xirab de ye. Tometa wî endametî di partiyên Kurdî yên dijberî Komara Îslamî de bû.

Seîd Şêrzad girtiyê Kurd ku li girtîgeha Recayîşehr ya li bajarê Kercê girtî ye, nekariye ji bo çareseriya tendirustî here dervey girtîgehê. Seîd Şêrzad beriya niha 40 rojan ketibû gireva birçîbûnê. Pişt re nûnerên serdozgeriya giştî ya bajarê Kercê soz dan ku ewê wî bişînin nexweşxaneyê.

Li girtîgeha Hemedanê biryara darvekirina welatiyekî Kurd xelkê bajarê Qurwe bi navê Hişmet Ebas Gerûsî hate piştrastkkrin ku pênc salan beriya niha bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber hatibû girtin.

Wehîd Nebîdaze girtiyê Kurd yê xelkê bajarê Selmasê piştî 9 salan nikare ji girtîgeha Zemcanê bi danîna kefaletê here serdana malbata xwe. Wehîd Nebîzade bi tometa endametî di partiyên Kurdî de bi 25 salan girtinê hatiye cezakirin.

Piştî nêzîkî mehekê, çarenivîsa 11 welatiyên Kurd bi navên Refîq Pijişkî xelkê Bane, Eta Ezîzî xelkê Bane, Resûl Tajanî xelkê Bane, Emîr Pêyxamî xelkê Şinoyê, Tahir Xurşîdî xelkê Şinoyê, Hesen Ezîziyan xelkê Kamyaranê, Rêbwar Mihemedî xelkê Bokanê, Dr. Mensûr Mihemedpûr xelkê Bokanê, Kemal





Andlos xelkê Bokanê, Mela Muhsin Berdezerd xelkê Bokanê û Sulhedîn Kawanî xelkê Bokanê nayê zanîn ku bi sedemên siyasî hatine girtin.

Li navçeya sînorî ya Selasa Bawecanî li parêzgeha Kirmaşanê kolberekî Kurd bi navê Cehangîr Ehmediyan yê 34 salî di encama teqeya rasterast ya hêzên sersînor de bi tundî birîndar bû û niha li nexweşxaneya Serpêla Zehaw di bin çavdêriya tendirustî de ye.


Li navçeya Çilçeme ya Mehabadê Sipaya Pasdaran rê neda civateke jîngeparêzî û çiyageriyê serdana hin şikeftan bike da ku endamên wê civatê, şevê li wêderê derbas bikin. Sipaya Pasdaran ji berpirsên wê civata sivîl re ragihandiye ku ji ber çalakiyên partiyên Kurdî, ew nikarin rê bidin endamên wê civatê derbasiya şevê li wir bikin.

Heya niha hukma darvekorina girtiyê Yarsanî bi navê Yûnis Aqayanê Elîbeglû nehatiye hiloşandin ku nêzîkî 13 salan beriya niha di temenê 22 salîyê de ligel 4 kesên din li gundê Wiştepe yê bajarê Miyanduawê hatin girtin û bi tometa şerê li dijî Xwedê bi darvekirinê hatibû mehkûmkirin. Sehend Elî Mihemedî, Bexş Elî Mihemedî û Ubeydula Qasimzade jî di dadgeha pêdaçûnê bi 13 salan zîndanê hatibûn mehkûmkirin.

Girtiyekî siyasî yê Kurd bi navê Mistefa Selîmî xelkê Seqizê ku ji sala 2003'an ve bi tometa endametî di partiyeke Kurdî de rastî cezaya darvekirinê hatiye, di girtîgehê de di rewşeke xirab de derbas dike.

# “Bargiraniya yeqîniyê, aloziya pirsê û dilbijokiya xeyalan” e.

FEWAZ HUSÊN






“Bargiraniya yeqîniyê, aloziya pirsê û dilbijokiya xeyalan” Roman. Weşanên “Dar Sou’al” 380 rûpel, çapa yekem, Beyrûd, Libnan, 2016.

Roman weke nameyeke e-mailî dest pê dike. Ew e-mail ji Hagobê Zaradaştyan re, ermeniyekî ku li Swêdê dijî, tê şandin. Kesê ku e-mailê dişîne Ha-L. Sinjariy (Heyder Loqmanê Sincarî) ye. Ew bavê keçeke bi navê Newrozê ye û gelek salan bi Hagob re li Sûriyê ji ber çalakiyên siyasî yên di nava partiya komunîst de di zindanê de maye. Ew di sala 1989an de di 27 saliya xwe de tê girtin û di 42 saliya xwe de, ango piştî 15 salan, tê berdan. Nêrîna wî li ser rewşa welêt pir reş, bêhna wî lê dernakeve û tu heviyên wî nemane. Jixwe sernivîsa e-mailê jî «Ez têm ku bifetisim» e. Eger ji Heyder bihata, dê xwe bikuşta lê hemû bêhêviyên xwe bi xwe re weke barekî giran digerîne. Dostbûna wî û Hagob li Libnanê di sala 1982an de dest pê dike û herdu dost paşê di kovar û rojnameyan de jî dinivîsin.

Beriya ku xwendevan pêrgî Hagob bê, ew dîroka malbata wî jî bi saya vê e-mailê dinase. Navê Zaradaştyan li malbata Hagob bûye ji ber ku di fermana Ermenan de, bavê Hagob bi saya malbateke êzdî û zaradaştî ji mirinê difilite. Malbata êzdî paşê alîkariya wî dike ku ew li merivên xwe yên li her çar aliyên dinyayê terqiyayî bigere. Ew şopa wan li Helebê, Libnanê, Qahîreyê û li Parîsê jî peyda dike, lê piştî qetlîamjenosîdê, ew li Qamişloyê ji ber temenê xwe yê dirêj dimire û tê binaxkirin.

Eger beşê Yekem li Sûriyê, di sala 2007an de dest pê dike, beşê duyem, ango bi sernivîsa «Tirên» Welat, Oso bi xwendevanan dide nasîn. Ew Kurd e, li Belcîkayê dijî, penaber e û li hêviya tirênê ye da ku here bajarê Ostendê ku li kêleka deryayê. Li hêviya tirênê, tirêna zaroktiya wî tê bîra wî çawan ew di navbera Tirkî û Sûriyê de, serxet û binxetê de, dibû sînor. Ew dîroka kalikê wî yê qaçaxçî jî tîne bîra wî. Welatê bê welat, nivîskar e, helbestvan e, temenê wî 35 salî ye û ev yek vebêjer û nivîskarê romanê, Hoşeng Osê, bi xurtî tîne bîra xwendevanan. Welat li Belcîkayê dijî û li hêviya tirênê pêrgî jineke belcîkî 77 salî tê. Katrîn de Winter jî bi rastî hemû dîroka Ewropayê bigewde dike. Jin bi Erebî dizane û pênc salan, ji 2002an ta 2007an, li Sûriyê maye û heta bajarê Qamişloyê jî çûye –nivîskar behsa Dirbêsiyê nake. Ew ji zimanan, û ji mêran jî, weke ji xirecira tevegerên cihanê, hez dike. Ew û Welat bi inglîziyeke şikestî û xwaro-maro diaxivin lê paşê zimanê wan dibe yê Erebî. Welat jî ne ji mêj ve li Ewropayê ye, ew ji welatê xwe di nîvê sala 2009an de ji ber istixbaratên Sûriyê xwe daye alî û veşartiy, paşê direve Tirkiyê û ji wir tê Belcîka û li «Petit Château», ango «Koşka piçûk», ku navenda penaberan li Brukselê ye, dijî. Lê dixwaze ji xirecira vî paytextî û tevahiya cihanê dûr bikeve û li kêleka deryayê, li cihekî bêdeng û aram, perçeyên xwe yên belawela bide hev û romana xwe binivîse.



Di hemû romanê de, Welat û Katrîn dê gelek caran hev bibînin û bi saya hevûdudîtinên wan, xwendevan dê beşên ji dîroka Ereban, Cihûyan, Rojhilata Navîn û heta ya cihanê jî nas bike. Tiştek tune ku ev her du leheng behsa wî nakin. Katrîn bixwe dîroka Belcîkayê, cihanê û tevliheviya danûstandinên di navbera jin û mêran de bigewde dike. Ew sê salî bû, gava şerê Cihanê yê Duyem dest pê dike û heta ku dibe 77 salî, Xwedê dizane wê çiqas mirov naskirine û li çiqas welatan geriyaye (Belcîka, Spaniya, Fas, Israil, Siwîsre, Amerîka, Tunis, Sûriye, Iraq, Yemen, Misir, Tirkiye...hwd). Ew hemû dinyayê û siyasetên wê, bi taybetî yên welatên Ereban li bin guhên hev dixîne, erê, ev jina 77 salî ku hîna hezkirina jînê û têkoşînê di dilê wê de pêl didin, lewma dibe pişgira şoreşa lidij rêjîma Sûrî.

Di beşê sêyem, ango «Prometêos mir» de, kesê ku e-maila Hagob girtiye, ango “Hayder Loqman Sincarî” bersiva wî dide û bi dirêjahî jê re behsa destpêka Bihara Erebî dike bê ka çawan li bajarekî piçûk ji Tûnisê, M. Bouazîzî agir berdide canê xwe û wisa jî ew rê li pêşiya şoreşa belengazên cihanê, bi taybetî hustûxwarên welatên Ereban, vedike. Ew çar rûpelan ji helbesta helbestvanê navdar yê Ereb Abû Al-Qasim Alşabî jê re dişîne, çûnku ew bi hêvî ye ku agirê şoreşa Tûnisê dê li her derê belav bibe û guhertinên mezin bi xwe re bîne û pût û peykerên dîktator û zordaran birûxîne.

Di beşê «berbanga êvara senemanpût û peykeran» de, Ha-L.Sinjariy besiva Hagob dide û jê re behs dike ka çawan senemên dîktatoran dê bikevin. Dem dema serîhildanan e, lê e-mail bêhtir cih didin jiyana Welat.

Bi taybetî, beşê «Meydana La Boursê» ku li nava Brûkselê ye û yek ji cihên xwepêşandanan e, dibe dil û nava romanê. Di vê beşê de, roman berfirehtir dibe, Katrîn helbet hergav li wê navê ye, lê kesên din jî derbasî naverokê dibin, an roman dikeve nava serpêhatiyên wan ên tevlihev û têkel: Derxamê felestînî, Serdarê Amûdî jî, çi li vê derê be, çi berê, Roland Bounioubayê Kongolî, Klara Rozinştayn a Almanî û Gorgînio Anderyotî yê Îtalyanî tên xwiyakirin. Di axiftinên di navbera Welat û Katrîn de, behsa gelek tişan tê kirin: PKK, Kurdistan, Mişel Temo û kuştina wî ya li Qamişloyê û çawan ew bûyer helwesta Welat Oso ji vê partiyê diguherîne û dihêle ku ew paşê bi tundî rexneyan lê bigire.

Perçeyekî mezin ji vê beşê li ser kirîn û firotina perçeyên nav û hinavên mirovan e ka çawan ew li Ewropayê dikevin canê nesax û nexweşên ewropayî. Ji ber ku Ha. L. Sincarî di zindanê de û di bin azar û îşkencê de tê kuştin û organên gewdeyê wî tên rakirin û bi rêya MAFYA bazirganiya organên mirovan, digihên Belcîkayê û di gewdeyên Roland û Klara û Gorgînio tên çandin. Organên Heyder guherînan di hest û henas û xeyalên van her sê kesan de çêdikin, lê ew nizanin bê sedema wan guhertinên di kesayetiyên wan de ji ber çi ye?!. Piştî ku serwext dibin ku her sê organ “tora çav, gurçik û kezeb” ên kesekî ne, êdî dixwazin nas bikin bê ev kesê ku giyanê wî di gewdên wan de dilive, kî ye. Di vê beşê de, liv û hûnandina polîsî dest pê dike û di dawiyê de, têdigihêjin ku ev organ û ev giyan û hest û xeyal yên Heyder Loqmanê Sincarî ne.

Di beşê «Rêwîtiya pirsyaran û niyaza xeyalan» ji romanê de Hagob behsa biranînên hevalê xwe yê zindanê Hayder Sincarî dike ku navê wî bi dirêjahî ev e; Heyderê Loqmanê Ezdeşêrê Heyderê Masûmê Eliyê Sincarî ye, û behsa pirsên xwe ku wî ji kalê xwe kiribûn dike û bersivên wan jî dide. Ango Heyder bi zimanê kalikê xwe diaxive. Ew dibe mîna Nîtşeyê Almanî di «Wisa Zaradaşt dipeyivî», an jî Xelîl Cibran di «Pêxember» de. Ew wisa bersiva çend pirsên serekîn di warê nasîn û venasîna cihanê de dide. Wek nimûne: jiyan çi ye? mirin? hebûn? nebûn û fena? dem? bawerî û îman? hiş û aqil? guneh? evîn? dojeh û bihişt?...hwd.

Di dawiya romanê de, Hagobê ermenî ku hatiye Brukselê dê piştî çar rojan vegere Stockholma xwe. Lê kemyonek “dîn” li otomobîla wî û ya sê kesên din “Klara, Roland û Gorgînio” dikeve û ew ji balefira xwe bêpar dimîne û her çar têne kuştin. Roman jî wisa diqede.

Mirov dikare bêje ku “Bargiraniya yeqîniyê” romaneke bi giştî li ser dîtin û baweriyên nivîskarê xwe ye. Ew nêrînên wî yên li ser rewşa şoreşên Erebî û doza Kurd û Kurdistanê û dezgehên birêvebirina cihanê pêşkêş dike. Ew helwesta wî ya li hember pirsa azadî û meqeresiyê, rindî û kirêtiyê bi xurtî dide xwiyakirin û bi zimanekî pir hêsan hatiye nivîsandin. Mirov dikare hemû 380ê rûpelên vê romanê weke taseke av bi ser gewriyeke tîh de dake û bêje ofiyaaaan, çi xweş bû law!.



FIRAT CEWERÎ

## Rojava

Li herêma ku zaroktî û xortaniya min lê buhuriye, yanî li herêma Mêrdînê, kesî ji kurdên binxetê re nedigot kurdên Rojava, an jî kurdên Sûriyê. Wan digot; kurdên binxetê. Ji ber ku di navbera kurdên Tirkiyê û Sûriyê de bi tenê xetek hatiye kişandin û wê xetê bendek xistiye navbera kurdên vî alî û wî aliyê welêt. Ji kurdên serê xetê, yanî ji kurdên Tirkiyê re dibêjin kurdên serxetê û ji ên binya xetê, yanî ji kurdên Sûriyê re jî dibêjin kurdên binxetê. Ev xeta ha, herçiqas ji bo destnîşankirina sînorên du welatan be jî, lê di eslê xwe de xencerek e ku dirêjî dilên kurdên serxet û binxetê bûye.

Kurdên herdu aliyan ku bi giştî merivên hev in, ji hev hatine qutkirin. Bajarek bûye du şeq, bûye du bajar. Gundek bûye du gund, zeviyek bûye du zevî; perçeyek li vî alî maye û perçeyek li aliyê din.

Ev sînorê ku bi mayinan hatiye raxistin, li hemberî kurdên herdu aliyan xefikeke jiyanê ye. Lê sînorê bi mayin jî nikarîbûye herdu aliyan ji hev veqetînin. Kurdên herdu aliyan xwe ji vî alî û ji wî aliyî de li sînorên bi mayin xistine û xwe gihandine hev. Bi taybetî jî serxetiyên ku belayek bihata serî, riya rizgariya xwe di daketina binya xetê de didîtin. Du hezkirên ku ji hev hez bikirana û ji ber astengiyên eşîrî û malbatî ku zewaca wan bêîmkan bûya, li benda şeveke reş radiwestiyan, bi destên hev digirtin, xwe li sînor dixistin û derbasî binxetê dibûn. Yekî mêrek bikuşta, an jî xwe ji mêrkujekî biparasta, derbasî binxetê dibû. Yekî siyasî bûya, nikarîbûya li serxetê bisitiriya, derbasî binxetê dibû û xwe diavêt bextê birayên xwe ên binxetê.

Binxet, an jî erda Sûriyê, hertim ji kurdan re mazûbantî kiriye. Yanî ne bi tenê erda kurdan, kurd li seranserî Sûriyê sitirîne. Ji bilî gora serdarê kurd Selaheddînê Eyyubî ya li Şamê, bi taybetî jî piştî avakirina komara Tirkiyê û zêdebûna zilma li ser kurdan, arîstokrat û rewşenbîrên kurdan berê xwe dane Sûriyê. Neviyê Mîr Bedir-Xan, Celadet Alî Bedir-Xan, piştî avakirina komara Tirkiyê nikarîbû ji Almanyaya ku xwendina xwe lê didomand vegeriya warê xwe, Stenbolê, piştî ku riya xwe bi Misrê dixe, ji wir jî derbasî Sûriyê dibe. Birayê wî Kamiran Bedir-Xan jî dide dû şopa wî û berê xwe dide Sûriyê.

Piştî têkçûna serîhildana Şêx Seîd malbata Haco Axayê hevêrkî ji herêma Torê derbasî binxetê bûn. Dîsa di wan deman de doktorê ku hem li serxetê, hem jî li binxetê ji ber xizmeta xwe navdar bûbû û heta dengbêjên herêmê jî avêtibûn ser, Doktor Nafiz, ji Madena Xarpêtê digel birayê xwe ê biçûk Nûredîn Zaza derbasî binxetê bûbûn. Osman Sebrî ji Semsûrê berê xwe dabû binxetê. Memduh Selîm Begê wanî, ê ku em wî ji kovara Jînê nas dikin û karakterekî sereke ê romana Mehmed Uzun, Siya Evînê ye, binxet bûbû. Îhsan Nûrî Paşa çûbû binxetê. Nûrî Dersîmî bazdabû binxetê. Ji Dêrika Çiyayê Mazî Îlyas Efendî (Êlaso), Qedrî Can û Reşîdê Kurd riya azadiya xwe di binxetê de dîtibûn. Şaîrê me ê navdar Cegerxwîn ji herêma Mêrdînê dageriyabû binxetê. Kovarên ku di edebiyata kurdî de stûnên qewîn in; Hawar û Ronahî deyndarên kurdên binxetê ne.

Ji mala Cemîl Paşa; Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa mecbûr mabûn ku mal û milkên xwe bihêlin û ji xezeba kemalîstan xwe bispêrin Sûriyê. Yek ji tevgerên kurdan ên herî girîng Xoybûn li binxetê rehên xwe berdabû.

Herweha xortên kurdan ên ku ji ber xezeba cûntaya Kenan Evren bazdabûn, xwe avêtibûn bextê kurdên binxetê. Riya piraniya, heta mirov dikare bi hêsanî bibêje ku, riya hemû serokên kurdan bi binxetê ketiye, li wir bêhna xwe vedane, demekê karên xwe li wir dewam kirine û paşê li dinyayê belav bûne.

Bi kurtî, kurdên serxetê, hertim bi êş û elemên xwe, bi derd û kulên xwe, bêwext li deriyên birayên xwe ên binxetê dane û li wan bûne mêvan.

Kurdên binxetê, bi hesreta warê bav û kalan, bi hezkirineke kûr deriyên xwe heta dawiyê ji kurdên serxetê re vekirine; ji ber wan serên xwe xistine belayê; pariyê nanê xwe bi wan re parve kirine û ew bi rojan, bi meh û salan xwedî kirine. Ji bilî wê, bi sedan û bi hezaran kurdên binxetê hem di ber kurdên Başûr de xwe feda kirine, hem jî xwîna xwe di ber kurdên serxetê de rijandine.

Îro, dor dora kurdên binxetê ye. Kurdên binxetê azadî heq kirine…

# Kurdistan û YE dahatûya Mûsilê gotûbêj dikin





DERYA KILIÇ

**Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî destnîşan dikir, divê bernameyek bê amadekirin ku piştî ji DAIŞê hat rizgarkirin dê Mûsil çawa be. Barzanî di korbendên navnetewî û di ziyaretên dîplomatîk de ev yek gelek caran anî ziman. Di dema dawîlêanîna operasyona Mûsilê, xebatên referandûmê û di mijara Mûsilê de, di navbera dewletên navnetewî û Hikûmeta Kurdistanê de danûstandin tên kirin.**

WEZÎRÊ Kar û Barên Hundir ê Kurdistanê Kerîm Şingalî û heyeteke ligel wî 6ê Hezîranê li ser vexwandinê, beşdarî konferansa 'Piştî DAIŞê dahatûya Mûsilê' ya Parlementoya Ewropa bûn. Di konferansê de ligel Wezîrên Derve yên Fransa, Almanya, Îspanya û Rawijkarê Taybet ê Sekreterê Giştî yê NY Adem Ding û Partiya Kirîstiyanan a Demokrat û Partiya Civakî ya Demokrat cih girtin. Di konferansê de bi giştî 'Dahatûya Mûsilê' hat axaftin. Maf û rewşa kêmnetewan jî mijarên konferansê bûn. Di vê çarçoveyê de daxwaza bila komkûjiya li dijî Êzidiyan  weke 'Jenosîd' bê nasîn, parastina Kirîstiyanan û Êzidiyan û avakirina herêmên wan hat xwestin. Heyeta Kurdistanê têkoşîna li dijî DAIŞê kiriye aktorekî sereke. Biryara pêkanîna referandûma serxwebûnê ku dê di 25ê îlonê de bê kirin jî mijara sereke bû. Endamê Komîsyona Bilind yê Danasîna jenosîda DAIŞê yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Şêwirmendê Mafê Mirovan Kirmanc Osman dê beşdarî civîna Dîwana Edaletê ya Lahey bibin.

**Piştî DAIŞê dê Mûsil çawa bibe?**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî destnîşan dikir ku divê bernameyek bê amadekirin ku piştî ji DAIŞê hat rizgarkirin dê Mûsil çawa be. Barzanî di korbendên navnetewî û di ziyaretên dîplomatîk de ev yek gelek caran anî ziman. Di dema dawîlêanîna operasyona Mûsilê, xebatên referandûmê û  di mijara Mûsilê de, di navbera dewletên navnetewî û Hikûmeta Kurdistanê de danûstandin tên kirin. Di vê mijarê de gavên berbiçav tên avêtin. Dê dewama civîna Brukselê bê.

**"Ya ku anîn serê Êzidiyan divê weke Jenosîdê bê nasîn"**

Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li YE Dellawe Ajgeyî jî beşdarî konferansa Parlementoya Ewropa bû û di derheqê konferansê de ji Heftenameya Basê re axivî. Ajgeyî amaje pê dike ku mijara konferansê Mûsil, piştî DAIŞê dahatûya Musilê û mafên kêmneteweyan bûn. Ajgeyî diyar dike ku: "Di konferansê de bi piranî li ser mijara mafên kêmneteweyan hat axaftin. Di vê çarçoveyê de mafên Êzidiyan, Kirîstiyanan û kêmneteweyên din hat nîqaşkirin. Biryarên Herêma Kurdistanê di konferansê de derketin pêş." Ajgeyî, balê dikşîne ser daxwaz û mafên kêmnetewan û wiha dibêje. Kêmnetewe çi dixwazin û çi dikin Herêma Kurdistanê piştgirê daxwaz û bidestxistinên wan e.

Dellawer Ajgeyî daxwaza pênasîna jenosîdê ji bo tiştên hatine serê Êzidiyan kir û wiha pê de çû: " Em ji dewletên navnetewî dixwazin ku di mijara Êzidiyan de hessas bin. Herwiha em daxwaz dikin ku zilma DAIŞê ya li ser Êzidiyan weke 'Jenosîdê' bê naskirin.Me ji Dozgeriya Navnetewî ya Cezayê ( Hollanda- Lahey ), NY , welatên YEyê, Dozgeriya Mafên Mirovan a Ewropa xwest ku weke 'Jenosîdê' bê nasîn. Her wiha me daxwaza me ya ji bo alîkariya jinên Êzidî û ew kesên ji destên DAIŞê filîtîne bikin anî zimên. Me anî ziman ku ji bo şêniyên Nînova û Şingalê vegerin ser warên xwe û ji bo avakirina cih û warên wan NY alîkarî ji Kurdistanê re bike. Her wiha me ji wan re got ku divê Heşda Şebî bibe hêzeke ji artêşa Iraqê ne weke hêzeke serbixwe tevbigere.

**"Divê NY û YE berpirsyariya xwe bicih bînin"**

Ajgeyî di derheqê hevdîtinên mijara penaberan ligel NY û YEyê de agahiyan dide û diyar dike: "Me destnîşan kir ku NY û YE zaftir alîkarî bide Kurdistanê.  Niha li Kurdistan ji milyonek û 300 hezarî zaftir penaber hene û ji ber operasyona Mûsilê hejmara penaberên Ereb her diçe zêdetir dibe. Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi tenê nikare hew ji çend penaberan re bibe alîkar. Tevlî krîza darayî jî Herêma Kurdistanê çi ji dest hatiye kiriye û dê bike jî. Ji ber vê yekê jî divê NY û YE jî berpirsyariya xwe bicih bînin û alîkariya Hikûmeta Kurdistanê bikin. Herwiha gelê me jî ji ber alîkariya penaberan di rewşeke ne baş de ye. Divê alîkarî ji wan re jî bê kirin."

**"Dê konferansên di derheqê serxwebûna Kurdistanê de bên lidar xistin"**

Ajgeyî destnîşan dike ku mijara referandûma Kurdistanê bi fermî nehatiye nîqaşkirin û axaftinên derveyî konferansê ji me re bilêv dike: "Dê konferansên di derheqê referandûm û serxwebûna Kurdistanê de bên lidar xistin. Welatên YE, gel û partiyên wê piştgiriya  referandûmê dikin. Referandûm mafê herkesî ye û bikaranîna Kurdan a vî mafî rewa dibînin. Divê ev yek bi aşitî û bi rêya diyalogê bê kirin. Tu miletek nîne weke gelê Kurdistanê mafê referandûmê hebe. Divê rêz li ber vê daxwaza wan bê girtin û referandûm bi rêyeke aşitiyane pêk were. Ev daxûyanî gelekî girîng bû. YE dê rêzê li ber encama referandûmê bigire. Hemû cîhan jî dê biryara gel bibîne."





Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî destnîşan dikir ku divê bernameyek bê amadekirin ku piştî ji DAIŞê hat rizgarkirin dê Mûsil çawa be. Barzanî di korbendên navnetewî û di ziyaretên dîplomatîk de ev yek gelek caran anî ziman.

## "Hikûmeta Kurdistanê aktorekî mihûm tê dîtin"

Nerînên Herêma Kurdistanê di konferansê de derketin pêşçavan. Biryara Kurdistanê berbiçav bû, binê gotinên heyeta Kurdistanê dihat xêzkirin. Ajgeyî amaje pê dike ku: "Herêma Kurdistanê weke aktorekî sereke tê dîtin. Têkoşîna li dijî DAIŞê ev yek derxist holê. Di konferansê de ji nerînên NY û YE zaftir yên Kurdistanê dihatin pesend kirin. Hikûmeta Kurdistanê di mijarên Mûsil, penaberan û ewlehiyê de xwedî erk tê qebûl kirin. Welatên YEyê gotinên heyeta Kurdistanê bi baldarî guhdar dikin."

Ajgeyî amaje pê dike ku: "Mûsila pêşiya DAIŞê û ya niha ne weke hev e. Divê dahatûya Mûsilê jî baş bê gotubêjkirin."




## "Gel çi biryar bide dê Hikûmeta Kurdistanê piştgiriya wan bike"

Ajgeyî nerîna Herêma Kurdistanê di derbarê Mûsilê de parve dike û wiha diaxive: "Me weke Hikûmeta Kurdistanê pêşniyar kir ku Mûsil divê dabeş bibe û ji aliyê çend wîlayetan ve birêve biçe. Mînak, dabeşî herêmên Êzidî, Kirîstiyan û Sûneyan bibe. Lê belê rewşeke wisa heye: Nerînên wan di vê mijarê de ne zelal in. Herêma Kurdistanê tu tiştî li ser wan ferz nake. Ji ber vê yekê jî Herêma Kurdistanê rêzê li ber biryara gelê Mûsilê digire û dibêje divê ew biryara xwe bidin. Gel çi biryar bide jî dê Kurdistan piştgiriya wan bike. Dixwazin girêdayî Kurdistanê bibin, dixwazin xweseriyê hilbijêrin hîç ferq nake em ê piştgirî bidin wan. Herwiha hewce nake Bexda wan biparêze divê hêza polîsan a her kesekî hebe. Di vê mijarê de xebat tên kirin. Pêşmerge di vê mijarê de perwerde dide wan."



JAN DOST

## Referandûm û Dijminên Wê

Ev demek dirêj e, bi salan e ku behsa prosesa referandûmê li Kurdistanê dibe. Medyaya erebî, û her weha medyaya dewletên dormadarê Herêma Kurdistanê jî bi vê meselê re mijûl in. Helbet ew dewlet, nivîskarên wan dewletan û heta rêjeyek mezin ji miletên wan dewletan ku dibin bandora siyaseta hikûmetên xwe de ne, li dijî referandûmê ne. Li dijî serxwebûna Kurdistanê ne. Ew vê meselê ji welatên xwe re wek „mesela namûsê“ dihesibînin, ew nav lê dikin cudaxwazî. Cudaxwazî jî yanî Kurdistan wek erd û welat nîne, lê kurdên „ji rê derketî“ dixwazin perçeyek axa welêt ji welêt veqetînin.  Yanî ew vê yekê kufriyeke siyasî dihesibînin û bi hemû hêza xwe li dijî wê ne. Jixwe di dirêjiya dîrokê de li hember vê daxwazê rawestiyane û bi xwînrêjî û agir û tundrewiyê ev daxwaz asteng kirine û ne hiştine miletê kurd bêhna azadiyê bikin.

Heta vê derê mirov dikare fêm bike. „Dijmin“ ji xwe dê li dijî te û daxwazên te be. De bi hemî cûreyî hewldanan bike ku te di nav „sînorên malê“ de bihêle. Dê tu carî hefsarê qedera te ji dest xwe bernede.

Lê meseleya ku nayê fêm kirin û nayê qebûl kirin jî, kula li ser kulan û jana herî giran ew e ku, hinek ji „xwediyê malê“ bi xwe rabûne ser tapanan û qirik li xwe qetandine û bi behaneya ku referandûm biryara partiyekêye li dijî wê ne. Ew dibêjin ku ev çi biryara ku partiyek radigihîne, ev çi prosesek girîng ku qerara wê di destê partiyekê yan kesekî tenê de ye!  Ne bes weha, di medyaya civakî de êdî dest bi kampanyayên eşkere eşkere li dijî referandûmê ne  dikin. Ez bi van kesan re ketim niqaşan û me „kumik li hev sor kirin“ lê qet ji ser ya xwe danakevin û her dibêjin „êzingê min“. Ew kes, piranî alîgirên hin partiyên siyasî ne ku  nakokiyên wan li gel partiyek din î siyasî heye û ji kerbê partiya din û serokê partiya din amade ne bibin asteng di ber serxwebûn û azadiya xak û  gelê xwe de. Ji xwe wan dest bi kampanya yan jî kiriye û hashtagan davêjin meydana twitter û facebookan. Bi wan gelekî zehmet e ku „reqîbê“ wan î siyasî vê gava dîrokî davêje, vê biryara ku dê serencama miletekî bi sedan sal ji dewletê mehrûm maye eşkereke.

Bi baweriya min ev awayek ji awayên birakujiyê ye, mirov dikare navê wê bike birakuji ya veşartî. Lê mixabin ev cûre birakujî jî dikare rojekê ji rojan ji bin ariyê derkeve, serîhilde û bi pence û diran bibe. Tirs ew e ku ev kesên wisa bi tundî dijmintiya referandûmê dikin, bibin destikê neyêr û heta ji wan bê, bi çekan be jî, nehêlin miletê kurd serbixwe di bin vê tave roja azadiyê de bijî. Kesên weha ku bindestiyê layiqî xwe dibînin, dikarin bindest bijîn, lê nikarin nig bidin ber viyan û iradeya miletekî ku ji avê bêtir tiyê azadiyêye.

Di destpêka xortaniya xwe de heta demek dirêj ez alîgirê PKK bûm. Magnêtab Serxwebûnê ku slogana herî pîroz û mezin î vê tevegerê bû dilê min wek hesinekî ber bi xwe vekişan dibû. Ez xwîn germ bûm, amade bûm ji bo wê sloganê herim şer bikim jî. Xelkên ku li dijî wê bûn û digotin niha ne wexta „serxwebûn merxwebûnan“ e dibûn armanca êrîşên me. Me niqaşên mezin li dar dixistin û me digot: Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştek nîn e. Lê gava hêdî hêdî ew partî dûrî vê armancê ket, ez û gelekên din yên wek min jê sarbûn û qetiyan. Bi hezaran keç û xortên kurda xwîna xwe ji bo wê armanca pîroz rijandine. Ku ne ew armanca hêzek siyasî be, ji xwe xwînrêjî gunehkariye…

Tama du hezar salî:

# Hingivê Kurdistanê




Hingivê ku du hezar sal e li çiyayên Kurdistanê tê hilbirandin, ji bo gelek deverên cîhanê tê şandin. Hilberînerên hingiv yên herêma Serhedê hingivê xwe îxracî gelek bajar û dewletan dike û bi vî awayî debara xwe dike.



DARA PORXELEK

**FÎZÎKNASÊ** navdar Albert Einstein ji bo mozê dibêje: "Eger moz ji ser rûyê erdê winda bibin însan tenê 4 salan dikarin bijîn. Eger moz nebin ber nayê girtin, ajal, nebat û mirov nabin." Moz ji debara mirovan re weke amûreke tîcarî ye jî.

Kurdistan gencîneya hingivê tê zanîn. Weke ku tehma devê mirovan xweş dike berîka hilberîneran jî germ dike. Îran bi saya hilberînera hingivê çiyayên Rojhilatê Kurdistanê di rêjeya welatên hilberînerên hingiv de di rêzên pêş de ye.

**Hilberîna hingiv ji Hezîranê heta Îlonê didome**

Çiyayên Serheda Bakurê Kurdistanê cihê nan e ji bo Kurdan. Li çiyayên Serhedê bi 10 hezaran cûre nebat hene û ji van nebatan jî bi awayekî sirûştî hingiv tê hilberandin.

Hilberînerê hingiv, Fehîm Atmacayê ji Agirî ye, pêvajoya hingivê Serhedê ji me re vedibêje: "Li gor rewşa seqayê di Hezîranê de dest pê dike heta Îlonê didome. Dema moz hingivê xwe nû berhev dikin, bi av û herikbar e. Nêzî payîzê moz avzêyekê hildiberînin û hingiv hişk dibe. Moz perdeyeke bi navê sir dikşînin ser hingiv. Moz vî perdeyê ji bo ku qûtê xwe yê zivistanê mihefeze bikin dikşînin ser hingiv. Em jî bi awayekî vî hingivî ji mozan didizin. Em radihijin hingiv û di avahiyên hilberînê de paket dikin. Bihayê hingiv li gor qeşîta hingiv diguhere. Dermankirina dar û zeviyan zirarê dide moz û çîçekan, ev yek jî qelîteya hingiv dadixîne."

**Di cîhanê de hingivê herî baş...**

Erdnîgariya Bedlîsê ji sedî 70ê ji çiyayên 2 hezar metreyî bilindtir pêk tê. Ji sedî 80ê jî çêrgeh û zozan e. Bedlîs xwedî erdnîgariyeke bilind e. Ava wê paqij û sirûştî ye. Sanayî kêm e. Ji ber ku dar û zevî nayên dermankirin moz û hingivê Bedlîsê xwezayî û bi qelîte ye.

Serokê Yekîtiya Hilberînerên Hingivê Bedlîsê Medenî Evcil dibêje, di dîroka xwedîkirina mozan de Bedlîs li cîhanê di cihekî girîng de ye. Evcil dibêje: "Di dema Osmaniyan de jî hingivê Bedlîsê pir popîler bû. Hingiv ji bo Stenbol, Tehran, Helebê û Azerbeycanê ji Bedlîsê dihat xwestin. Li gor lêkolînan, derket holê ku hingivê Bedlîsê di cîhanê de yê herî bi qelîte ye. Dîroka hingivê Bedlîsê tescîla qelîteya wê ye."



Evcil, taybetmendî û berhevkirina hingivê Bedlîsê ji Heftenameya Basê re dinirxîne û wiha pê de diçe: "Li Gebzeyê di lokîlênênTUBITAKê de derket holê ku prolîna hingivê Bedlîsê pir bilind e. Lê belê li Tirkiyeyê tu hingiv nehatiye tescîlkirin. Hingivê Anzarê pir meşhûr e lê wê jî tescîl nestandiye. Sedema sereke ya vê jî neyîna zaningehan e. Tekane zanîngeha ku xwedî van şert û mercan e, Zaningeha Hacettepe ye. Divê berhevkirina hingiv ji kîjan kulîlkê hatiye kirin bê tespît kirin, tekane zaningeh jî Hacettepe ye lê mixabin wê jî heta niha tu hingiv akredîte nekiriye. Ji ber vê yekê jî heta niha tu hingiv tecsîla herêmî nestandiye."

**Nîvê hingivê Îranê li Rojhilatê Kurdistanê tê hilberandin.**

Di cîhanê de Îran di nav rêjeya hilberînerên hingiv de di rêzên pêş de ye. Hingivê Îranê jî ji sedî 42 li Rojhilatê Kurdistanê tê berhevkirin. Bi saya xwezaya xwe, av û deviyên xwe, çiya û geliyên xwe hingivê Rojhilata Kurdistanê di rêjeya herî baş yê herêmê de ye. Hingivê Rojhilat îxracî gelek bajarên Îranê û dewletên cîhanê dibe. Li gor Îstatîstîkên Cotkariya Îranê, tenê hingivê li Urmiyeyê tê berhevkirin ji sedî 30 hingivê Îranê ye. Li gor vê îstatîstîkê jî Urmiye salane 23 hezar ton hingiv hildiberîne û ev yek Urmiyeyê di rêjeya berhevkirina hingiv de dixe rêza yekem. Kirmanşaha bajarê Rojhilata Kurdistanê jî piştî Urmiyeyê bajarê herî zêde hingiv hildiberîne ye. Li Kirmanşahê salane 3 hezar û 400 ton hingiv tê hilberandin. Lorîstan 1 hezar 600 ton, Sîne 1 hezar û 200 ton, Îlam 800 ton hingiv hildiberînin. Îran bi saya hilberîna hingivê Rojhilatê Kurdistanê di sala 2016an de 71 hezar ton hingiv hilberand û kete nav rêjeya herî bilind a hilberînên hingiv ê cîhanê. 30 hezar tonê vê hingivê ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Ev jî zêdeyî ji sedî 42 hingivê Îranê ye.

### Rojhilatê Kurdistanê di hilberandina hingiv de dikare bikeve nav rêzên pêş

Tenê li Urmiye û Kirmanşahê ji 21ê Adara 2016an heta 21ê Adara 2017an de bi bihayê 7 milyon dolar hingiv hatiye îxraç kirin. 6 Milyon dolar yê Urmiyeyê ye. Hingivê Rojhilata Kurdistanê îxracî Tirkiye, Iraq, Azerbaycan, Kuweyt, Emareta Ereban, Çîn, Bahreyn, dewletên Asyaya dûr û gelek dewletên Ereban dibe. Li Rojhilata Kurdistanê 17 hezar kes di hilberandina hingivê de dixebitin. Li Urmiyeyê 6 hezar, Sînê 4 hezar kes, Kirmanşahê 3 hezar kes, Lorîstanê 2 hezar kes û li Îlamê jî hezar kes di hilberandina hingiv de dixebite. Ligel vê jî di pakêtkirin, belavkirin û firotinê de jî gelek kes dixebitin û debara xwe pê dikin.

Li gor hilberînerên hingiv, eger piştgirî bo hilberandina hingivê Rojhilatê Kurdistanê bê kirin dê di rêjeya cîhanê de bikeve nava rêzên pêş. Îspanyaya di rêzê de yekem e sala din tenê 7 hezar ton hingiv hilberandiye. Her wiha Çîn, DYA, Argantîn. Tirkiye û Ukrayna dewletên herî zaf hingiv hildiberînin.

Li gor hilberînerên hingêv yên Rojhilatê Kurdistanê, eger piştgirî bê dayîn dê Îran di rêjeya welatên hilberînerên hingiv de bibe sereke. Di vê rêjeyê de Îspanya yekemîn welate ku salane 7 hezar ton hingiv hildiberîne. Rojhilatê Kurdistanê jî sala çûyî bi 7 milyar dolarî hingiv hilberand.

### Medeni Evcil: Hingivê 2000 salî yê Bedlîsê

"Hingivê Bedlîsê ev du hezar sal e tê berhevkirin, tê xwarin û tê firotin. Em di Seyahatnameya Ewliya Çelebî û di nivîsên Nivîskar, wêjenas û seyyahê Îranî Nasir-i Xusrev de rastî hingivê Bedlîsê tên. Seyyahan di bîreweriyên xwe de nivîsandine ku di wê demê de li Bedlîsê ticcarên xwedî 300-400 tulûm hingiv hene."



### Fehim Atmaca: "Hingivê herî baş ji kulîlka gewende çê dibe"

"Li Serhedê di bihar û payîzê de gelek cûreyên kulîlkan digihîjin. Ji van kulîlkan jî ya ku hingivê wê herî xweş Gewende û Strînêdeva ye. Ev kulîlk li zinarên Serhedê şîn dibin. Moz li ser van kulîlkan hingiv berhev dikin em jî vî hingivî didin hev û mihefeze dikin. Taybetmendiya hingivê Serhedê sirûştîbûna wê ye. Ez hingivê sirûştî dişibînim zêrê di kana de tê gerandin. Dîtina zêr di kana de çiqas zehmet be berhevkirina hingiv jî wisa zehmet e"



Hilberînerê Fistiqên Sêrtê Hekîm Bal:

# Fistiqên Sêrtê îxracî derveyî welat dibin



GÖNÜL GÜN




Li Sêrtê salane 20-22 hezar ton fistiq tê berhevkirin. Hilberîner û firoşkarê 15 salan Hekîm Bal, destnîşan dike ku Fistiqê Sêrtê bi piranî îxracî derveyî welat dibe lê têra xwe reklama wê nayê kirin. Ligel vê jî gelek malbat debara xwe bi fistiqê dikin.

Bajarê Sêrtê ligel hingiv, buryan, bettaniye bi fistiqê xwe jî tê nasîn. Li her deverên Sêrtê darên fistiqê şîn dibin. Di 7-8 heta 10 salan de darê fistiqê digihîjin.

Hekîm Bal ê ku ev 15 sal e di karê hilberandin û firotina Fistiqê Sêrtê de dixebite û xwedî baxê darên fistiqê ye ji Heftenameya Basê re axivî. Di Îlonê de berhevkirina fistiqê dest pê dike û 40-45 rojan didome û di çend qonaxan re derbas dibe. Fistiq li gor yên devê wan vekirî an jî girtî di qonaxên cuda re derbas dibin. Li gor vê yekê bihaya wan jî diguhere.

Hekîm Bal dibêje, li her deverê Sêrtê fistiq digihîje. Bi emekeke mezin di deh salan de darên fistiqê digihîjin. Mirov çiqas li darên fistiqê binêre hew çend jî dar baş dibin. Darê bê aşî 'Kizwan' an jî 'Bittim' in. Piştî aşîkirinê ev dar êdî dibin fistiq.

Bal cudahiya di navbera Fistiqê Dîlokê û yê Sêrtê de destnîşan dike ku: " Fistiqa Sêrtê bi giranbûna xwe mezintir e. Grama wê jî zêde ye. Tehma Fistiqa Sêrtê cuda ye. Vîtamînê wê zaftir e. Fistiqa Dîlokê di çêkirina beqleweyê de, ya Sêrtê jî di xwarinê de çêtir e.

**Fistiq di du qonaxan re derbas dibe**

Bal, destnîşan dike ku di gihandina Fistiqê Sêrtê de derman nayê bikaranîn û fistiq sirûştî ye. Bal, berhevkirina fistiqê ji guliyên daran û amadekirina wê ji bo xwarinê wiha bilêv dike: "Fistiqên ku hatin berhevkirin di maşîneyê de di du qonaxan re derbas dibe. Yekem, paqijkirina qalikên fistiqê ye. Merhala duyem jî ji hevcudakirina fistiqên pûç û yên tije ye. Piştî vê merhalê fistiq ji bo ziwa be tê raxistin. Devê fistiqa çiqas tavê bibîne hew çend ji ber xwe ve vedibe. Herî dawî jî li fabrîqayan xwê û toza îsotan lê dibe. Xwê û îsot fistiqê digirin. Her çiqas weke yê hişk neyê firotin jî fistiqê şîn jî tên firotin."

**Fistiqê Sêrtê piranî îxracî derveyî welêt dibe**

Bal destnîşan dike ku: "Li navenda Sêrtê Ereb, li gund û navçeyan jî Kurd bi fistiqê re mijûl in. Hilberandina fistiqê li Sêrtê ji bo gelek malbatan bûye cihê debarê. Malbatên ku hilberînerên fistiqê ne, serê malekî 300-400 kîlo fistiq berhev dikin. Yên zaftir berhev dikin jî hene."

Fistiqê devê wan vekirî kîloya wê bi 26-28 lîrayan tê firotin; Niha bihaya wan derketiye 35-40 lîrayî. Bal vê yekê bi xwarina zêde û hilberandina kêm ve girê dide.

Firtona derveyî welêt pirtir e. Li gelek welatan di amadekirina dermanan de tê bikaranîn. Dema îxracata derveyî welêt zêde dibe ji ber ku bi tomerî (giştî) tê firotin, bihayê fistiqê 5 lîra kêm dibe. Li gor Hîkmet Bal, derxistina medyayê ya fistiqê jî di firotina fistiqê de faktoreke girîng e.

### Ji hilberînerê Kurd ê fistiqê zanyariyên balkêş

"Fistiqê ji bo firotinê tê amadekirin dema hat ber destê me em destê xwe di nav kîsê fistiqê dixin. Nêzî 100 hebî dikeve destê me. Eger ji wî lepî 70-80 heb devê wan vekirî be û yên 20-30 heban girtî be em kîloya wê bi 24-25 Lîrayên Tirkiye distînin. Em jî weke firoşkaran ji bihaya fistiqê ku di bazarê de tê firotin 2-3 lîrayan kêm dikin û difiroşin.

Em fistiqê devê wê girtî dikin nav teşteke tije av. Eger nava fistiqê tije be dikeve binê teştê lê eger vala/pûç be derdikeve ser avê."





# Şima rê çawiş zî lazim nîyo?

**MIRAZ BABIJ**

Dinya de heta ewro bi seyan fikir, îdeolojî û dînî ceribneyayê û her fikir, îdeolojî û dîn endamanê xo ser ra ameyo şinasnayîş. Yanê nê meseleyan de herçiqas hetêko teorîk bibo zî, o yo ke hetê însanan de yeno vînayene heto pratîk o. Û însanê bînî, pratîkanê endamanê yew fikrî ser ra qîymet danê ê fikrî.

Eke ma bı şeklêno cîya behs bikerê, her endam seba ke merdimê bînî fikrê ey bişinasnê wezîfeyê prototîpê fikrê xo vîneno.

Ez wazena nê fikrê xo bi yew hîkaye tesdîq bikera.

Rojên –îhtîmalêko gird welatê ma de- yew axa û tayê karkerê nê axayî benê. Axa hende dîktator beno ke, karkarê ey ci dest ra qet razî nêbenê. Her roje bi desan saetî erdanê axayî ser ro xebitînê o zî bes nêkeno karanê şexsîyan yê axayî virazenê û seke no xebitîyayîş zî bes nêkero ser ro axa û merdimanê axayî ra tazîl vînenê. Eke axa finê zalim beno merdimê axayî des finî zulum kenê.

Nê karkeran ra yew fersendên vîneno û wextêko kilm dewe ra vejîyeno teber û şino bajaranê girdan de xebitêno. Şino ke çi bivîno, bajaranê girdan de axayî çîn ê, e tayê merdimîyê ke nameyê înan patron o estê la ê zî sey nê axayan zalimî nîyê. Karkerê bajarî zî sey dewijan zêde nêxebitênê, tayê heqê karkeran zî estê û karkerî heqê xo zî rehet-rehet patronan ra gênê. No merdim nê halî vîneno û wazeno ke şiro dewa xo û embazanê xo rê behsê nê halî bikero. Bikero ke embazê ey hinî binê zulmê axayî de nêenciqîyê. Xeylên wext bajar de maneno, fikranê karkeranê bajarî museno û vera xo dana dewa xo ke şiro embazanê xo sey qehremanêk bixelisno.

Wexto ke yeno dewa xo di-hîrê rojan mîyan de merdimê axayî yenê hetê ey û cira wazenê ke o bêro erdan de bixebitîyo. Winî zî beno. Qehremanê ma şino erdanê axayî ser û dest bi xebityayişî keno. Tabî hinî çîyêk sey verî nîyo. Qehremanê ma hinî tayê çîyan musayo û şoreşgeranê yew edaya ganî embazanê xo zî bikero hişyar. Wext beno ver a dihîre û karkerî seba ke perojîya xo burê yenê pêser. Qandê qehremanê ma yew fersend beno ke o fikranê xo bi embazanê xo par bikero. Werzeno pay û bi vengêno xo r bawer dest bi qalîkerdişî keno.

-Gelê embazan! Seke şima zî zanê ez wextêko derg teber a bîya. Wexto ke mi bajaranê girdan de wext vîyarna ez zaf çîyan musaya. Eke ma heme yew bê, ne axa ne zî yewna merdim eşkeno ma rê zulum bikero. Eke ma çin bê axa nêeşkeno xo rê tasêk awe zî bişimo. Aqilê xo bigîrê xo ser û yew bê. Biciwîyo yewîya kedkar û karkeran!

Nê nutiqî ser ra tayê karkerî ey het ra kewenê dûrî la xususen gencî hetê ey de manenê û wazenê ke no dewran bivurîyo. Hinî karkerê axayî sebir nêkenê ke wextê dihîre bêro û qehremanê ma înan rê çîyanê weşan vajo, çîyê ke pa omidê înan beno zêde.

No hal çend na rojî dewam keno û peynî şino goşanê axayî. Merdimê axayî pêşnîyaz kenê ke qehremanî bikişê û wa no seba ê bînan zî "îbret" bo. La fikrê axayî cîya yo. Merdimanê xo rê vano şirê ê merdimî bîyarê tîya. Qehremanê ma yeno hetê axayî.

Axa: Na saete ra tepîya merdimê min o xas tîyê. Mi ti kerdî çawişê erdanê xo. Nika şorî û rîyê mi sîya meke. Xo vîr ra meke hinî temsîlkarê mi tî yê. (Çawiş: merdimê ke xususen karanê zîretî de temsîlkarîya axayî kenê, ê merdiman rê çawiş vajêno. Çawişî karên nêkenê tena wezîfeyê teftîşî vînenê û yewmîyeyê înan zî karkeran ra vêşêr o.)

Qehremanê ma şino tepîya merdimê ke axayî het vanê axa to xo şaş kerdo? Ti se çîyêko winasî vanê? O merdim wazeno ke dewranê to dêmdîyo û dewranêko newe awan bo. Axa înan ra vano sebir bikerê û bipawê. Çîyo ke ez zana şima nêzanê.

Qehremanê ma hinî temsîlkarê axayî yo û sey temsîlkar şino erdan ser. Karkerê ke qehremanî vînenê bi meraq yenê ci het û persenê vanê se bî? To se kerd? Boka axayî to rê heqaret nêkerd.

Qehreman (Hinî Çawiş o): Gelê embazan! Ma axa xelet naskerdo. Axa hend merdimêko xirab nîyo. Hinî çawişê şima ez a. Şima ra rica kena ke şima hetê axayî de rîyê mi sîya nêkerê. Karê xo raşt virazê. Bero ke şima nanê ci wenê ey berî rê îxanet mekerê.

Badê nê qalîkerdişî moralê karkeran nêmaneno û heme reyna şinê serê karê xo. Tabî eke verê des saetî xebityayên, çawiş înan diwês saetî xebitneno. Eke verê roje hîrê finî mola deyayên çawiş molayêna înan keno kêmî. Winî beno ke karkerî zulmê axayî rê şukur kenê. Wina-wina panc-şeş mengî ravêrenê. Rojên merdimê axayî yenê erdan ser û veyndanê çawişî.

-Axa hinî nêwazeno ti temsîlkareya ey bikerê. Vano wa erdanê mi terk bikero.

-Keko ez heyran axayî çi qebehetê mi vînayo? Mi çi xeta kerda?

-Çîyo ke ma rê vajêyayo no yo. Nika teqez nê erdan terk bike!

Qehremanê ma bêçare erdan ra vejîyeno. Hinî sey verî kes bi qalîkerdişê ey zî bawer nêbeno ke na "neheqî" rê vengê xo vejo. Qehremanî rê desteqbîyayîş cayên karkerî pêro kêf kenê ke no merdim înan ser ra gêryeyo.

Gelo dima se beno?

Dima qehremanê ma veyşan-teyşan maneno û şino bazarê emeleyan (cayo ke karkerî xo rê kar gêrenê) û wazeno ke xo rê karên bivîno. Kam ke yeno seba xebitnayîşî gêrêno karkeran qehremanê ma şino înan ra perseno vano: gelo şima rê çawiş zî lazim o?

Hîkayeyê ma ra zî bellî beno ke ganî merdim terorî û pratîkê xo yew bikero û wina biciwîyo. Eke wina nêkero ne cuya ci ne zî fikrê ci qet qîymet vînenê. Ganî ma xo vîr ra nêkerê ke ariqê çareyî taltîfê axayan ra şîrinêr o. Bimanê weşîye de.



# Pers & Cewab: ŞADÊ AGON




Şadê Agon

**A kam a? :** Cinîyêka ciwan a, kirmanc a û xebatkarêka kirmanckî ya.

**Çirê a? :** Şadê wendekar a. Naye ra balkêşêr zî a yew dublajker a. Çend serranê peyênan de û xususen wareyê xo de bi hawayo jêhat xebitîyena. Bêguman êdî kadroyê kirmanckî estê û a zî yewê nê kadroyan de fenomenêk a.

**P: Ma to fekê to ra nas bikê, Şadê Agon kam a?**

C: Merheba. Tewr ewil ez qayîl a vaja ke ez zaf kêfweş a ke nê karê erjayeyî ke şima kenî, mîyanê ey de şima cayêk da mi. Ez sipas kena. Seba nê karê şima û keda şima, ez şima fîraz kena. Şadê nameyê min o rastkên o la Agon nameyê keyeyê ma yo. Seba ke mi nêwaştbî peynameyo ke dîyayo mi ez bişûxulnî, ez zî gêraya serê peynameyê kal û pirîkanê xo. Ez çewlîgij a û heta 5 serreyîya xo Çewlîg de ciwîyaya la mixabin nêzdîyê vîst serrî yo ke ez Îstanbul de ciwîyena. Nika zî Unîversîteya Arelî de açarnayoxtîye ser o wanena.

**P: To key û bi çi wesîle dest eşt xebata kirmanckî?**

C: Eslê xo de na mesele yew bineyk derg a. Wexto ke ma keyeyê xo bar kerdibî Îstanbûl ez tirkî mûsaya. Û wexto ke ez resaya 18 serrîya xo pey hesîya ke ez hînî ne eşkena zazakî hol qisey bikera ne zî qiymetê ziwanê mi çimê mi de mendo. Ê wextan zazakî ser o kursî çin bîy, teyna mi barcî eşnawit ke tayê embazê mi şîyêne kursê Denîz Gunduzî. No kurs o wext Seyr-î Mesel de ameyêne dayîş. Mi zî dest pê kurs kerd û o wext mi dî ke zazakî yew dengizo xorîn û dewlemend o. A roje ra nat ez zazakî ser o xebetîyena û wazena ke heta peynîya emrê xo bixebitîya.

**P: Merdim karanê sey Kovara Veyveka Darêne, Zarok tv ûêb. de raştê nê naznameyê to yeno. Keremê xora xebatê ke to tede ca girewto, ma rê tayê înan ra behs bike.**

C: Zazakî ser o karê min o tewr verîn açarnayîş bi. Serra 2010î de Îstanbul de tayê wendekaranê unîversîte bi nameyê "Pêngav" kovarêk vetbî. Mi zî qey hîrê hûmaranê na kovare tayê şîirî açarnayî zazakî ser. Ez nê gureyî ra zaf çî mûsaya, her çîyî ra verî mi dî ke ez eşkena xebatêk bîyara meydan. Pê na bawerî mi û tayê embazan 2013 de kovara Veyveka Darêne vete. Mi edîtorîya na kovare kerdêne. Hedefê Veyveka Darêne gedeyî/domanî bîy. La tayê sebeban ra kovare tenya humarêk vejîyaye. Hîrê serrî ra nat zî ez karê dublajî kena. Nê serran de mi hem qey belgefîlmanê K24 û hem zî qey karton fîlmanê Zarok Tv vengda. Nika hema zî Zarok Tv ya xebitîyena. Bêşik ez eşkena vaja ke karo ke ez Zarok Tvyî de kena qey mi her çîyî ra erjaye yo.

**P: Ti manzaraya ewroyine ya zazakî senî vînena? Goreyê to kêmaneyê mayê muhîmî çiyê?**

C: Karê ke zazakî de virazîyenê nê panc serranê peyênan de zaf aver şîy. Çîyêko tewr hol no yo ke şarê ma hînî eşkeno her ca û her wext de xo biresno zazakî. Çîyêko tewr avantajin no yo ke zazakî "tenya qiseykerdişî" ra azad bîya. Ziwano ke hem televîzyonan de hem kitaban de hem zî cuya rojane de cayê ci estbo beno wayîrê avantajanê tewr pîlan. Ez nêzanena ke ma eşkenê qey zazakî vajê ke zazakî xo xelîsnayo yan ney? Beno ke. Hewna "beno ke" ke çunkî kêmaneya ma ya pîle esta. A zî yew prosodurê musnayîşê zazakî çin o. Hela ke qey tutan/domanan. Zarok Tvyî xora projeyeyêko zaf pîl û serfîraz o, la tenya bi Zarok Tv bes nîyo. Ganî ma bala xo bineyna zêde bidê kitabanê tutan yan zî çîyanê zazakîyan ke qey tutan şûxulnîyenê. Û goreyê mi maneya pîl a bîne zî na ya ke ziwanê ma de karê açarnayişî zaf tay ê. Ganî ma edebîyatê ziwananê bînan ra hîna zêde kitaban biçarnê zazakî ser, misal rûskî û îspanyolkî ra.

**P: Semedê ameyeyî plan û projeye to estê? No mîyan de seke ti zî zana kirmanckî de rêçê cinîyan zaf kêmî yê. Goreyê qenaetê to cinî çirê bala xo nêdanê xebatanê kirmanckî ser?**

C: Seke mi behs kerd ez beşê açarnayoxtîye wanena. Bi weçînayîşê nê beşî amancê mi o bî ke hetê açarnayişî ra zazakî rê xizmet bikera. Ez nika îngilîzkî ser o xebetîyena la serna ez do îspanyolkî ser o bixebita. Kitabê ke heta nika nêameyê açarnayîş ez do înan biçarna zazakî ser, bitaybetî zî kitabê ke derheqê edebîyat, ziwan û tutan de yê. Ganî ez vaja ke ez na persa dîyine ra ke tim têkilîya ci bena ra qet hes nêkena. Çunkî eslê xo de goreyê mi tenya kirmanckî de nê kurmanckî û heta ma eşkenê vaja ke ziwananê şaranê binan de zî wina yew hal esto. La ez eşkena tenya zazakî ser o qisey bikera. Ez nuştoxanê edebîyatê zazakî bi fikrê xo gore kena di parçe; neslo yewin û neslo dîyin. Neslo yewin nuştoxê ke kovara Tîrêjî ra nat yenê naskerdiş û bingeyê zazakî ronayo, înan ra teşkîl beno. Xora êyê ke serranê ma ra zaf pîl ê, înan ra yeno meydan no nesil, mîsal Malmîsanij, Îhsan Espar, Munzur Çem, Roşan Lezgîn, Denîz Gunduz ûêb. Seke şima zî va raşt a zî ti vanî qey yew vayî heme cinîyî girewtê û berdê. Neslo dîyin zî nuştoxanê hîna gencan ra yeno meydan. Û mîyanê înan de xeylê cinîyî zî estê. Yanî vateyê mi no yo ke wexto ke neslo yewinî dest eştibî zazakî, cinîyî cara mîyanê komelî de zî seke çin bîy, ne şîyêne mekteb ne zî yew firsendê înan estbî ke nuştişê zazakî de bibê şinas. Na meseleya "cinîyî çira tay ê?" yew weçînayîşo ke hetê cinîyan ra bîyo, nîyo. Cara zî nika eke merdim hol biewno ci ra fehm keno ke cinîyê ke zazakî nusenî yan zî zazakî ser o xebitîyenê tay nîyê. Ez zerrîye ra bawer kena ke do ameyox de hîna bibê zêde.

**P: Xeyalê to çi yo? Bêguman wareyê kirmanckî de**

Xora derheqê zazakî de di hebî xeyalê minê pîlî estî. Ez çend serrî ra nat karê dublajî kena û ez eşkena qey xo vaja ke ez hînî bîya profesyonel. Ez zaf qayîl a ke hîna zaf fîlman, belgefîlman yan zî xêze filman bi zazakî bêro seyrkerdiş. Nara ez wazena wina yew studyoyêk akera. Xeyalê min o bin zî qey tutan yew projeyêk ke açarnîyayîşê kitabanê tutan, perwerde kerdişê tutan, kayanê zazakî ra yeno amade bika. Ez çîyanê winayînan viraza. Ez hêvî kena ke rojêk pêro benê. Û o wext zî ma derheqê nînan de qisey kenî. Zaf sipas kena.

# Wendekara 13 Serreyîye ra Ferheng


Îlayda Gultekîne, wendekarêka Merkezê Zanist û Hunerî yê Çewlîgî ya. Aye, demêko nêzdî de, çarçewaya projeyanê nê merkezî de bi ziwanê dayîka xo kurdkîya zazakî/kirmanckî yew ferheng (tirkî-îngîlîzkî-zazakî) amade kerdo.

Îlaydaya hîrês serreyîye ke keyeyê xo reyde Çewlîg de ronişena, şina sinifa hewtine. Aye, semedo ke zazakî binê tehlukeyê vîndîbîyayîş de ya, qerarê amadekerdişê yew ferhengî dayo. Verê vejîyaya seha; Çewlîg de gelek pîran/kalan reyde ameya têhet û înan ra çekuyê zazakî arê kerdê. Dima zî ronişta û xo bi xo şeklo peyên dayo xebata xo.

Wendekara çewlîgije ke na xebata xo mabênê hîrê hewteyan de qedenaya, derheqê ferhengê xo de wina qisey kerdo: "Mi na xebate de nêzdîyê 900 çekuyê zazakî tesbît kerdî û manayê înanê tirkî û îngîlîzkî zî duştê înan de nuştî. Amancê mi no yo ke ez na xebate hîna hîra bikera û bika yew çimeyo ke ameye de ci ra bêro îstîfade kerdene."

(Çimeyê xebere û fotografî: http://www.cevlikhaber.com)

Ma zî seba nê ferhengî Îlayda Gultekîne pîroz kenê û heto bîn ra hêvî kenîme ke no hesasîyetê aye heme kirmancan/zazayan rê nimûne bibo. Çunke qet şik çin o ke ma bi ziwanê xo nênusê û xebatan nêkerê kesê bînî nênê nênusenê û halê zazakî xo rê xem nêkenê.



Îlayda Gultekîn

# Ez, Vejîn û Beşê Mi

**HACÎ ÎBRAHÎM AYTEKÎN**

**MERHEBA** wendoxê delalî. Ez şima rê bi zerrîgermî selamî kena. Nê nûşteyî de ez do şima rê qalê xo, Kovara Vejîne û Beşê Ziwan û Edebîyatê Kurdkî yê Unîversîteya Artukluyî bikerî. Ez ha siftaya verêne rojnameyêk rê nusena semedê ney mi de heyecanêko gird esto. Ez bi nê heyecanê weşî dest pêkena.

**Hacî Îbrahîm Aytekîn kam o?**

Xoterîfkerdiş, karêko asan nîyo. Ganî kes dîqet bikero çûnke merdim eşkeno mabênê xogirdvînayîş û xohûrdîvînayîş de vindî bibo. No semed ra ez do şima rê tenya melumatanê mecbûrîyan bidî. Nameyê mi Hacî Îbrahîm o, ez Unîversîteya Mardîn Artukluyî de wendekarê beşa/qisma Ziwan û Edebîyatê Kurdkî ya û sinifa hîrêyine de wanena . Ez qezaya Dîyarbekirî Çêrmûge ra Dewa Bistîne ra ya. Ez kirmanckî, kurmanckî, tirkî û fariskî (sewîyeya mîyanênî de) zana. Hewna kitabê min ê çapkerdeyî çin ê, tenya hîrê nûşteyê mi Kovara Vejîne de weşanîyayê.

Mi zî sey heme domananê kurdan ê verênan verdê mektebî tirkî nêzanitêne, semedê ney ra mekteb de ez yewêdo zaf pasîf bîya, vera-vera ez tirkî mûsaya û o pasîfbîyayîş bi şenik la hewna ez a psîkolojîye ra nêxelisîyaya. Lîse de mi de reaksîyonêk peyda bi û mi êndî hetanî mecbûr nêmendêne tirkî qisey nêkerdêne, vera-vera mi zî waşt robarê kirmanckî de xo bişiwî û bibî pak.

**Eleqeyê min ê kirmanckî ser o**

Wexto ke ez çar serreyî bîya ma dewe ra bar kerd û ameyîme Dîyarbekir, ma dewe de dimilî qisey kerdêne û wexto ke ma ameyîme bajar zî ma zîwanê xo ra fek vera nêda. Ma hewna ewro zî keye de bê kirmanckî sewbîna zîwan qisey nêkenê, belkî xeyrê nê hesasîyetî ra lîse de mi de sewdaya kîrmanckî dest pêkerde. Mi xo bi xo bi awayêdo amator kirmanckî nuştêne. Wexto ke mi lîse wendêne rojêk birayê min ê pîl Mehmûdî çend hûmarê Newepel û kovara Şewçilayî ardî. Winî yeno mi vîrî ke sifta mi o wext weşanê kirmanckî dîyî. Verî ez tay şaş bîbîya dima mi Şewçila girewtbî destê xo û mi rîpelêk wendbî, sifta mi zaf tay fam kerd çûnke hem alfabeya ma alfabeya tirkî ra cîya bî hem zî bi ziwanêko standard nûsîyabî.

Mi kirmanckî de tenya fekê xo zanayêne, fekanê bînan ra xebera mi çin bî, vera-vera mi cehd kerd û bi metodê ke tirkî ci ra vanê "deneme-yanılma/ceribnayîş-şaşîkerdiş"î ya kirmanckîya xo hîra û dewlemende kerde. Wexto ke ez ameya Unîversîte zî mi dest bi wendişê kitabanê kirmanckî kerd. Mi nê prosesî de hema-hema qet hetkarîye nêgirewte. Nûştişî rê dewam kerd, çiçî ameyêne aqilê mi, mi nuştêne. Wexto ke çekuyêka vîrraşîyayî ameyê mi vîrî ez zaf şa bîyêne û hemanî mi a çêkûye derbasê kaxite kerdêne, mi xo bi xo vatêne na çekûye êndî vîr ra nêşina çûnke nusîyê.

Hîkaye û romannûsîye de qelema mi zaf biquwet nîya, mi zaf reyan waşt ke yew kitabê hîkayeyî binûsî la mi nêşa çar rîpelan ra vêşêr binûsî. Mi dî ke wina nêbeno mi zî va madem ez nêeşkena hîkaye binûsî qet nêbo xebatanê lîngûîstîk, qeydkerdîş û açarnayîşî bikerî, xora nûşteyê min ê ke Kovara Vejîne de weşanîyayî zî, bê Sanika Gujo, nûşteyê lîngûîstikî bî. Nika ez ha pîyesê Musa Anterî yê "Bîrîna Reş"e açarnena kirmanckî ser, a do badê çendna rojan biqedîyo. Badê qedîyayîşê "Bîrîna Reş"e zî ez wazena yew kitabê Furûx Ferûxzade açarnî.

**Mi çira Beşê Ziwan û Edebîyatê Kurdkî tercîh kerd?**

Esasen verî aqilê mi de no beş çin bî û semedo ke pûanê mi zî pûanê beşî ra tay kêmî bî mi bawer nêkerdêne ke ez do qezenç bikerî. Mi, tesîrê birayê xo yê pîlî ra, beşê huqûqî waştêne û vatêne eke huqûq nêbo ez do şirî beşê kurdkî. Wexto ke neticeyê tercîhan eşkera bî mi dî ke mi kurdolojî qezenç kerda. Nika ez xo bi xo vana rind ke huqûq nêbî û ez ameya beşê xo çunke mi huqûq nêwaştêne.

Timûtim ziwanî rê elaqeyêkê mi estbi. Wexto ke mi çekuyêda nêeşnawite dîyê hemanî ci gêrayêne û musayêne. Bitaybetî zî çêkûyanê tirkî de mi zanayêne kamcîn çêkûye kamcîn ziwanî ra dekewta bi tirkî. Xeyrê nê eleqeyî ra ez dekewta beşê kurdolojî û mi dest bi wendişî kerd.

Ganî kirmancî nêvajê "ez kirmanckî zana" çûnke merdim hetanî fekanê bînan ê kirmanckî nêvîno nêzano ke kirmanckî çiqas dewlemend a. Mi na dewlemendîye xeyrê beşê kurdolojî ra dî çunke ma dersê xo de tenya fekê Sêwregî yan zî fekê Dêrsimî nêdîyêne, heme fekanê kirmanckî dîyêne.

Xarîcen helbet tay zorîya beşî zî estbî, mesela ganî ez vajî ke serra yewine qandê mi zaf zore bî çunke mi kurmanckî qet nêzanayêne û heme dersê ma zî kurmanckî bî. Tenya seba mi nê seba embazanê kurmancan zî zor bî çunke esasen înan zî tenya fekê xo zanitêne. Teqrîben 12 dersê ma estbîy û ma hewna derheqê kurdkî de zaf çî nêzanitêne, xora dima îdarekaranê beşî zî ferq kerd wina nêbeno badê ma hûmara dersan kêmî kerdî û mûtewaya înan zî amê şenikkerdiş

**KOVARA VEJÎNE**

Kovara Vejîne ewro hetê wendekaranê kurdolojî yê Unîversîteya Artukluyî ra yena weşanayîş. Hetanî nika 4 hûmarê ci vejîyayê û tede hem nûşteyê kirmanckî hem zî kurmanckî estê. Nûşteyê Vejîne, bê çend îstisnayan, pêro hetê wendekaranê kurdkî ra nusîyayê. Semedo ke hetê wendekaran ra vejîyena hem tey rûheko amator hem zî şîrînîyêka weşe esta.

**Tarîxçeya Kovara Vejîne;**

Ma Vejîne ra vanîme kovare la Vejîne hetanî hûmara xo ya 3ine fanzîn bî. Vetişê hûmara 4ine de ma qerar da ke wa Vejîne êndî fanzînbîyayîşî ra vejîyo û bibo kovarêk. Kovara Vejîne sifteyo verên 1ê adarê 2014î de vejîyê. Amancê embazanê ma o bi ke meng ra meng hûmarêk vejê la semedê tay probleman înan nêşa, dima hûmara dîyine zimistanê 2015î de vejîyê. Na hûmare de embazan zafanî derheqê ziwan û edebîyatî de nûştî. Hûmara 3. wisarê 2015î de ya 4. zî zimistanê 2017î de vejîyê. Seke şima zî vînenê mabeynê hûmara 3. û 4. de nêzdîyê di serran ferq esto. Zafanî problemanê ekonomî ver weşanê Kovare vindeno û wexto ke tay pereyî kewenê embazan dest, weşan yeno domnayene. Hûmara 5. do nê rojan vejîyo. Bokanî badê ney ma problemê ekonomî nêancenê û weşanê Vejîne domnenê.

**Ma çira Vejîne vejenîme û çira nameyê Kovare "Vejîn" o?**

Sey heme miletanê dinya kurdî zî wazenê biciwîyê û ziwanê xo muhafeza bikerê la semedê problemanê cîya-cîyayan kulturê kurdan roj bi roj texrîb beno. Ma nê texrîbatî tewr zaf domananê kurdan ser o vînenê, wexto ke ez ewnena domanêkê kurdî ra mabeynê ey û domanêkê tirkî de tu ferqêk nêvînena. Ma na rewşa wehîme de waşt ke gamêka viraştoxe bierzîme û weşanê Vejîne ke vinderte bî newe ra da dewamkerdiş.

Vejîn, çekuyêka kurmanckî ya û kirmanckî de muqabilê na çekuye "newe ra ciwîyayiş, newe ra zîyayîş" o. Şima zî zanê ke tarîx de, bitaybetî zî seserra peyêne de, dişmenanê kurdan zaf reyan waşt ke kurdî biqedîyê û kurdkî zî bimiro. Wexto ke ma ewnenê prosesê asîmilasyonî ra vînenîme ke na polîtîkaya îmhakerdişî qismen ser kewta zî la xeyrê kulturê xo yê berzî ra ne kurdî qedîyayê ne zî kurdkî merda. Îlhamê ma yê namekerdişê kovare zî nê îradeyê xoverdayîşî yê miletê ma ra yeno.

**Komîteya Vejîne:**

Komîteya Vejîne de di beşî estê; beşê kurmanckî û yê kirmanckî. mesulê beşê kirmanckî ez a, berpirsîyarê beşê kurmanckî zî Habîp Kaya yo. Na komîte nuşteyan wanena, redakte kena û qerarê weşanîyayîşê înan dana. Helbet seba ma heme nuştox û kedkarê ma qedirberz û ezîz ê la çend kesê taybetî zî na komîte de estê ke ganî ma tîya de qalê înan bikerê. Eke ewro bi nameyê Vejîne kovarêk esta bêguman ney de emegê Bahadîn Akan û Yusuf Turanî zaf o. Nê di embazê ma Komîteya Vejîne de karanê sey redakte, mîzanpaj û edîtorîye ra mesul ê. Hetkarîya Hebîbî kenê û karanê weşanî yê bînan yê Vejîne kenê.

**Kovara Vejîne de cayê kirmanckî;**

Hûmara 1. safî bi kurmanckî bî yanî tede nuşteyê kirmanckî çin o. Hûmara 2. de Lijneya Vejîne mamoste Roşan Lezgînî reyde roportajêk kena û bi xeyrê nê roportajî kirmanckî keweno Kovara Vejîne. Hûmara 3. reyna safî bi kurmanckî weşanîyena. Hûmara 4. de ma seke Lijneya Vejîne qerar da ke êndî kovare hem bi kurmanckî hem zî kirmanckî vejîme. Hûmara 4. de di nûşteyê kirmanckî weşanîyayî; "Sanika Gujo" û "Muqayesekerdişê Fekê Çêrmûge û Standardê Grûba Vateyî". Nê her di nûşteyî zî hetê Îbrahîm Bistînîjî ra nûsîyayê. Hûmara 5. do nê nêzdîyan de vejîyo, na hûmare de 3 nuşteyê kirmanckî do bîweşanîyê; yew hîkayeya Mutlu Canî yê bi nameyê "Mîlçika Ke Nişta Sêneyê Maya Mi Ra", yew muqayesekerdişê Îbrahîm Bistînijî bi sernameyê "Hetê ferheng û çend xusûsîyetan ra kilmmuqayeseyêk Kirdkî, Kurmanckî û Fariskî" û yewna zî şîîrê Casim Aytekînî bi nameyê "Halînê Vilika Kerrê Bistînî". Amancê ma no yo ke wa Vejîne nême kurmanckî bo nême zî kirmanckî. Ma do hûmara şeşine de zafêr ca bidîme kirmanckî seba ney ma wendoxanê kirmanckî ra rîca kenê ke wa ma rê nuşteyan bierşawê.

**BEŞÊ ZIWAN Û EDEBÎYATÊ KURDKÎ**

Seke yeno zanayene Beşê Kurdolojî 2009 de abî, tede hem sewîyeya lîsansî de hem zî sewîyeya lîsansê berzî de perwerde esto. Sewîyeya lîsansê berzî de hem qismê kirmanckî hem zî qismê kurmanckî esto la sewîyeya lîsansî de, na game, tenya qismê kurmanckî esto. Her çiqas serranê peyênan de sebebanê sîyasîyan ver rewaç de nêbo zî hewna beşêko muhîm o. Ewro kurdolojî hetê dewlete ra yena astengkerdiş. Semedê nê astengkerdişî zî çend kêmasîyê nikayênî yê Kurdolojî estê, ez nika wazena ê kêmasîyan ra qal bikerî.

**Taybîyayîşê Hûmara Mamostayan**

Sinifa yewine û dîyine de mamostayê ma zaf bîy û pêro bikalîte û serkewte bîy. Emser ê mamostayan ra nêzdîyê 6 heban, rîyê KHKyan ra ameyî îxrackerdiş û kontratê mamostayanê ma yê xerîban (yanî êyê ke hemwelatîyê Tirkîya nîyê) zî nêameyî dergkerdiş. Nê semedan ver beşê ma dirbetêka girde girewte, mamostayê ma yê mendeyî zî semedê taybîyayîşê hûmara mamostayan ra zaf zehmetî ancenê û her mamosta keweno çend dersan. Seke mi vat, lazim o ke wexto tewr rew de mamostayê ma agêrê karê xo ser.

**Çinbîyayîşê dersê Hewramankî û Lûrkî**

Çi heyf ke mîyanê dersanê ma de dersê hewramankî û lûrkî çin ê. Ma wendekarê beşê kurdkî yê û wazenê heme dîyalektanê kurdkî bivînê û bimûsê. Nê her di dîyalektî zî zaf arkaîk û şîrîn ê, mesela edebîyatê klasîk ê hewramankî zaf kehen û dewlemend o ganî ma a dewlemendîye ra mehrûm nêbê. Edebîyatê lûrkî de Baba Tahir esto ke edebîyatê kurdkî yê pêroyî de şexsêko pîroz o, nika çira ma şîîranê Baba Tahîrî kurmanckî biwanê? Ganî ma şîîranê Baba Tahîrî bi lûrkî biwanê ke bivînê kurdkî çiqas hîra û dewlemend a. Bi kilmî talebê ma o yo ke ma nê di dîyalektanê arkaîk û şîrînan zî bivînê û bimûsê.

**Çinbîyayîşê Beşê Kirmanckî**

Vakurê Kurdistanî de di tewir kurdî estê, kurdê kirmancî û kurdê kurmancî. Her çiqas qatê xonêzanî na raştîye înkar bikerê û vajê kirmancî kurd nîyê zî no wina yo. Mi gore kirmanckî zî sey kurmanckî dîyalektêka kurdkî ya û lazim o ke kirmanckî zî sey heme dîyalektanê kurdkî nêmiro.


Nika ma beşê xo de tenya yew serre kirmanckî û nêm serre zî edebîyatê kirmanckî vînenê helbet no bes nîyo, mîyanê yew serre û nême de kam eşkeno kirmanckîya xo biresno cayêk? Bifikirîyê ke mîyanê çar sinifan de yew ez kirmanc a embazê bînî pêro kurmanc ê gelo sebebê ney çik o ?, Mi gore eke beşê kirmanckî bêro akerdiş do hem seba kirmanckî zaf baş bibo hem zî kadroyê kurdperwerî do biresê. Xora qaso ke ez zana seba akerdişê beşê kirmanckî nîyetêk esto la bokanî no nîyet ser bikewo.

**Vatişo Peyên**

Ez wazena tewr peynî de derheqê ayendeyê kirmanckî de fikrê xo vajî. Ganî ewro her kes qebul bikero ke ziwanê ma ver bi mergî şino. Qeçekê/domanê ma ziwanê xo nêzanenê, bi ziwanê ma ya pere qezenc nêbeno û mekteban de bi ziwanê ma perwerde nêno dayene. Asîmîlasyon hetanî qirike yo û dewlete heme waranê cûye de ziwanê ma rê hêrîş kena. Dewlete kirmancan mecbûrê tirkî veradana. Tabî hetê ra qusûrê ma zî estê, nimûne; ma wayîrê polîtîkaya ziwanî nîyê û çi heyf ke komeleyanê kurdan de hesasîyetê kurdkî zaf nîyo. Eke nê kêmasî û xetayê ma dewam bikerê, wina aseno ke, peynîya ma do bêro. Peynîya peynî de ez rêca kena ke wa şarê ma domananê xo de kirmanckî qisey bikero, eke ma domananê xo rê ziwanê xo nêmûsnê kam do bimûsno?

*Not; Embazê dîyarbekirijî eşkenê Kovara Vejîne Lîlav Kîtabevî û Pirtûka Kurdî ra peyda bikerê û embazê ke wazenê zî eşkenê ma rê nûşteyanê xo bierşawê.*

*Kovarvejin@gmail.com*


Hejmar 5 Hûmare

VEJÎN – ڤەژین

Bihar 2017 Wisar

Kovara Demsalî ya Xwendekarên Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî Zanîngeha Mardîn Artuklu
Kovara Demserrane ya Wendekaranê Beşa Ziwan û Edebîyatê Kurdkî Ûnîversîteya Mardîn Artuklu

| Ehmedê Xanî, Mem û Zîn û Netewetî | Çima Roja Zimanê Kurdî, Çima 15ê Gulanê? | Mîlçika ke Nişta Sêneyê Maya Mi ra |
|---|---|---|
| Hikmet YILDIZ | Bahadîn AKHAN | Mutlu CAN |

> Vejîn, çekuyêka kurmanckî ya û kirmanckî de muqabilê na çekûye "newe ra ciwîyayîş, newe ra zîyayîş" o. Şima zî zanê ke tarîx de, bitaybetî zî seserra peyêne de, dişmenanê kurdan zaf reyan waşt ke kurdî biqedîyê û kurdkî zî bimiro. Îlhamê mayê namekerdişê kovare zî nê îradeyê xoverdayîşî yê miletê ma ra yeno.





MURAD CÎWAN

## Qurincok li Qeterê ketin, Tirkiye veciniqî

Rûdaweka payî bi awayekî nepayî hat. Siûdîyê, Misirê û hin dewletên ereb bi biryareka sert Qeter xist dorpêçê, ew kir masiyê av li serê ziwa bibe. Têkiliyên wê yên dîplomasî, eskerî û aborî qeyd û bend bûn.

Pêre pêre xetereka xelayê jî serî hilda. Îranê û Tirkiyeyê xwe dan ber veguhaztina pêdiviyên xurekî yên acîl. Lê wiha biçe ê êş û krîzên kûr ên berdewamî rû bidin.

Trump jî xwe da pişt vê biryara tevizîner.

Yan Qeter ê demildest daxwazan cîbicî bikê, yan jî ê riya guhertina desthilatê bê peydakirin.

Qetar qiraliyeteka mutleq e, eger hebe, guhertin ê bi guhertineka li nav malabata qiraliyetê be.

Ew welatekî sune yê wek Siûdiyê wehabî ye. Hevkara Siûdiyê û welatên Delêv e. Peywendiyeka wê ya aborî ya xurt bi DYAyê, Rojava û deverê re heye. Ew xwedan nifûseka 1,7 milyon e ku ji %85ê wê xizmetkarên biyanî ne, ne xwedan tu mafên welatî ne.

Qeter dewlemendeka jihedêder a gaz û petrole ye. Sermiyangêriyên wê yên derva digihê trilyon dolaran. Hevkareka pêbawer a eskerî ya DYAyê ye. Binkeyên eskerî yên Amerîkayê û Brîtanyayê lê hene.

Baş e, Qeterê çi kir ku ereb ew qas aciz kirin?

Ne veşartî ye ku ji mêjve ye ew piştgiriya tevgerên sune yên radîkal-selefîst, (Al Qaîde, DAIŞ, El Şebab) dike. Siûdî jî wiha bû, lê roja ku Siûdiyê ev birî, kêm kir an guhert, Qeterê nekir.

Demeka ne kin e, Qeter piştgiriyeka xurt dide Birayên Misilman, li Misrê bû palpişta Mursî, li Filistînê Hamasê av dide. Rêvebirên van rêxistinan li welatên xwe bicih kirin. Di vî warî de desthilata Erdoğan re hevkariyeka xurt danî.

Siûdî, Misir û gelek ereb derdkêş in ji alî Birayên Misilman û Hamasê ve.

Di destpêka bihara erebî de Rojava bi serkêşiya DYAyê wek îslama milayîm piştgirî da Birayên Misliman da ew bi hilbijartinan bên desthilatê û li welatên misilman ên otoriter reformên liberal li dar xin, guhertinên ber bi demokrasiye ve cîbicî bikin. Wek welatekî misilman ê xwedan tecrubeya sekulerî û demokrasiyê rola modeliyê spartin Tirkiyeyê.

Lê bihara erebî, ya hêvîkirî neda, li gelek deveran, reqîtiyê rê neda da ew tifaqan li gel pêkhateyan bikin û bibin desthilat. Li Misrê ew bûn desthilat, lê wan riya demokratîzekirinê negirt, ber bi otorîteriyê ve çûn. Li Suriyeyê wan piştgiriya civakan negirt, xwiya jî bû ku zehmet e ew karibin hidûdekî têxin navbera xwe û El Qaîdeyê an DAIŞê.

Ak Partî jî bi wê rola xwe ya modeliyê ranebû, ji dêlva ku ew civakên ereb bikêşe bi alî xwe ve, ji cimûcol û coşên destpêka serîhildanan, ew bi xwe ber bi wan ve herikî. Riya ber bi otorîteriyê û nelihevkirina li gel Rojava xwiya bû. Tenê li Tunisê hin gavên lerizokî li ser piya man.

Loma, Rojavaya dev ji bihara erebî berda, li Misrê Sîsî darbe kir, li Afrîkayê û Sûriyeyê kutle ber bi DAIŞê û Êl Qaîdeyê ve herikîn. Biryara pûçkirina wan derket.

Rusya jî tê de, ji bo civaka navneteweyî ya aktuel ew e ku ne tenê El Qaîde û DAIŞ, Birayên Misilman û Hamas jî bên tasfiyekirin, li derveyê desthilatan bên hiştin.

Bizava Birayên Misliman hevrikeka tarîxî ya wehabîtiyê ye. Siûdiye bi her derfetê dixwaze ew bên tunekirin.

A di van stratejiyên Siûdiyê, Misirê û Rojava de Qeter miziriya dike, planên lihevkirî nameşîne, Hamasê û Birayên Misilman dihewîne.

Ew, di şerê dawîn yê li hember Îranê de, bi erebên sune re ne di rezonansê de ye. Muhtemelen bi armanca ku li hember giranîya Siûdiyê hevsengiyekê peyda bike. Lê ji bo Siûdiyê Îran buye koremarek ku ramaneka wiha hew dikare wê hêrs bike.

Îran li Iraqê, Sûriyeyê, Libnanê, welatên Delêv, Yemenê, Lîbyayê ye, heta li hundurê Siûdiyê bingehê wehabîtiyê dihejîne. Divê Îran ji herêmê bê qewirandin. Hatina Trump a ser desthilatê, firsendeka zêrîn e. Di dewra çar salên Trump de Siûdî lazim e bigihê armancê yan na paşeroj tarî ye.

Aciziyên welatên ereb ji Qeterê ji ber qenala El Cazîreyê jî tê. Ew li nav ereban bi zimanê xwe yê bêtirs gelek derûdoran dixe tengasiyê. Serokên Qeterê vê naynin rêzê, bi vacayî kêfekê jê digrin.

Îzolasyona giran a ser Qeterê ji ber van e. Qeter ne li benda derbeka bi vî awayî bû. Ew ranapelike ruyan, nerm digire, lavayî dike da guftûgo destpêbikin û biryarên giran bên rakirin.


Lê xwiya ye, biryarwergir heta guhertineka esasî nebînin ê venekişin. Yan divê siyaseta Qeterê biguhere, yan ê guhertineka desthilatê di nav malbata qiraliyetê de bê kirin. Mesele ciddî ye hela ku serê Trump li pişt xuya ye. Hin tevgerên balkêş jî li Îranê rûdan.

Baş e, qurincok li Qeterê ketin, Tirkiye çima veciniqî? Di mesela Birayên Misilman, Hamasê heta DAIŞê, El Qaîdeyê û peywendiyên li gel Îranê de siyasetên Tirkiyeyê û Qeterê pir nêzî hev in. Ew piştgiriyeka têr dide Hamasê, Birayên Misilman ên Suriyeyê, heta Nusrayê (Qaîde). Sidûye, Amerika, Rojava, heta Rusya ji vê siyasetê tengezar in. Ev dikare Tirkiyeyê bîne hemberî DYA û Rusyayê.

Tirkiyeyê gelek alîkariya Îranê a dema lihevhatina nuklerî kir ku Trump gelek jê aciz e û dixwaze hilweşîne. Tirkiye li hemberî Kurdên Suriyeyê û Iraqê jî hevkariyê li gel Tehranê, Bexdayê û Şamê dike.

Erdoğan li rast û çep, li jêr û jor hemû welat ji xwe kerixandine. Eger ne mesela îstîqrara Tirkiyeyê buya nuha ji mêj ve gaveka xerbtir li Tirkiyeyê hatibû avêtin û kesê jî nedigot 'heyf'. Tirkiye vê dibîne loma vedicinigê.

# Pêvajoyên hizrî raman û ziman (1)



Naxwe mirov arîşe û pirsên li benda çareseriyekê ne, çewa çareser dike? Dîtin û hizra derbarê vê an wê bûyerê çewa diguherîne? Tê zanîn ku metoda herî kevn ya çareseriya pirs û arîşeyan, metoda "ceribandin û têkçûnê" ye.



ŞEFÎQ PÊŞENG

**MIJARA** pêvajoyên hizrî, têkiliya raman û zimanî her bûye mijara zanyariyê û loma jî zanyaran serê xwe pê êşandiye. Hê di dema Yewnana antîk de fîlozofên weke Platon, Aristoteles, Cicero û gelekên din bi vê mijarê mijûl bûne. Platon dibêje; '' Hizrandin; Axaftin e, axaftina rih ya xwe bi xwe ye." Platon di beşeke din de dibêje; ''Bi min weha tê ku; rih-aqil difikire û ji axaftinê pê ve tiştekî din nake. Ew ji xwe pirsan dike û li berîsvan digere. Zû an dereng, eger rih gihêşt qenaeteke zelal û bi xwe re li ser wê, li hev kir, di qenaeta xwe de bi vî alî û wî aliyî de neçû û nehat, ew êdî xwedî ramanekê ye."

Weke ku Aristoteles bixwaze Platon piştrast bike, dibêje: ''Hizrandin hunereke ku tenê sîstemên zimanê wan hene û bi vê şêweyê '<dikarin xwe bi xwe bişêwirin e."

Di rastiyê de têgihaştina têkiliya ziman û ramanê ya mekanîk hêsan e. Her yek ji me rojane di pêvajoya ji vê têkiliyê pêk tê, li cîhekî ye. Bêguman her çiqas hin helwest û kiryarên me bêwext û ji nişka ve bin jî dîsa di pêvajoyeke hizrî re dadiwerivin. Pêvajoya afirandina hizrê çendî kurt dibe bila bibe, îstisna ne tê de, liv, gotin an jî çalakiyeke ku fermana wê ne ji navenda hiş be nîn e.

Ji bo dayîna biryarekê pêvajoyeke hizrî divê. Em rojane derheq daxwaz û pêdiviyên xwe de planan çêdikin, ji xwe re li rê û rêbazan digerin û ev tev jî, kêm-zêde, rast-çewt, kurt-dirêj piştî pêvajoyeke hizrî di hişmendiya me de zelal dibin. Divê bê gotin ku zelalî jî ne dikare herdem zelaliyeke bêminaqeşe be, lê ku qenaeta zelaliyê, an jî qenaeta zelaliyeke têra liv, gotin û çalakiyê hasil dibe, pêvajoya hizrandinê jî bidawî dibe û êdî em derbarê mijara pêvajoya hizrandinê de xwedî ramanekê ne. Bi gotineke sade, hizrandin; pêvajoyeke afirandinê, afirandina çaresriya astengî û pêdiviyan e. Lê helbet hizrandin di heman demê de ramanên derbarê her tiştî de jî diafirîne. Dîtinên me bergehên me, vizyon û konseptên me yên derheqê vê an wê mijarê jî encamên pêvajoyên hizrî ne û ne mimkin e ku em bikaribin bibêjin ew her qencî û çareseriyên qenc didin ber me.

Naxwe mirov arîşe û pirsên li benda çareseriyekê ne, çewa çareser dike? Dîtin û hizra derbarê vê an wê bûyerê çewa diguherîne? Tê zanîn ku metoda herî kevn ya çareseriya pirs û arîşeyan, metoda "ceribandin û têkçûnê" ye. Ev metod îro jî ji aliyê heywanan ve weke metoda sereke tê bikaranîn. Lê ev metoda ku ne metodeke karîger e, demeke dirêj ji aliyê însanan ve jî hatiye bikaranîn. Dema ev metod tê bikaranîn, pêwîstî bi pêvajoyeke hizrî ya kompleks nîn e. Loma jî digel ku dikare pirs û arîşeyên hêsan çareser bike, nikare ji yên kompleks re bibe çareserî.

Dîtina çareseriyên pirs û arîşeyên kompleks, pêvajoyeke hizrî ya kompleks ferz dike. Em ji bo çarseriyeke weha di kûrahiya hişmendiya xwe de dest bi çêkirina planan dikin. Di vê pêvajoya navxweyî de liv û çalakîyên encamên hirzandinê tune. Çalakiyên navxweyî hizrî ne. Plan in, hesab in, bersiva pirsên ji destpêkê heta gihêştina armancê ne.

Mînaka herî zêde li vê pêvajoyê tê lîstika kişikê ye. Kişikvan beriya destpêka lîstikê planekê çêdikin, hesabê ajotinên berikê xwe dikin ev amadekariyên hizrî ne. Ku lîstik dest pê kir êdî li gel hesabê hamleyên xwe hesabê hamleyên yê dijberê xwe jî dike. Di radeya duyem ya pêvajoya hizrî de, li gorî hamleyên dijber refleks û disîplînên nû dikevin dewrê. Pêvajoya hizrî bi her hamleyî bi dawî dibe û bo her hamleya nû pêvajoyeke din û nû dest pê dike. Mêjî heta dawiya lîstikê bi hizrandinê mijûl e.

Çawa di lîstika kişikê de ajotina berikekê jî encama pêvajoyeke hizrî û diyarkirina hizrê ye axaftin jî pêhesandin û ragihandina ramanê ye. Lê di heman demê de axaftin raman bi xwe ye. Loma jî fîlozofên serdema modern di sîstemeke ji refleks û disîplînan pêkhatî de, ziman û ramanê weke hev dinirxînin. Zimannasê navdar Wilhelm von Humboldt zimên weke organa dîtbar ya ramanê, binav dike. Lê divê bê gotin ku kesên ku axaftinê weke ramana dengdêr dibînin jî ne kêm in. Minaqaşeya di nav têkiliyên raman û ziman de kîjan bêtir tesîrê li ya din dike hê bi dawî nebûye.

Bêguman faktorên ku tesîrê li pêvajoyên hizrî dikin, heta wan tayîn dikin jî hene. Pêvajoyên hizrî her dem bikontrol, sîstematîk, analîtîk û bi pîvanên zanistî nameşin. Ligel faktorên genetîk, perwerde, tecrûbe, çanda civakî, baweriya olî, şert û mercên fizîkî û hest jî dikarin tesîrên erênî an jî neyînî li pêvajoyên hizrî bikin.

Ku em li tiştekî difikirin, pêşî taybetmendiyên wan yên tarîfkirî tên bîra meriv: Form, deng, bêhn, tam, reng û taybetmendiyên wisa. Ziman weke sembol wan tarîf dike. Lê bi rastî jî ziman tenê sembol e, an ji sembolê wêdetir e?

*1)Platon, Sophistes 263e*
*2)Platon, Theaiteth 190a*
*3)Aristoteles, li ser rih, pirtûka III.*
*4)Wilhem von Humbolt, Über die Verschiedenheiten des menschlichen Sprachbaues, sernivîs 191*

# "Heta azadiya Kurdistanê me tu rehetî û aramî nedît"



BÛBE ESER

Em di vegotina êş û kul û derdên kesûkarên jenosîda Enfalê de berdewam in. Heftiya borî me dest pê kir û vê heftiyê jî hûn dê serpêhatî û jiyana 4 kesûkarên enfalkiriyan bixwînin û bibînin ka tûşî çiqas zehmetî û dijwariyan bûne. Ji bilî derd û kulan tiştekî din jî nêrîna hevpar a malbatên enfalkiriyan e: Em niha azad û serbest in û ma ji vê xweştir?



**Xûrbet (Barzan): Piştî 10 salan ez fêr bûm ku venagerin**

Dema ku leşkerên Sedam bavê min û birayê min ê mezin birin, ez 10 salî bûm. Min wê demê zêde bîra tiştekî nedibir. Bi birina wan ez giriyam. Ji ber ku min didît ku leşker wan bi zorê dibin. Lê diya min li ber min geriya û got: "Wê werin lawo, zêde xwe neqehirîne". Lê ez niha 35 salî me û ew qet nehatin û li me venegeriyan.

Piştî birina bav û kekê min. Ji bona ku ez û dayika xwe, em bikaribin debara malê bikin, min ji 10 saliya xwe de dest bi kar kir. Piştî birina bav û kekê min, êdî me xwe bêkes dîdît. Her me hizir dikir ku ewê rojekê li me vegerin lê ez di 18-19 saliya xwe de fêr bûm ku êdî wê bav û kekê min li me venegerin. Wê demê min bêtir xwe bi tenê, bê bav û kek hîs kir. Ji 10 saliya xwe de û heta niha kar dikim ji bilî kar min tu tiştekî din hizir nekiriye. Ji ber ku di hişê min de tenê xwedîkirina xwîşk û birayên min hebû.

**Zendîn Mehmut Mîrze (Bilê): Min çavên xwe vekirin û bavê min tune bû**

Dema bavê min hate Enfalkirin ez 4 salî bûm. Ez di hembêza bavê xwe de li odeyê razayî bûm. Me dît ku leşker ketin hundir, bavê min birin. Ez gelekî li dû wî giriyam, her min xwe davêt lingên wî. Leşkerekî milê min girt û li min xist. Ez ji ser hişê xwe çûm. Dema min çavên xwe vekir min dît ku bavê min tune ye.

Min tim ji dayika xwe, bavê xwe dipirsî û di dawiyê de dayika min mecbûr ma ku rastiyê bêje û got,"Bavê we jî weke gelek zilamên Barzaniyan ji aliyê leşkerên Sedam ve hatiye birin, lê wê vegere an venegere nizanim" û giriya. Dema min dîdît ku heval û zarok li gel bavê xwe ne, wê demê ez gelekî xemgîn dibûm ku çima bavê min tune ye. Ev gelekî zor û zehmet bû. Kesên ku ev nehatibe serê wan, vê fêm nakin. Dema bavê min girtin û birin em jî bi malbatî birin ser sînorê Tirkan, em avêtin nava berfê û gotin: "De li vir bimirin". Ez kengî bi dizî bihatama malê min dîdît ku dayika min her digirî. Ji bona min azadî her tişt e. Niha em azad û serbest dijîn. Ma ji vê xweştir?

**Fatma Mihemed (Barzan): Ji 11 salî û pê ve hemû mêr birin**

Di destpêka serê sibê de leşkerên ku berê dora gund girtibûn, bi derketina rojê ketin nava gund. Hemû zilam kom kirin. Ji 11 salî û pê ve hemû mêr birin. Ne li kesên nexweş, ne li kesên seqet dipirsîn. Tenê zilam û Barzanî bûna wan bes bû. Dema leşkerên Sedam hatin mêrê min û kurê min ê 11 salî birin, ewil gotin em ê wan bibin cihê leşkeriyê da ku talîmê bi wan bikin û pişt re em ê wan vegerînin. Piştî cenazeyên enfalan, êdî hêviya me nema ku ew li me vegerin.

Ji ber Sedam jin bêmêr man û bi dehan qîzên dergistî negihiştin miradên xwe. Tenê xebatên me ji bona ku em zarokan xwe mezin bikin bû, da ku sibê ji bona azadiya welatê xwe şer bikin. Heta azadiya Kurdistanê me tu rehetî û aramî nedît. Em her roj dimirin. Lê dîsa jî me li ber xwe dida ku zarokên mayî mezin bikin û bişînin nava pêşmêrgeyan da ku bi azadiya Kurdistanê tola bav û bapîrên xwe hilînin û wiha jî bû. Îro em bi saya pêşmêrgeyên qehreman, di walatê xwe yê azad de dijîn. Em ji hikumeta xwe û serok Barzanî razî ne, xwedê kêmaniya wan nede.

Wê bidome...



**Nazmî Hesan Mihemed (Bilê-Pêşmerge): Ji ber ku em Kurd û Barzanî bûn**


Dema bavê min Enfal kirin, ez 13 salî bûm. Di 31ê Tîrmeha 1983an serê sibê, gundê me ji aliyê leşkerên Sedam ve hat dorpêçan. Temenê bavê min li dora 60î bû. Du birayên min di riya kar de û birayekî min û bavê min jî di mal de girtin. Rehm di dilê wan leşkerên ku li malan digeriyan de tunbû. Agir ji çavên wan dibariya. Ji ber lêdana leşkeran me zarok û jinan dikirin qêrîn û hawar û em digiriyan. Ew ditirsiyan ku em serî hildin û ji tirsa xwe gule li qelebalixê reşandin. Di wê reşandinê de ez bi xwe birîndar bûm. Piştî ku birîndar bûm, birayê min heta nexweşxaneyê bi min re hat û leşkeran ew jî birin.

Elektirîk birrîn, nehiştin erzaq jî were gund û xwestin yên mayî jî bi saxî bikujin. Xwendin jî li me hatibû qedexekirin. Enfalkirina zilamên gund ji ber ku ew Kurd û Barzaniyî bûn. Niha rewşa me baş e ku azadî heye. Tevî azadiyê jî bêbavî dijwar e. Ji birina wan û heta ku cenazeyên enfalan hatin jî em tim li benda bavê xwe bûn. (Dema Nazmiyê xort her ku ev bûyer ji min re digot ew digiriya. Hêsirên çavên wî weke baranê dibariyan. Heta hin caran lê weha dihat ku êdî ji girî nema dikarî bû biaxifiya loma me navberek didayê)



Mehmet Dicle:

# Min kurdî hilnebijart, belkî kurdî ez hilbijartim






CIWANMERD KULEK

> "Bi rastî nivîsîn ji bo min pêvajoyeke hundirîn bû. Tiştekî ji derve de ku min motîve bikira tine bû. Ji destpêka nivîskariya min heta niha tiştekî ji derve de ku min motîve bike tine, xeyn ji baweriya min a bi edebiyatê û estetîka edebiyatê, û ne baweriya min lê pêwîstiya min a bi nivîsînê."

**ASÛS** ne tenê xeyalek e, rastiyek e jî. Bajarek e ku bi hezar salan wek xwe maye û heta bi nifûsa wê neguheriye, gundek e ku "qodên kulturî" ên kurdbûnê tê de her zindî ne. Mehmet Dicle nêzîkî bîst salan e çîrokên ku li vî warê şên, dûr û kevn bihîstine yan şahidî li wan kirine dinivîse û di çil saliya xwe de êdî pirr nêzîk e ku Asûsê bi şax û berên gurrtir vebêje di romaneke ku jî zû de ye çavê me li hatina wê ye.Me bi Dicle re li taxeke kevn a Stenbolê suhbeteke xweş û dirêj kir li ser edebiyatê, nivîskariyê, kurdî û kurdbûnê, paşeroj û pêşerojê, heş û hafizeyê. Fermon hin beşên sereke ên ji vê hevpeyvînê...

**Tu van rojan çi dixwînî?**
Van rojan ez kitêbekê carê duduyan dixwînim.

**Kîjan e?**
*Evîn di Demên Xezebê de(El amor en los tiempos del Cólera)* a Márquez, bi zimanê tirkî.

**Kitêbek heye ku tu dilê xwe dibijîniyê û carina ji xwe re dibêjî "xwezka min ev nivîsandibûya?"**
Miheqqeq hene, lê ez bi vê "xwezî"yê nabêjim, belkî bibe bêhurmetî ji nivîskarê wê re. Lê gava ez pirtûkên Márquez dixwînim, di nav hevokên wî re diçim, carina dibêjim xwezî ez jî yekî wiha bûma.

**Tê bîra te te cara pêşî çi nivîsî?**
Min cara pêşî helbest nivîsîn. Di dema zanîngehê de bû. Min got ez ê helbestan binivîsim. Beriya wê min tiştek nenivîsîbû, xeyn ji tiştên pirr pirr amator ên di dema lîseyê de, lê ew jî helbest bûn. Cara pêşî min bi helbestê dest pê kir ku biceribînim ka gelo tiştek di min de heye yan na, ez ê karibim tiştekî binivîsim yan na. Helbest tiştekî wiha ye: Dema yekî ecemî lê dinere jê re wek tiştekî pirr hêsan xuya dike. Wa ye hest hene, pênûs heye, kaxed heye, evîn heye, atmosfer musait e, de rûnê binivîse. Dema tu du sê rêzikan dinivîsî, tu dibêjî qey te tiştên pirr xweş nivîsandine. Lê paşê hêdî hêdî, dema helbestê dixwînî, helbesta dinyayê nas dikî, tu dibêjî tiştê ku te nivîsiye nebûye, tenê kel hatiye te û bi kel de çûyî; ne tiştekî din e.

**Te kengî qerar da ku tu ê bibî nivîskar?**
Ji nivîsandinê bêtir bi xwendinê min ev biryar da. Ez gelek caran dibêjim, potansiyel yan jî ruhê nivîskariya min ji dema min a zanîngehê tê. Grûbeke me ya edebiyatê hebû wê çaxê. Çar pênc salan em bi hev re man. Di wê grûbê de bi salan me edebiyata Amerîkaya latînî xwend. Ji ên Brezîlyayê bigire heta bi ên Arjantînê, Meksîkayê û Kolombiyayê, me gelek nivîskar xwendin. Dema min ev xwendin, weku di wê derê de rastî 'eynikekê, rastî xwe, rastî binê heşê xwe hatim, rastî wan çîrokên ku min nizanibû, rastî wan çîrokên ku min bihîstibûn hatim. Di wê derê de hewesek bimin re çêbû: Gelo ez ê jî karibim tiştekî bikim? Piştî ku ew pirs hat heşê te û pê ve, êdî tu aciz dibî. Ewê pirsa "gelo" êdî dû te bernade, timî li dû te tê. Paşê çîrok çêdibin di serê te de, çîrokên ku tu dibêjî gelo ew ê ji bo edebiyata min bibin malzeme, ew ê bibin çi. Tu li wan digerî, bi dûr de diçî, bi kûr de diçî. Tu dibêjî wan ev kirine edebiyat, ez dikarim çi bikim edebiyat. Hêdî hêdî dest bi nivîsandinê dikî. Li wê derê qerîneyek heye di destê nivîskar de, di destê hunermend de. Ew qerîne çi ye? Dema mirov xwendevanekî baş be, helbet mirov dikare edebiyata xwe jî binirxîne. Belkî objektîf nebe jî, lê ez bawer im ku mirov dikare edebiyata xwe binirxîne. Ji ber ku te asta xwendina xwe bilind kiriye û edebiyata dinyayê nas kiriye tu êdî dizanî romana baş, helbesta baş, çîroka baş çi ye û tu êdî dikarî wî tiştê ku te nivîsandiye bidî ber wan, bipirsî "min çi kir, min çi nivîsand?" Wexta zewqa te ya xwendinê çêbû, di nivîsandinê de jî êdî wê ferq dikî; dema tiştê ku te nivîsandî zewq da te biryar didî û dibêjî "haa, nexwe ez jî..."

**Tiştên pêşî ku te nivîsandin bi kurdî bûn?**
Erê, bi kurdî bûn. Min qet bi tirkî nenivîsî. Belkî dema zanîngehê min helbestek du helbest bi tirkî nivîsîbin, lê wekî din temamî min bi kurdî nivîsî. Wê demê jixwe di kovara Rewşenê de dixebitîm û çîroka min a pêşî *Meqesa Zêrîn* jî di wir de derket. Min hêdî hêdî dest pê kir hinek çîrokên tirkî wergerandin kurdî. Min çîrokek Yaşar Kemal, *Xençer*, wergerandibû, ew jî di wir de çap bû. Rojekê tesadûfî li kitêbfiroşê Yapı Krediyê rastî wî hatim û min xwe pê da naskirin. Min jê re got ku min çîrokeke wî wergerandiye kurmancî. Pirr kêfa wî hat, keniya û got, "Te kîjan wergerandiye?" Min got, *"Xençer."* Got, "Xwezila te tiştekî xweştir wergerandaya."

**Di şertên wê demê de wekî dî çi motîvasyonên ji derve de hebûn ku tu binivîsî?**
Bi rastî nivîsîn ji bo min pêvajoyeke hundirîn bû. Tiştekî ji derve de ku min motîve bikira tine bû. Ji destpêka nivîskariya min heta niha tiştekî ji derve de ku min motîve bike tine, xeyn ji baweriya min a bi edebiyatê û estetîka edebiyatê, û ne baweriya min lê pêwîstiya min a bi nivîsînê.

**Lê te zimanek bo nivîsînê hilbijart ku ji zimanên ku te pê edebiyat xwend û nas kir cuda bû û zehmettir bû...**
Min kurmancî hilnebijart, belkî kurmancî ez hilbijartim. Ji ber ku demareke min a xurt a kurmancî hebû. Heta bîst saliya xwe ez li Hezroyê jiyabûm. Li Hezroyê gava yek bi tirkî bipeyive, ew dibe 'qeşmerê gund'. Tirkî qet di jiyanê de tine bû. Ji dibistanê bigire heta mezinbûna min, têkiliyên bi malbatê re; ji derveyî her tiştê polîtîk... Birayê min jî zanîngeh qedandiye, lê heta îro di nava kîjan civatê de dibe bila bibe, em nikarin, weku dibêjin "gulê jî bikî serê wî", peyveke tirkî bi hevdu re bikin. Erê çavkaniyên xwendinên min bi tirkî bûn û nivîsîna min bi kurdî bû, lê dema tu wusa dikî tiştekî wekî otomatîk çêdibû, belkî ez qet nedifikirîm ku bi tirkî dixwînim. Dibe ku ez hay jî jê tine bûm ku dinya jixwe bi wî awayî afiriye.

**Çavkaniyên nivîsandina te çi ne?**
Em bi tiştekî mezin bûne bi rastî. Tiştê ku em mezin kirine çi ye? Li ser meselê, em dibêjin kurdbûn, fransizbûn, tirkbûn... Li gorî min ew ruhek e û qodên wî hene. Tiştên ku rûsbûnê, tiştên ku tirkbûnê pêk anîne hene. Dîrok e, çand e, ziman e, herwiha edebiyat e. Edebiyata gelêrî ye, stran in, rabûn û rûniştin e, û çanda xwarinê ye, têkiliyên bi dê û bavê re ne û hwd. Xeyn ji vana jî, di vê sedsala dawîn de berhemên nivîskî hene. Di tirkbûnê de, em bibêjin, para edebiyata nivîskî, edebiyata modern jî heye; para romanê, para çîrokê... Gava em li kurdbûna xwe dinerin, tiştên ku em li ber dikevin, tiştên ku em pê kêfxweş dibin, tiştên ku em xeyal dikin; ew çi ne û ji ku derê hatine? Li derveyî temamên xwendinan û pêvajoyên siyasî, rayên wê ên di nava civakê de hene: Gund û qesebeyên ku em jê hatine, ew dengbêjên ku me guhdarî kirine, ew çîrokên ku em îro jê re dibêjin "çîrok" lê di jiyana xwe de em bûne şahidên wê... Em her roj dibûn şahidên çîrokan, çîrokên jinrevandinê, ên mêrkuştinê, ên tolhildanê, ên heyfstandinê ku di nava eşîran de bi salan dewam dikirin. Evana qodên me afirandine, û bi rengekî wusa afirandine ku êdî birêveçûna me jî diyar kirine. Yekcaran dema em di rê de dimeşin xanima min ji min re dibêje, "Tu wek diyarbekiriyan dimeşî... hûn diyarbekirî çima wusa dimeşin?"

**Lê ew insanên ku ew qod di wan de hene û tu "gulê jî bikî sere wan" bi merivekî xwe re lefzekê bi tirkî naaxivin, vê carê tu "cercûrekê jî vala bikî" nikarin teksteke kurt a peyama telefonê bi kurdî binivîsin, tenê bi tirkî dinivîsin ji nas û dostên xwe re. Ev ji bo kurdî xerabûna wan qodan e?**
Li gorî min xerabûn e. Ji ber ku kurdî bi awayekî civakî serdema nivîskî nejiya. Mebesta min ji serdema nivîskî ew e ku serdema kaxed û xwendin û nivîsandin û dibistan û rojname û kitêb û kovaran nejiya. Rasterast ji serdema devkî derbasî serdema dijîtal bû. Ji ber wê, kesên ku çûne zanîngehan jî nikarin, yan wek rêyeke hêsan hildibijêrin ku tirkî kar bînin di nivîsandinê de. Qeyrana me ya îro jî ji wir tê jixwe, ji ber ku me serdemeke nivîskî nejiya.



> "Kurdîtî tiştekî du alî ye. Meseleya avantaj û dezavantajê yekcaran tevlihev dibe. Yek jê ew avantaj e ku hemî qad vala ne. Te dî li bal me dibêjin "kaxedê saya", vala ye yanî, ji qada sînemayê bigire heta qada şanoyê, edebiyatê û nizanim çi û çi, tu dikarî heta bi qadên aboriyê dirêj bikî."

**Digel wê jî, di vê serdemê de kesên ku di her warî de bi kurdî tiştan diafirînin jî dertên...**
Kurdîtî tiştekî du alî ye. Meseleya avantaj û dezavantajê yekcaran tevlihev dibe. Yek jê ew avantaj e ku hemî qad vala ne. Te dî li bal me dibêjin "kaxedê saya", vala ye yanî, ji qada sînemayê bigire heta qada şanoyê, edebiyatê û nizanim çi û çi, tu dikarî heta bi qadên aboriyê dirêj bikî. Hin kes bi çavên bazareke vala li vêya mêze dikin, dibêjin "ku ez bikevim vê bazarê, ez çi bikim wê bibe huner." Weke di salên 90î de, dema siyaset jî gurr bû, kê çi binivîsanda, helbestek yan çîrokek, dibû nivîskar. Kê stranek bigota derî li ber vedibûn; di destpêka salên 2000î de bi alîkariya tevgera siyasî derdiket televizyonan û hember girseyên bi sed hezaran. Îcar dema mirov li nifşê nû dinere, dibîne ku hin mirov bi vî çavî jî li kurdîtiyê dinerin û difikirin ku çi bikin wê bibe huner. Herçî meseleya edebiyatê ye, ê min, ez li ser navê xwe bibêjim, ev ji bo min ne meseleya hilbijartinê ye.Ez bi tirkî baştir zanibim jî, ez nikarim bibim nivîskarekî zimanê tirkî. Ji ber ku ew nebûye parçeyekî ruhê min. Û yek li nav civakeke tirkî mezin bûbe û biyaniyê çanda xwe, wan qodên ku me behs kir, be jixwe ew bixwaze bi kurdî binivîse jî tiştên ku ew dinivîse wê li hewa bimînin.

> "Ez a niha romanekê dinivîsim. Lê ew jî, ji qewla bavê min, bû "çîroka çêleka hezretê Mûsa." Her cara ku meseleyek pirr dirêj dibû bavê min wiha digot. A min jî pirr dirêj bû. Her carê meseleyek dertê û nahêle ez wê bi dawî bikim."



## Xewna te ya mezin çi ye, wek nivîskarekî?

Tiştên ku ez dixwazim pirr in. Yek jê, min dixwest ku min li ser kelepûrekê dewam bikira. Yanî, paşerojeke (rabirdûyeke) vê edebiyatê hebûya. Paşeroja wê ya romanê, çîrokê... Ez tinebûna wê hîs dikim, ji ber ku li ser çandekê hêşîn nebûme. Ev belkî xeyaleke pûç e, ji ber ku paşeroj çû... A duyem jî ew e ku girseyeke mezin a xwendevanan hebûya, edebiyateke pirr gurr hebûya û min jî xwe di nav wê edebiyatê de bidîtaya. Xeyaleke min î din jî ew e ku ez bi rastî bibûma nivîskar. Yanî çi? Yanî ku min karekî din nekira û pêdiviya min pê tine bûya, fikarên aborî û meşandina jiyanê tine bûna, û min binivîsandaya... Belkî ez vêya ji xwe re dikim behane û dema dipirsin "Tu çima hindik dinivîsî", dibêjim "ez mamoste me, ez bav im, li malbatekê dinerim." Min karîbûya bi nivîskariyê debara xwe bikira, wê demê ez ê pirr pirr bextewar bûma.

*Lê di vê rewşa kambax de jî tu dinivîsî û diafirînî. A niha çi heye di nav destê te de?


Ez a niha romanekê dinivîsim. Lê ew jî, ji qewla bavê min, bû "çîroka çêleka hezretê Mûsa." Her cara ku meseleyek pirr dirêj dibû bavê min wiha digot. A min jî pirr dirêj bû. Her carê meseleyek dertê û nahêle ez wê bi dawî bikim. Pirrê wê temam bûye bi rastî. Di serê min de qediyaye jixwe, tenê maye li ser kaxedê binivîsim. Ev roman bêtir di salên 1915-20an de derbas dibe û tê de çîroka Asûsê şax vedide, kûrtir û berfirehtir dibe piştî xwendin û tecrûbeyên min ên bi salan.

Li Kurdistanê profîla malbateke Kurd

# Jiyannameya malbata Baksiyan



NÛJÎN ONEN



Li her çar parçeyên Kurdistanê hin malbat û eşîr hene ku di doza Kurdî de cîhekî girîng digirin. Yek ji wan malbatan jî malbata Baksiyan e. Ji aliyekî ve bi çîrokên serkeftinê ketine rojeva Kurdan ji aliyê din ve jî bi çîrokên trajîk û bi windakirinan re rû bi rû mane. Baksî 4 bira û 5 xwişk in. Çend profîlên xurt ku di malbatê de derketine pêş; Lütfî, Mahmud, Lamîa, Necla û ji nifşên nû zarokên Lütfî Baksî, Kurdo û Nalîn hene. Ev navên ku min rêzkirine di doza Kurdî de cîhekî çawa girtine, xebatên çawa birêvebirine? Birayê mezin yê li Swêdê dijî Lütfî Baksî ji Heftenameya Basê re behsa malbata xwe kir.

Li her çar parçeyên Kurdistanê hin malbat û eşîr hene ku di doza Kurdî de cîhekî girîng digirin. Yek ji wan malbatan jî malbata Baksiyan e. Ji aliyekî ve bi çîrokên serkeftinê ketine rojeva Kurdan ji aliyê din ve jî bi çîrokên trajîk û bi windakirinan re rû bi rû mane.

### "Pêlîstokên min yê zaroktiyê kitêb bûn"

**Mamoste, siyesetmedar û arşîvkarê Kurd Lütfî Baksî ji me re behsa kar û xebatên xwe yên heta niha dike:**

Çîroka mala Baksiyan bi min dest pê nekiriye, mala me xwedî medrese bû, xwedî çandeke kevn bû. Eslê me ji Hîzanê ye di herba yekemîn de kalê min di 1915-16an mihacir bûye. Di 1943an de li Xerzan hatime dinyayê. Diya min û xanima min qîzê apê hevûdu ne, ji eşîra Pêncînar in, mezinê bavkê xwe ne, ji wan re dibêjin Ferxikî. Ji 5-6 saliya xwe heta wefata wan ez li cem kal û pîrka xwe mame. Kalê min hertim ez bi xwe re dibirim medreseyê. Feqiyên wî hebûn di nav wan de ez bi kitêban dilîstim. Hezkirina kitêb û arşîvê jî ji wir tê. Bi sedan kitêbên destnivîs hebûn li medreseyê gelek jê talan bûn, min tenê karibû 10 kitêban ji wan bibim Swêdê. Ya herî kevn 1680ê ye kitêbên dersê ne. Piştî kalê min wefat kir ez vegeriyam malê. 3 salan min li medreseyê xwend, 9 saliyê min Quran, mewlûd tev xwendibûn li ser şerîetê û gramera erebî jî 2 salan xebitîm. Lê bavê min got biçe mektebê bixwîne, 10 salî bûm min dest bi mektebê kir. Ez ketim îmtihanê ji bo dibistana mamostetiyê, biserketim. Li Erxeniyê min dest pê kir pişt re ji ber sucê fikir ez surgunî Enqerê kirim, min dibistan li wir qedand. 14 salan min mamostetî kir. Dema ez li Baykanê mamoste bûm hemû partiyan giliyê min kirin gotin ev komînîst e. Sirgûniya min derxistin, yek dabûn Ordu, yek Perwarî yek jî Kütahya. Ez çûm min got ez tenê me ev çima we 3 sirgûn dane min, mifetîş got her serokekî partiyê giliyê te kiriye haya wan ji hevûdu tuneye tu danî 3 cîhan. Heta Demîrel jî nivîsandiye "vî zilamî jê bavêjin". Bifikirin serokwezîrê Tirkan wê demê bi mamosteyekî gund bi min re meşgûl dibe. Di 2ê Gulana 1979an de girtin ser mala min, 2 mehan ez di hepsa Diyarbekirê de mam. Beriya 12 Îlonê, 25 Adarê ez çûm Swêdê ji ber ku her kes bi tirs bû kesî nikaribû hevûdu biparasta. 1996an min biryar da hatim Tirkiyeyê, di siyasetê de cîh bigirim. Têkiliyên min û Şerefattin Elçî di 1996an de dest pê kir. 20 salan di nav DKP-KADEPê de aktîf xebitîm. Me dixwest em alternatîfekê çêbikin. Dema Elçî wefat kir ez ketim şûna wî, armanca me ew bû li derveyî xeta BDPê alternatîfekê çêbikin, zorê bidin wan, wan bînin ser xeta netewî, lê mixabin nebû.

**Yek ji endamên malbatê jî rojnameger, dîplomat û nivîskar Mahmûd Baksî ye. Baksî di 2000î de ji ber nexweşiyê li Swêdê jiyana xwe ji dest daye.**

Mahmûd xebateke mezin li Swêdê kir, dema li Swêdê digotin Kurd, Mahmûd dihat bîra Swêdiyan. Li Swêdê ji derve kîjan lîderê siyasî dihat xwe li me digirt. Mahmûd karê wan ê burokrasiyê çê dikir. Zarokên min ziman dizanîn û alîkariya wan dikirin.









Wê demê felaket hebû milet direviya derveyî welêt êdî kî dihat Swêdê polîsên sîvîl telefonî me dikirin digotin Kurd hatine werin wan bibin. 12ê Tebaxa 1980î de Mahmûd bi serokwezîrê Swêdê Olof Palme re hevpeyvîn kiribû, cara yekemîn serokwezîrekî Sosyal Demokrat di salên 80î de ji bo pirsa Kurdî dîtinên xwe anîn ziman; "Mahmûd, serxwebûn zor e lê herçar parçe jî divê otonom bin, divê hemû heqê wan hebin û divê di navbera Kurdistanê de hidûd tunebin" vê hevpeyvînê zahf deng da. 25 kitêbên Mahmûd Baksî hene.

### "Kesên berê navê xayîntiyê li wan dikirin û dikuştin vêga di pirtûkan de weke qehreman behsa wan dikin"

**Lamîa Baksî, çîrokek trajîk e ji aliyê PKKê ve hate kuştin, Lütfî Baksî wiha behs dike;**

Lamîa gelekî zîrek bû. Dibistana mamostetiyê ya Wanê xwend 3-4 mehan mamostetî kir. Çû Swêdê, li wir rasterast ket beşa bijişkiyê ew jî xelas kir. Têkiliyên Lamîa bi PKKê re zêde bûn. Lamîa ji me qut kirin, wê demê çend kes hatine kuştin, înterpol û îstîxbarata Swêdê jî li pey me bû. Mala me hertim di bin çav de bû, ji ber ku Kesîre û Bakî Karer gelek caran dihatin mala me. Wê demê navê Lamîa jî xistin nav wan. Lamîa ji Swedê derket. Di 1984an de çû Şamê ji wê derê ew şandin çiyê. 3 salan li çiyayê Kurdistanê dixtorî kir. Dibêjin Lamîa întîbaq nekir, mirov di mehekê de întîbaq dike an nake. 3 salan li wir maye. Dibêjin mehkeme danîne. Cemîl Bayik, Osman Öcalan û Duran Kalkan jî tê de bûne û di civînê de qerara qetilkirina wê dane. Kesên berê bi navê xayîntiyê dikuştin vêga di pirtûkan de weke qehreman nîşan didin. (Melek Dr. Cîhan (Lamîa Baksî). Kaynağa Dönüş Yolunda Gerilanın Umudu. Rupel 101-103 Weş. Mezopotamya 2015 Almanya)

**Necla Baksî (Mamosteya Edebiyatê), di rêxistina Kawa de berpirsa komîteya şaxê jinan bû, Mahmud Baksî di pirtûka xwe ya bi navê "Di dîroka Kurdistanê de Komkujiya Qamişlo" wiha behsa vê bûyerê dike:** "Piştî darbeya 12 Îlonê 7 endamên rêxistina Kawa li Qamişlo li mala welatperwerekî Sûrî diman û amadekariya siberojê dikirin lê haya wan ji xapa ku ji bo wan hatiye vedan tunebû. 15 kesên ku kontrgerîla ber bi wê malê ve diçe û ew kesên li wê malê înfaz dikin." Cem Ersever jî di kitêba xwe a "Îtîraflar" de dibêje operasyona me ya yekem ya Qamişlo ye. 12.12.1980.

**Niha jî emê ji we re behsa nifşên nû yê Baksiyan bikin. Lüftî Baksî wiha behsa lawê xwe Kurdo û keça xwe Nalîn dike; ''Di perwerdehiya zarokên min de rola xanima min mezin bû'' û berdewam dike:**

Nalîna keça min 8 salan parlementerî li parlementoya Swêdê kir, 10 salan jî seroktiya şaxa jinan a Partiya Sosyal Demokrat a Swêdê kir. Têkiliyên dîplomatîk yê Kurdên başûr û Hikûmeta Swêdê birêve dibir. Cara yekemîn dewleteke Ewropa di asta hikûmetê de Nêçîrvan Barzanî weke Serokwezîrê Kurdistanê qebûl kiribû rol û têkiliyên Nalînê bûn sebeba vê yekê. Nalîn 8 salan li oda xwe ya parlementoyê wêneyên Olof Palme û Mela Mistefa Barzanî li kêleka hevûdu danîbûn.

Kurdo Baksî jî kurê min e, di 1988an de kovarek bi navê Reş û Spî derxist, li ser meseleyên xerîban, penaberên ku dihatin Swêde hemûyan dixebitî, li ser meseleya misilmantiyê. Piştî wê çû zanîngehê beşa siyasetê xelas kir, rojnamevanî xwend. Tirkî, Fransî, Îspanî, Îngîlîzî, Kurmancî, Swêdî, Norwecî 7 zimanan dizane. Kurdo di parlementoya Ewrupa de parlementerê ne eslî ye. Her wiha ji ber xebat û alîkariya wî ya li ser xerîban xelatek navneteweyî ya Olof Palme ya aştiyê stend. Panelîstekî baş e. Bûye pisporê pirsa Kurdistan û Tirkiye. Ewil Mahmûd bû, kî dihat alîkariya wan dikir aniha jî Kurdo alîkariya wan dike. Hevalê wî nivîskar û rojnamevan Stieg Larsson yê bi nav û deng yê Swêdî, di pirtûka xwe de di cîlda sisiyan de behsa Kurdo dike. Her wiha Kurdo jî li ser wî pirtûk nivîsand. Min ji zarokê xwe re got wesiyeta min pir zimanan hîn bibin. Ji ber ku di dîplomasiyê de ziman zahf girîng in, her zimanek deriyekî vedike. Keça min ya piçûk jî mamosteya Îngîlîzî-Fransî ye Rûsî jî dizane, bi tevayî 5 zimanan dizane.

'Tenê daxwaza min heye bila lêkolînan li ser miletê xwe bikin, ji xeynî dawa Kurd tu daxwaza min tune. Kurd çawa dikarin bi ser kevin weke miletê dinyayê bibin xwedî welatek û ji bindestiyê xilas bibin.'



### Ji aliyê din ve Baksî di Koma Kurmancî de ye, ev kom 30 sal e li ser peyvên Kurdî dixebite. 10 salan jî di rêveberiya Enstîtuya Parîsê de cih girtiye.

Ez tevlî 40 civînên Kurmancî bûme. Wexta Kurdistana Osmanî parçe bû, dewleta Tirkan bi Iraq û Îranê re peyman çêkir û gotin tu carî rê nedin Kurmancî pêş bikeve. Soranî serbest e lê alfabeya latînî nîşanî wan nadin û perwerdeya Kurmancî nadin. Ji ber wê Kurmancî ne li Îranê ne li Iraqê tenê li Sûrî hinekî pêş ve çûye. Kurmancî zahf paş de ma Enstîtuya Parîsê got em bikaribin Kurmancî modernîze bikin ji nû ve vejînin wan terîm û klasîkên Kurdan di nav xelkê de hene em karibin wan hemûyan berhev bikin. 1987an de yekemîn civîna me li Berselonayê bû. Sîstema xebata me bi vî rengî bû, her hevalek mijarek digirt ser xwe. Mesela yekî digot termên nav malê, yekî cil û berg, yekî ajal û hwd. Her heval ew mijarên ku lêkolîn li ser kirine wek rapor amade dikin, rapora xwe tînin civatê. Dema em gotinekê çêdikin divê bi yek dengî qebul bibe.

### "Arşîv bîra miletekî ye"

Lütfî Baksî bi salan e li Swêdê dijî aliyekî wî yê din heye ku ew jî arşîvkarî ye, dibêje çi tiştên ku navê Kurdan tê de derbas dibe di arşîva min de heye û wiha berdewam dike:

37 saliyê min dest bi arşîvkirinê kir. Heta niha 8 hezar kitêb berhevkirine. Ez fikirîm min got arşîv hafizeya miletekî ye, eger arşîva miletekî tunebe hafizeya wî jî tuneye. Nivîskarê me çiqas jêhatîbin jî arşîv tunebe wê ji ku binivîsînin, ez karibim tiştekî wiha ava bikim rehmetiyê Mahmûd jî arşîva wî tunebû, ji bo alîkariya wî jî bikim, ya din derbarê hereketa Şêx Seîd û Barzaniyê Nemir me tiştek nizanîbû. Dev ji tarîxa kevn berde em ya nêzîk nizanin. Li ser van, min dest pê kir rojname, pirtûk, kovar, qaset, muzîk yê berê jî tê de min gelek tişt bidest xistin. Sehafekî Swêdî ji min re digot tu çiqas guneh î, min got çima? Got "yên tên vir tenê pirtûka li ser miletên xwe dixwazin, lê tu li ser Ermenî, Asurî, Rûs, Tirk, Ereb û Farisan dixwazî" min jî got têkiliyên Kurdan bi hemuyan re çêbûne gotineke Kurd di ku de derbas dibe ez peyda dikim, bi hemû zimanên dinyayê. Her kes dibêje ev karê tu dikî tiştekî baş e lê heta niha tu kesî alîkariya min nekiriye.

